

K.T.

Zanîngeha Wanê (YYÜ)

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind



AVANÎYA LÊKERAN DI KURMANCÎ DE

Ömer KAPLAN

Şêwirmend

Prof.Dr.Vecihi SÖNMEZ

Wan-2018

Yüzüncü Yıl Üniversitesi

Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi



KÜRTÇEDE FİİL ÇATISI

Ömer KAPLAN

Tez Danışmanı

Prof.Dr. Vecihi SÖNMEZ

Van-2018



T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Prof. Dr. Vechi SÖNMEZ danışmanlığında, Ömer KAPLAN tarafından hazırlanan “Avaniya Lêkeran Di Kurmanci De” adlı bu çalışma, 18/01/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Prof. Dr. Vechi SÖNMEZ

İmza:

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

İmza:

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Mazhar TUNÇ

İmza:

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

18/01/2019
Prof. Dr. Murat DEMİREL
Enstitü Müdürü

BİLDİRİM

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Eğitim - Öğretim ve Sınav Yönetmeliği'ne göre hazırlamış olduğum “ Avaniya Lêkeran Di Kurmancî de ” adlı tezin tamamının kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim Öğretim yönetmenliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir. Tezim sadece Yüzüncü Yıl Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

Tezimin yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

KURTE

TEZA LÎSANSÂ BILIND

AVANÎYA LÊKERAN DI KURMANCÎ DE

ÖMER KAPLAN

Şêwirmend: Prof. Dr. Vecihi SÖNMEZ

2018 , 107 rûpel

Lêker, ji hêmanine zimanekê yên herî girîng in. Navekî ku her hebûneke gerdûnê pênase bike heye, pevgirêdayiyê vê jî pêwîstiya peyvên ku karên hebûn bandordar kirine, rewşên ku hebûn di tê de ne, tevgerên ku ji aliyê hebûnan ve tên kirin îfade dikin çê bûye. Li vê derê lêker, ji vî aliyê ve, di nava zimên de alîkariya îfadekirina rewşekê, bûyînekê, tevgerekê, karekî hwd. ê ku hebûnan kirine didin me.

Lêker, him ji aliyê xwe yê strukturel/binyadî him jî ji aliyê xwe yê avaniyê ve di bin sernavên cûrbicûr de derdikeve pêşberî me. Me, di vê xebata xwe de hewl da ku em jêsernava bi navê avaniya tebatî a ku di binê banê sernava ji aliyê avaniyê ve lêkerê de cih digire raxin pêş çavan. Li ser nêrîneke gerdûnî, hebûna aliyên wan ên hevkar û hebûna cudahiyên wan, ên du endamên Malbata Zimanên Hînd-Ewrûpî, Kurdî û Înglîzî ji bilî vê jî pêwîstiya avaniya tebatî a Kurdî him ji aliyê semantîkê û him jî ji aliyê teşeyê ve were nirxandin, pevgirêdayiyê vê jî hewcedariya pênasekirineke berfireh hebû.

Di analîza me ya tekstên Edebiyata Klasîk a Kurdî de rasthatineke avaniya tebatî ji aliyê teşeyê ve çê nebû, lê avaniya tebatî a vê serdemê tenê li gorî semantîkê hat dîtîn. Ji bilî vê, analîzên wê serdemê di binê banê edebiyata devkî de berhemên çanda dengbêjîyê em rastî avaniya tebatî anîn ku him ji aliyê teşeyê ve û him jî ji aliyê semantîk ve bikarînin hene. Di berhemên nûjen, nivîskî ên roja îroyîn de jî tê dîtîn ku bikaranînen teşeyî zêdetir dibin û nêrîna semantîk jî êdî roj bi roj girîngiya xwe winda dike. Bikaranîna avaniya tebatî, di berhemên nivîskî de û di

sedsala [19.an](#) de xwe nîşan dide û di vê serdemê de lêkerên alîkar ên ku avaniya tebatî çê dikin jî di rojname, kovar, romanên de tên bikaranîn.

Îro, lêkera alîkar “hat-” a ku avaniya tebatî çê dike, li gorî herêman ji aliyê zêdebûna bikaranînê ve cudahiyan nîşan dide pevgirêdayiyê vê rewşê li hin herêman lêkera alîkar a ku avaniya tebatî çê dike nehatiye bikaranîn, li dijî vê rewşê avaniya tebatî bi avaniyeke lebatî ve hatiye bikaranîn û hewldana lêbarkirina wateya tebatî derketiyê holê.

Peyvên Sereke: Lêker , Avaniya Lêkeran, Avaniya Tebatî , Semantîk , Têşe



ÖZET
YÜKSEK LİSANS TEZİ
KÜRTÇEDE FİİL ÇATISI
ÖMER KAPLAN

Tez Danışmanı: Prof. Dr. Vecihi SÖNMEZ

2018, 107 sayfa

Fiiller, bir dilin en önemli unsurlarındandır. Evrendeki her bir varlığı tanımlayan bir isim mevcutken bu varlıkların yapmış oldukları hareketleri, içinde buldukları durumları, etkilendikleri işleri ifade eden sözcüklere de ihtiyaç duyulmuştur. İşte fiiller, bu yönüyle varlıkların yapmış oldukları bir işi, hareketi, oluşu, durumu vb. dil içinde ifade etmemize yardımcı olmuştur.

Fiiller, gerek yapısına göre gerekse çatı bakımından çeşitli başlıklar halinde karşımıza çıkmaktadır. Bu çalışmamızda, “çatı bakımından fiiller” başlığının alt başlığı olan edilgen yapıyı göz önüne sermeye çalıştık. Evrensel bir bakış açısıyla Hint Avrupa dil ailesinden olan İngilizce ve Kürtçenin ortak yönlerinin ve farklılıklarının olduğunu biliyoruz. Bunun dışında Kürtçedeki edilgen yapının semantik ve biçimsel yapıyla ele alınması gerektiğini ve buna bağlı olarak geniş bir tanımlamaya ihtiyaç vardı.

Klasik Kürt edebiyatı döneminde; yazılı metinlerde biçimsel olarak bir edilgen yapıyı eserlerde görmezken bu dönemde edilgen yapıyı sadece semantik bakış açısıyla görmekteyiz. Bunun dışında o dönemde sözlü edebiyat ürüne ait olan dengbeji kültüründe gerek biçimsel gerekse semantik bakış açısıyla kullanıldığını görmekteyiz. Günümüz modern dönemi yazılı ürünlerinde ise biçimsel bakış açısının fazla kullanıldığı artık semantik bakış açısının önemini biraz daha kaybettiğini görmekteyiz. Son olarak edilgen yapı 19 yy. yazılı metinlerinde kendisini gösterdiğini ve bu dönemde edilgen yapıyı oluşturan yardımcı fiillerin roman, dergi, gazetelerde fazla kullanıldığını görmekteyiz.

Günümüzde edilgen yapıyı oluşturan yardımcı fiil olan “**hat-** “ın, bölgeden bölgeye kullanım sıklığı farklılık göstermektedir. Buna bağlı olarak bazı bölgelerde

edilgen yapıyı oluşturan yardımcı fiilinin kullanılmadığı, buna karşın edilgen yapıyı bir etken yapıyla kullanılıp edilgen anlamı verilmeye çalışıldığı görülmektedir.

Anahtar Kelimeler: Fiiler , Çatılı Fiiler, Edilgen Yapı, Semantîk , Biçimsel



ABSTRACT

MASTER'S THESIS

PASSIVE VOICE

ÖMER KAPLAN

Supervisor: Prof. Dr. Vecihi SÖNMEZ

2018, 107page

Verbs are one of the most important elements of a language. Each entity in the universe is identified through names and the words that express the activities which these entities have made, the situations in which they exist, and the works affected by them have been needed. In this regard, the verbs help express the works, movements, occurrences, statutes, etc. carried out by these entities within the language.

Verbs are under different titles according to either their structures or their voice. In this study, we tried to reveal the passive structure, which is a subtitle of verbs in terms of their voice structure. From a universal perspective, English and Kurdish from the Indian European language family have common features and differences as well as the passive structure of the Kurdish language should be considered with semantic and formal structure and accordingly a broad definition was needed.

During classical Kurdish literature; while we cannot see the passive structure in written texts, in the same period we see the passive structure only from a semantic point of view. Apart from that, we observe that it is used both formally and semantically in dengbejî (mintrel) culture, which is a part oral literature. As for today's modern period written texts we can see that formal perspectives are used more and are losing the importance of the semantic perspective. Lastly, the passive structure was seen in the 19th century written texts and in this period auxiliary verbs forming the passive structure were used more frequently in novels, magazines, newspapers.

Nowadays, the "**hat-**", which is the auxiliary verb that constitutes the passive structure shows the different frequency of use from region to region and hence, in some regions the auxiliary verb making the passive structure is not used while active structure is used to give a passive meaning.

Keywords: Verbs, Passive Voice, Semantics, Forma



PÊŞGOTIN

Xebata me ji destpêk, sê beş, encam, çavkanî û pêvekê pêk tê.

Me di beşa yekem de di derheqê lêkeran de pênasiyek çêkir jibilî wê cureyên lêkera me da berçav û piştî me li gor dema çawa tên kişandin me nîşan da.

Di beşa duyem de ji aliyê gerdûnî de pênasiya avaniya lêkerên tebatî kir piştî vê pênasiyê ji aliyê semantîk û têşeyî we karanîna avaniya lêkerên tebatî me nîşan da û paşî jî di zimanê Hînt – Ewropî bi taybetî di zimanê Ingilîzî de karanîna lêkerên tebatî bi zimanê Kurdî we cudahiya û nêzikhatiya wan da berçav.

Di beşa sêyem de di zimanê Kurdî de pênasiya avaniya tebatî û ji aliyê semantîk û têşeyî we karanîna wan jibilî wê erênî û neyîniya wan lêkerên danberhev û li gor dema çawa tê kişandin me nîşan da. Paşî jî di zaraveyan Kurdî de avaniya tebatî çawa tê karanîn? Me nîşan da dawî jî me li ser hinek bajara lêkolîner kir. Nêzikhatiyên û cudahiyên avaniyên tebatî me danberhev.

Di encamê da li gor bidestxistinên xebatê nirxandineke gelemperî hat kirin.

Wekî çavkanî pêşî nav û agahiyên çîrokbêjan hat dayîn; ji ber ku ew çavkaniyên devkî ne; paşê pirtûk, kovar û tezên ku di xebatê da me serî lêdaye hatin nivîsandin

Ez dixwazim spasiyên xwe yên taybet pêşkêşî şewirmendê xwe birêz Vecihî Sönmez bikim ku di vê xebatê da piştgiriya herî mezin wî da min. Ji ber pêşniyaz û şîrovêyên wan ên hêja, spasî birêz İbrahim Çapar û Leyla Kaplan dikim. Ji bo alikariyên wan ji Melek Kaya û Hamit Öngün re jî spas dikim. Spasî ji Kemal Dağ û Hasret Caz ku wan sererastkirina nivîsê da alikariya min kirin. Wek dawî, di amadebûna wê tezê de navê ku min jor de nediyarkir ez bi dil û can spasiyên xwe li wan dikim.

Ömer KAPLAN

Wan , 2018

NAVEROK

KURTE	ii
ÖZET	iv
ABSTRACT	vi
PÊŞGOTIN	viii
NAVEROK	ix
KURTEBÊJE	xiv
DÎZINA TABLOYA	xv
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM	1
1.1. Ji Aliyê Binyadê ve Lêker	2
1.1.1. Lêkerên Xwerû	2
1.1.2. Lêkerên Darijtî (Pêkhatî)	3
1.1.3. Lêkerên Hevedudanî	4
1.1.4. Lêkerên Biwêjî	5
1.2. Ji Aliyê Bireserê ve Lêker	6
1.2.1. Lêkerên Gerguhêz	6
1.2.1.1. Gerguhêzên Binecî	8
1.2.1.2. Gerguhêzên Nebinecî	9
1.2.2. Lêkerên Negerguhêz	9
1.2.2.1. Negerguhêzên Xwazekî	10
1.2.2.2. Negerguhêzên Rûdanî	10
1.2.3. Ji Lêkerên Negerguhêz Veguhestina Lêkerên Gerguhêz	11
1.2.4. Lêkerên Dançêker:	13
BEŞA DUYEM	15

2. Ji Nêrînekê Gerdûnî ve Avaniya Tebatî	15
2.1. Ji Nêrînekê Gerdûnî ve Avaniya	15
2.2. Ji Nêrîneke Gerdûnî ve Avaniya Tebatî	15
2.2.1. Di Gerdûnî de Ji Aliyê Semantîk ve Fonksiyona Avaniya Tebatî	16
2.2.2. Di Gerdûnî de Di Aliyê Tîprêzika Peyvê de Fonksiyona Avaniya Tebatî	17
2.2.3. Di Gerdûnî de Di Aliyê Nêzikhatiya Teşeyî de Fonksiyona Avaniya Tebatî	17
2.2.3.1. Di Aliyê Nêzikhatiya Teşeyî de Teoriya Girêdana (RKSD)	18
2.2.4. Di Gerdûnî de Di Aliyê Nêzikhatiya Karganî de Avaniya Tebatî	22
2.2.4.1. Di Aliyê Nêzikhatiya Karganî de Avaniya Tebatiyên Neyekser ..	26
2.2.4.2. Di Aliyê Nêzikhatiya Karganî de Avaniya Tebatiyên Zanista – Teşeyî ê Sext	26
2.3. Di Gerdûnî de Guherandina Avaniya Tebatî	33
2.4. Di Zimanê Ingilîzî de Avaniyan Tebatî:	35
2.4.1. Di Zimanê Îngilîzî de di Avaniya Tebatî de Sazkirina Hevokê	37
2.4.2. Di Zimanê Ingilîzî de li gor Dema Kişandina Avaniyên Tebatî	37
2.4.2.1. Dema Niha (Present Progressive)	37
2.4.2.2. Dema Fireh (Simple Present)	38
2.4.2.3. Dema Borî (Simple Past)	38
2.4.2.4. Dema Bê (Future Tense)	38
BEŞA SÊYEM	40
3. Di Zimanê Kurdî de Avaniya Tebatî	40
3.1. Di Zimanê Kurdî de Avaniya	40
3.2. Di Zimanê Kurdî de Pênasiyên Avaniya Tebatî	40
3.2.1. Danberhevkirina Ereniya û Neyîniya Avaniya Tebatî	42
3.2.1.1. Danberhevkirina Mînakên Erenî	42

3.2.1.2. Danberhevkirina Mînakên Neyînî.....	43
3.3. Di Zimanê Kurdî de Karanîna Avaniya Tebatî:	44
3.4. Di Zimanê Kurdî de ji Aliyê Semantîk we Avaniya Tebatî:.....	46
3.4.1. Di Dîwana Maleyê Cizirî de ji aliyê Semantîk ve Avaniya Tebatî	46
3.4.2. Di Dîwana Ehmedê Xanî de ji aliyê Semantîk ve Avaniya Tebatî	52
3.4.3. Di Dîwana Baba Tahîrê Uryan de ji aliyê Semantîk ve Avaniya Tebatî:	53
3.4.4. Di Berhemên Feqiyê Teyran de Ji aliyê Semantîk ve Avaniya Tebatî.....	54
3.5. Di Zimanê Kurdî de ji Aliyê Teşeyî de Avaniya Tebatî.....	55
3.5.1. Di Romana Şivanê Kurmanca de Avaniya Tebatî :.....	56
3.5.2. Di Dengbêjî de ji Aliyê Teşeyî we Avaniyên Tebatî:.....	58
3.5.3. Di Kovara Hawarê 'de Avaniya Tebatî:.....	66
3.5.3.1. Di Kovara Hawarê'de Hejmara Yekem.....	66
3.5.3.2. Di Kovara Hawarê'de Hejmara Duyemîn.....	67
3.5.3.3. Di Kovara Hawarê'de Hejmara Sêyem.....	68
3.5.3.4. Di Kovara Hawarê'de Hejmara Çarem.....	68
3.5.3.5. Di Kovara Hawarê'de Hejmara Pêncem	69
3.6. Di Zimanê Kurdî de Damezirandina Avaniyê de Kiryarên Tebatî	69
3.7. Di Zimanê Kurdî de Cudahiya Cureyên Avaniya Tebatî:	72
3.7.1. Di Avaniya Tebatî de ê ku Şexsê Wan Nediya:	72
3.7.2. Gerguhêz, û di Avaniya Tebatî de ê ku Şexsê Wan Nediya:	73
3.7.3. Gerguhêz , û di Avaniya Tebatî de Cureyên ku Kirde Nediya :.....	74
3.7.4. Di Avaniya Tebatî de Kiryarên ku bi Xwe (Serê) Çê Dibin.....	75
3.7.5. Gerguhêz, û di Avaniya Tebatî de Rewşên Pêşniyarên Xweser	76
3.8. Di Zaravayên Kurdî de Avaniya Tebatî.....	77
3.8.1. Di Zaravaya Kirmanca (Zazakî) de Lêkerên Tebatî :.....	77

3.8.1.1. Di Zaravaya Zazakî de Forma Lêkera Hatîn (Ameyene) ê....	79
3.8.1.2. Di Zaravaya Zazakî de Forma Lêkera Bê Hatîn (Bê Ameyene) ê.	80
3.8.1.3. .Di Zaravaya Zazakî de li gor Koka Forma Lêkerên Aktîf û Pasîf (Goreyê Koka Karî Formo Aktîf û Pasîf)	82
3.8.2. Di Zaravaya Soranî de Lêkerên Tebatî :	82
3.8.3 Di Zaravaya Goranî de Lêkerên Tebatî :	83
3.9. Di Deman de Kişandina Avaniya Tebatî	85
3.9.1. Di Dema Boriya Diyar de Avaniya Tebatî (hat... / nehat...)	85
3.9.2. Di Dema Boriya Nediya de Avaniya Tebatî (hatiye... / ne hatiye)	85
3.9.3. Di Dema Niha de Avaniya Tebatî (tê ... / nayê...)	86
3.9.4. Di Dema Boriya Dondar de Avaniya Tebatî (dihat... / nedihat) ...	86
3.9.5. Di Dema bê de Avaniya Tebatî (ê bê... / ê neyê...)	86
3.10. Di Zimanê Kurdî ‘de Guherandina Avaniya Tebatî	87
3.11. Li gor Herema Karanîna Avaniyên Tebatî	89
3.11.1. Di Herema Bedlîsê de Karanîna Avaniyên Tebatî	89
3.11.2. Di Herema Colemêrgê de Karanîna Avaniyên Tebatî	91
3.11.3. Di Herema Amedê de Karanîna Avaniyên Tebatî	92
3.11.4. Di Herema Meletî de Karanîna Avaniyên Tebatî	94
3.11.5. Di Herema Mêrdînî de Karanîna Avaniyên Tebatî	94
3.11.6. Di Herema Qersê de Karanîna Avaniyên Tebatî	96
3.11.7. Di Herema Rihayê de Karanîna Avaniyên Tebatî	97
3.11.8. Di Herema Dîlokê de Karanîna Avaniyên Tebatî	98
3.11.9. Di Herema Muşê de Karanîna Avaniyên Tebatî	98
3.11.10. Di Herema Sêrtê de Karanîna Avaniyên Tebatî	99
3.11.11. Di Herema Şirnexê de Karanîna Avaniyên Tebatî	100

3.11.12. Di Herema Semsûrê de Karanîna Avaniyên Tebatî	101
3.11.13. Di Herema Wanê de Karanîna Avaniyên Tebatî.....	101
3.11.14. Di Herema Êlihê de Karanîna Avaniyên Tebatî.....	102
ENCAM.....	104
ÇAVKANÎ.....	106



KURTEBÊJE

Vgz.	: Veguhêzer
Weş.	: Weşanxane
Zmns	: Zimannas
F	: Fonksiyonî
Z.d	: Zimanê devkî
N.G.R	: Nêzikhatiya Gerdûniya Rêzimanî
R.K.S.D	: Rêzimana Koma Ser-Derketî
Z.T.K.R	: Zanistina Teşeya Kiryar û Rewşê
A	: Aktîf
P	: Pasîf
K.K.G	: Kurama Kargerî û Giredanî
P.P	: Perlmutlar Pastal
M.M	: Mayindena Mijar
H.D	: Hinartina Dûringê
P	: Pirs
B	: Bersi

DİZİNA TABLOYA

Tablo : 1 Ev tablo, ji aliyê binyadê ve cureyên lêkera berhevî dike	2
Tablo: 2 Ev tablo, mastarê hevedudanî û peyvên ku lêker çê dike şanî me dide	5
Tablo: 3 Ev tablo, Li gor dema kirde û bireser di çi şiqelê dibînin şanî me dide	7
Tablo: 4 Ev tablo, di zimanan de pêveber di hevokê de çava tê rêz kirin şanî me dide	22
Tablo: 5 Ev tablo, di lêkera lêbatî de rêzika hemana hiyerşiya hevokê çava tê nîşan şanî me dide	34
Tablo: 6 Ev tablo, di lêkera tebatî de rêzika hemana hiyerşiya hevokê çava tê nîşan şanî me dide	34
Tablo: 7 Ev tablo, Li gor Gîvon hiyerşiya mijarê di hevokê de çava tê nîşan kirin şanî me dide	35
Tablo: 8 Ev tablo, Zimanê Kurdî û Ingilîsî de avaniya tebatî carîna ku bireser bistîne tebatî nayê karanîn	42
Tablo: 9 Ev tablo , di heyînên candêr û necandêr de avaniya tebatî û aktîfî û pasîfî şanî me dide	70

DESTPÊK BEŞA YEKEM

1. Lêker

Lêker, kar, tevger, rewş û bûyînê dîyar dike. Bi awayekî rêzimanî hêmana sereke ya pêveberê û rewşekê nîşan dide¹. Hêmana bingehîn ya hevokê ye. Qertafên kesan û deman distînin û darazekê çê dikin²

Lêker, ew cureyê bêjeyê ye ku bi awayekî rêzimanî hêmana sereke ya pêveberê ye û bizavekê yan rewşekê nîşan dide. Di gelek zimanan de mebesta pêkanîna ahenga bi kirdeye re li gorî dem, rawe, avanî û rewşê tê kişandin. Wate jî aliyê morfolojîk ve lêker bi kêşanê peywira xwe bi cih tîne.

Ji ber giraniya xwe ya pevgihandina peyvvan, beşa sereke ya hevokê ye . di kurdî de navleka “*lêker*” girîngiya wê li ber çavan radixe. Di nav cureyên bêjeyan de herî girîng û berfireh “*lêker*”e . Celadet Bedirxan dema ku ev nav li vê têgihê kiriye , girîngiya wê li ber çavan girtiye.

Lewre peyva “*lêker*”, ji “*lêkirin*”ê tê. Lêkerên, her wekî xuya ye wateya “*avakirin*” ê dide. Her çiqas gelek wateyên wê yên din jî hebin. Li vê dere di wateya “*avakirin*” ê de ye. Çawa ku “*dîwar lê kirin*”tê gotin. Di wê minakê de hevok li ser lêkerê tê avakirin. Bê lêker, hevok ava nabe. Di wê nîşanê de me dît ku rêzimana Kurdî de lêker bi tene cihekê sereke ye û bê wî, hevok bi tenê nayê avakirin.³

Mînak:

Solîn duh ji firoşgehê benîşt kirî.

Solîn duh benîşt kirî.

Solîn benîşt kirî.

Solîn kirî.

Di hevoka dawî de lêkera (k' ê) bi serê xwe ma, lê dîsa jî hevok ji hevoktiyê neket. Lewre dema ku mirov dibêje “*kirî*” di nava wê de kirde û bireserekê veşartî heye. Mirov dizane ku yekî tiştek kiriye ev yek jî têrî sazkirina hevokê dike. lê dema ku di heman hevokê de lêker an ku peyva “*kirî*” bê xistin, li holê hevok namîne. Kî dikare ji van peyvên ku li pey hev rêz bûne fehm bike: “*Solîn duh ji firoşgehê benîşt ...*”

¹ Sami Tan, *Rêzimana Kurmancî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2011, r. 205.

² Bahoz Baran, *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Belkî, Stenbol, 2012, r. 135.

³ H.b.r., r. 215.

Lêker ji gelek aliyan ve ji hev tèn cuda kirin. Bo nimûne lêkerên bingehîn û lêkerên alîkar jî di pêkanîna pêveberê de ji hev tèn veqetandin. Kêşana lêkerê rêzîkîbûn û nerêzîkîbûna lêkeran diyar dike. Bo nimûne, di Kurmancî de lêkera “*dîtin*” di dema niha de dibê “*dibîne*” lewma jî lêkerê nerêzîkî ye .

Ji aliyê wateyî ve lêker li gorî hinek pîvanan hatine senifandin. Her wekî lêkerên çalakî û tevgerê (xwendin- kirîn), lêkerên doman û pêvajoyê (bazdan, avjenîkirin , hilkişîn) , lêkerên rewşê (razan , jiyîn , rawestan) lêker qewimînê (pêkhatin, guherîn).⁴

1.1. Ji Aliyê Binyadê ve Lêker

Lêker bi aliyê binyadê we bi sê beşan pêk tê ; lêkerên xwerû, lêkerên darijtî, û lêkerên hevedudanî.

Beş	Mastar	Lêker
Lêkerên Xwerû	Ketin	Rojîn ket
Lêkerên Darijti	Daketin	Rojîn daket
Lêkerên Hevedudanî	Nexweşketin	Rojîn nexweş ket
Lêkerên Biwejtî	Jibîrkirin	Rojînê sparteka xwe bîr kir

Tablo : 1 Ev tablo, ji aliyê binyadê ve cureyên lêkera berhevî dike.

1.1.1. Lêkerên Xwerû

Ev curê lêker, her wekî ku navê wan jî diyar e , di binyata xwe de lêker in û ji hêmanekê tenê pêk hatine. Gava ku lêker li gorî dem û kesan nayên kişandin, qertafên raderan digirin. Lêker bi gelemperî ji lêkerên xwerû pêk tê ango biwate bi tenê ji peyvekê tê û di dawiya mastarê de pêvekê hebe jî ev wek lêkerên xwerû tê hesabandin.⁵ Ev curê lêker, her wekî ku ji navê wan jî diyar e , di binyata xwe de lêker in û ji hêmanekê pêk hatine gava ku lêker li gor dem û kesan neyên kişandin ,

⁴ Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 216.

⁵ Kadîr Yıldırım, *Temel Ağıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî Lehçesi)*, Mardin Artuklu Üniversitesi, Mardin, 2012, r. 41.

qertafên raderan digirin .lêker bi gelemperî ji lêkerên xwerû pêk tên. Hejmara lêkerên xwerû kême, lê ev cure lêker bingeha piraniya lêkerên kurmancî pêk tînin. Her wiha ji rayeka dema niha ya van lêkeran morfemên serbixwe bi dest dikevin, ew morfem carinan dibin paşgirên ku kirdenavan saz dikin û hin caran jî bingeha peyvên nû pêk tînin. Ji bilî vê yekê ji wan lêkeran hinek navdêr bi dest dikevin⁶.

Gelek ji van lêkeran hatine jibîrkirin, hinekan jî wan karîgeriya xwe ji dest daye îro em li şûna wan hinek lêkerên pêkhatî, hevedudanî yan jî lêkerên biyanî û biwêjan bi kar tînin. Lêker, di wateyê de guherandinekê girîng çênake lê di nav hevokê de karganiyê diguherîne.⁷

Mînak :

Ajot : *Apê min wesayet ajot.*

Firof : *Nanpêj nan firot*

Girt : *Min du heb kîvroşk girt.*

Axaft : *Mamoste, li hemberî me axivî*

Dît : *Min du leşker dît.*

Doş : *Em çêlek didoşin*

1.1.2. Lêkerên Darijtî (Pêkhatî)

Zimanê Kurdî de lêker, bi alîkariya paşgir û pêşgiran pêk tê. Qertaf çî pêşgir çî jî paşgir bi serê xwe, ne xwediyê tu wateyê ne. Lê dema ku bi lêker, navdêr an jî hevalnavekê ve dibin, wateyê nû didin wê. Di z.K de di beşa lêkeran de mijara herî berfireh mijara lêkerên pêkhatî ye. Divê em ji bîr nekin ku gelek bêjeyên watedar jî bi domana demê re bûne qertafên bêjesaz. Hinek peyvên bi demê re wateya xwe wînda kiriye û ji bêjeyên ferhengî dageriyane bêjeyên erkî hinek jî ketine ve qonaxê lê hê wateya wan tê zanîn. her wiha hinek morfêmen di hene ku bingeha xwe de daçek in, lê niha wekî qertafên bêjesaz tên bikaranîn.

Di Kurmancî de hejmara lêkerên xwerû gelekî kême, bi giranî lêkerên pêkhatî, hevedudanî û hin caran lêkerên biwêjî tên bikaranîn. Ji ber ku rêz û rêzikên lêkerên pêkhatî diyarkirî û hêsantir in, meyla zimên ber bi wan ve ye. Ji ber vê sedemê gelek

⁶ Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 258.

⁷ Nurettin Demir, Emîne Yılmaz, *Türk Dili El Kitabı*, Grafiker Yayınları, Ankara, 2012, r. 226.

lêkerên xwerû dageriyane ser formekê pêkhatî. Di vê yekê de mijara gerguhêzî û negerguhêziyê jî bandor li lêkeran kiriye di lêkerên xwerû de kêman caran formên gerguhêz û negerguhêz li gel hev peyda dibin pirî caran formek ji van di nav lêkerên xwerû de peyda nabe, lewre jî li ser bingeha rayeka dema niha forma din pêk tê, piştî jî li ser bingeha forma pêkhatî , hemwateya lêkera xwerû ya heyî jî tê dariştin.⁸

Mînak :

Çê- : *Min ji xwe re wêne çêkir.*

Der- : *Perê xwe ji bêrika xwe derxist.*

Rû- : *Ape mîn kew rûçikand.*

Têk- : *Hevalan her tişt têkxistin.*

Ve- : *Ez avê vedixwim*

1.1.3. Lêkerên Hevedudanî

Ev cure lêker ji du an jî zêdetêr hêmanan pêk tên. Hêmana yekem ji navdêrekê pêk tê, hêmana duyem jî ji lêkerekê pêk tê. Lêkerên alîkar ên ku bi hêmanên navdêr re tên bikaranîn jî ev in: **kirin , ketin , xistin , dan , hatin , anîn... whd.**

Lêkerên hevedudanî , hinek hemanên li ser lêkerên cuda tê barkirin û ji lêkerên xwerû tê çêkirin⁹.

Mînak :

Pêxistin : *pê – xistin*

Vexwarin : *ve- xwarin*

Bazdan : *baz-dan*

Nîşe : *Mastarê hevedudanî bi hev re tê nivîsandin lê lêkerên hevedudanî cuda tê nivîsandin.*¹⁰

⁸ Tan, *Rêzimana Kurmancî* , r. 260.

⁹ Emir Djeladet Bedirkhan, Et Roger Lescot,(Grammaire Kurde),.Institut Kurde de Paris Dépôt Légal, Avril 2001, r. 119.

¹⁰ Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî Lehçesi)* , r. 42.

Peyv	Mastar	Minak
Nav + lêker	Dengdan	Wan li welêt deng dan
Rêngder + lêker	Dirêjkirin	Destê xwe dirêji min kir
Lêker + lêker	Dankirin	Wi ev kar bimin da kirin

Tablo :2 Ev tablo,mastarê hevedudanî û peyvên ku lêker çê dike şanî me dide.

- Lêkerên hevedudanî piranî bi lêkerên alîkarî *kirin* , *bûn* ,û ji bilî wê *anîn* , *birin* , *hiştin* ,*mayîn* ,*danîn* , *girtin*, *şikestîn*,*ketin whd..* pêk tê

Mînak :

Kirin- : *Bave min nan belav kir.*

Bûn - : *Paca malê hûr bû.*

Dan- : *Te name bi min dan şandin.*

Pê - : *Agirê Newrozê pêxistin.*

Asêbûn : *Nexweşxane asê bû*

Nexweşketin : *Zarokê meta min nexweş ketin*

1.1.4. Lêkerên Biwêjî

Ev lêker jî ji hêmanên navdêr û ji lêkerekê alîkar pêk tên. Ji hêla wateyê ve ji lêkerên din ên hevdudanî vediqetin. Ev lêker biwêjî ne û wateyên məcəzî dihewînin. Hêmanên van lêkeran ji du an zêdetir peyvan pêk tên.Gelek caran hêmanên din ên hevokê jî dikevin nava van lêkeran.

Bi daçek û di yekjimara sêyem de di cinavkên kesan de an jî di daçek û peyva ‘‘ hev’’ wek lêkerên biwêjî tê qebûl kirin¹¹.Lêkerên alîkarî di zimanê Kurdî û Ingilîsî de li pêşiya lêkeran tên dema ku tên kêşandin ev kêşandin li ser alîkarî çêdibe¹²

Mînak :

Serîrakirin: *Me jî serî rakir.*

Devjêberdan: *Te dev jê berd?*

Serîtewandin: *Me serî netewand*

¹¹ Mûrad Ciwan, *Kürtçe Dilbigisi* , Kurmanca Lehçesî, Jîna Nû Yayınları, Stokholm, 1992, r. 86.

¹² İbrahim, Çapar: *Berawirdkirina Lêkeran Biwêjî û Bi Daçek di Kurdî û İngilîzî de*, Teza beşabilind Zanîngeha Amed, Yaşayan Diller Enstitüsü, Amed, 2017, r. 22.

Guhdan: Guh bide min!

Bêhtengbûn: Bêhna wî teng bû.

1.2. Ji Aliyê Bireserê ve Lêker

1.2.1. Lêkerên Gerguhêz

Lêkerên ku bireserên wan hene gerguhêz in. Di van lêkeran de kirde bandora xwe li ser kes an tiştekî din çêdike. Ev lêker di Kurmancî de pirr hindik in . Ev lêker bersiv didin pirsên “*kî/kê*” û “*çi*” yê.

Di zimanê Kurdî de heke lêkerek *bireser* bigre ev lêker gêrguhêz e . di zimanê me de gêrguhêzî gelek girîng e , lewre zaravayê Kurmancî nîv ergatîv e ji ber vê yekê jî lêkerên gerguhêz û nergerguhêz ji hev cuda têne kişandin. Lêkerên gerguhêz di demên bê û niha de li gor kirdeyê , di dema borî de li gorî bireserê têne kişandin. Ji ber vê yekê di lêkerên gerguhêz de di demên bê û niha de kirde xwerû ; bireser tewandî ye di demên borî de kirde tewandî bireser xwerû ye ¹³Di lêkerên gerguhêzî de di nav hevokêde , piranî heman tew hene¹⁴.

Wek di şeqla jor de ji, lêkerên gerguhêz di demên bê û niha de li gor kirdeyê ; di dema borî de li gorî bireserê têne kişandin.

	Kirde	Bireser
Dema bê	Xwerû	Tewang
Dema niha	Xwerû	Tewang
Dema borî	Tewang	Xwerû

Tablo :3 Ev tablo, li gor dema kirde û bireser di çî şîqlê dibînîn şanî me dide.

Wek di şeqla jor de jî, di lêkerên gerguhêz de di demên bê û niha de kirde xwerû ; bireser tewandî ye di demên borî de kirde tewandî bireser xwerû ye.

¹³ Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 215.

¹⁴ Leyla Karahan, *Türkçede Söz Dizimi*, Akçağ Yayınları, Ankara , 2016, s. 45.

Lêkerên gerguhêz de , hemû lêkerên lebatî ku tumleçek bênavgîn bistîne jî lêker dibe gerguhêz. Ji gerguhêzên mastarên xwerû de ku em derfet bistînîn , bi rasterast tumleçek nestîne jî herdaîm gerguhêz e.¹⁵ **Mnk : (bazdan , nimêj kirin)**

Ji ber heman sedemê di kurmancî de peyv ditewin û du kom cînavk (xwerû û tewandî) hene. Di kurmancî de kirde û bireser bi riya tewangê ji hev têne veqetandin. Lewre jî di kurmancî de gerguhêzî û negerguhêziya lêkeran pir girîng e. Nexwe em ê çawa fehm bikin ku kîjan lêker gerguhêz e, kîjan ne gerguhêz e ? Em di hevokê de li rewşa lêkerê binêrin. Di hevokê de dema ku mirov jî lêkerê *pirsa* ‘‘çi, kî/kê’’ bike heke bersiv ji kirdeyê cudatir be, ew lêker gerguhêz e ;heke bersiv dîsa li kirdeyê vegere, ev lêker negerguhêz e.¹⁶

Mînak :

Me goga piya lîst.

Pirs : *Kî goga piya lîst ?*

Bersiv : *Me goga piya lîst.*

Ji vê yekê jî diyar dibe ku lêkera lîstikê gerguhêz e.

Mînak :

Ednan pirtûk dixwîne.

Pirs : *Kî pirtûk dixwîne ?*

Bersiv : *Ednan pirtûk dixwîne.*

Di wek mînaka jor de tê xuya kirin de jî eger ku pirs li ser pêveberê bikin û bersiv lê hilbigirin, ev hevok gerguhêz e .

Mirov dikare gerguhêziya lêkerên xwerû bi wî awayî destnîşan bike. Ji lêkerên hevedudanî yên ku bi lêkera ‘‘kirin’’ pêk hatine, gerguhêz in. Ji bilî vê lêkerê jî mîna lêkera ‘‘dan , xistin , anîn , birin û girtin’’ ê hene ku lêkerên gerguhêz çê dikin.

¹⁵ Bedirkhan, *Grammaire Kurde*, r. 120.

¹⁶ Baran, *Rêzimana Kurmancî*, r.135.

Mînak :

Ez ji bo kar amade bûm.

P : *Kî ji bo kar amade bû ?*

B : **Ez** amade bûm.

Ez fêrî xwendinê bûm

P : *Kî fêr bû ?*

B : **Ez** fêr bûm.

Di lêkerên pêkhatî de paşgira “-an , -din” jî lêkerên gerguhêz pêk tîne ji bilî van paşgiran paşgira “- ijandin” û “-isandin” jî lêkerên gerguhêz pêk tînin. Divê em bi bîr bixin ku hinek lêkerên awartê yên mîna “ birîn, kirîn ,nivîsîn ” her çî qas bi “-în” ê diqedin jî lêkerên gerguhêz in. Her wiha kesên ku ji zikmakî bi kurdî nizanin divê ji bo gerguhêzî lêkerên xwerû li ferhengan binêrîn. Lêkerên gerguhêzî û negerguhêzî di dena pêveka pêş aynî ye lê pêveka dawî diguhere.¹⁷

Gerguhêziya lêkerên hevedudanî û biwêjî li gorî lêkera bingehîn diyar dibe. Bo nîmûne, lêkera “ lihevkirin ” jî ber lêkera “ kirin ” ê gerguhêz e. Lêkerên “ gotin , dan , anîn , danin ” gava ku di peyvira lêkerên gerguhêzî di şiklê bireserê de bin ev pêvekê jor piştî bireserê tên.¹⁸

1.2.1.1. Gerguhêzên Binecî

Ev pol kirin jî hêla mamoste Kadrî Yıldırım ve hatiye çê kirin. Girîngiya vê serekê bi tenê ne bi kirdeyê ve tê sînor kirin ji bilî vê eger lêker bireser hilbigre ev lêker , lêkerên gerguhêzî binecî ye. Binyata vê li ser lêkerên gerguhêzî de ava dibe.¹⁹

Mînak:

Birin : *Min kurê xwe bir dibistanê.*

Kirin: *Min îro karekê nekir.*

Şûştin : *Mizgînê fîraq şûştin.*

Xwarin: *Azad şîvê dixwe .*

¹⁷ Kamuran Ali, Bedirxan: *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer, Özgürlükyolu Yayınları, İstanbul,1977, r.47.*

¹⁸ Kamuran Ali, Bedirxan: *Kolay Kürtçe (Kurmancî) , Doz Yayınları, İstanbul, 1991, r.66.*

¹⁹ Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbigisi (Kurmancî Lehçesi)*, r. 97.

1.2.1.2. Gerguhêzên Nebinecî

Ev pol kirin ji hêla mamoste Kadrî Yıldırım ve hatiye çê kirin. ev lêker di aliyê bingehî de negerguhêzin lê di dawî de bi hêla pêveka pêyva “-andin” ê dibe gerguhêz.²⁰

Mînak:

Çirîn:

Çirandin

Êşîn :

Êşandin

Gevizîn

Gevizandin

Helîn:

Helandin

Qetîn:

Qetandin

1.2.2. Lêkerên Negerguhêz

Lêkerên ku bireserên wan tune ne, negerguhêz in. Bandora kirdeyê li ser kes an tiştekî çênabe. Lêkerên negerguhêz, piştê tumleçê di navê bêrpebûn de tên.²¹

Ji ber heman sedemê di Kurmancî de peyv ditewin û du kom cînavk (xwerû û tewandî) hene. Di kurmancî de kirde û bireser bi riya tewangê ji hev têne veqetandin. Lewre jî di kurmancî de gerguhêzî û negerguhêziya lêkeran pir girîng e. Nexwe em ê çawa fehm bikin ku kîjan lêker gerguhêz e, kîjan ne gerguhêz e ? Em di hevokê de li rewşa lêkerê binêrin. Di hevokê de dema ku mirov jî lêkerê *pirsa* “çi , kî/kê ” bike heke bersiv ji kirdeyê cudatir be, ew lêker gerguhêz e, heke bersiv dîsa li kirdeyê vegere, ev lêker ne gerguhêz e.²²

Hinek peyv di hevokê de bi piranî xwe eşqere dikin ku negerguhêz in. Mîna lêkera “bûn ” e ji bilî vê peyvê lêkera “ ketin , man ” ê ku hene di hevokê de negerguhêz çê dikin. di lêkerên pêkhatî de paşgira “-în ” lêkerên negerguhêz çê dike , ji bilî vê jî paşgirên “- ijin ” , “-isîn ” lêkerên negerguhêz in .

²⁰ Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî Lehçesi)*, r. 97.

²¹ Kemal Badilli, *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramerî*, Ankara Ciltevi , Ankara, 1965, r.102.

²² Baran, *Rêzimana Kurmancî*, r.135.

Mînak :

Em tîn mala we.

Ew reviyân

Ew çû bêriyê

Nan pîr germ bû.

Di wan mînakên jor de pîrsa ku em li ser pêveberê dikin bersiva bireserê nade ji ber vê ev hevok ji aliyê teşeyê de hevokên negerguhêz in.

1.2.2.1. Negerguhêzên Xwazekî

Ev pol kirin ji hêla mamoste Kadrî Yıldırım ve hatiye çê kirin. Ev lêkêrên negerguhêzê xwazekî , bi hêz û îradeya kirde yê we çê dibe . bûyer di bin bandora xwedî kirdeyê we dertê holê.²³

Mînak :

Azad hat.

Mizgîn çû.

1.2.2.2. Negerguhêzên Rûdanî

Ev lêkêrên negerguhêzê rûdanî , bi hêz û îradeya kirde yê we çê nabe . Bûyer di bin bandora xwedî kirdeyê we dernayê holê, ev lêker bi tenê serê xwe çê dibin kirde di wir de pozisyonê pasif digre û bûyer bi xwe çê dibe.²⁴

Mînak :

Av rijîya.

Erd hejiya.

²³ Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî Lehçesi)*, r. 96.

²⁴ H.b. r, r.97.

1.2.3. Ji Lêkerên Negerguhêz Veguhestina Lêkerên Gerguhêz

Lêkerên negerguhêzî bi van rêyan dikarin bibin lêkerên gerguhêzî :

1. Hevokê ku pêveka “-in ” û “-iyan ” bistîne bi cihê van pêveka , pêveka “-andin” were ev pêvek bi vî awayê dibe gerguhêz²⁵

Mînak :

Forma -iyan/în

Beziyan / bezîn

Çêjiyan / çêjîn

Firiyan / firîn

Geriyân / gerîn

Hejiyan/ hejîn

Keniyân/kenîn

Leqiyân / leqîn

Leziyan /lezîn

Liviyan/ livîn

Meşîn / meşiyân

Nasiyan / nasîn

Peqiyân/ peqîn

Reviyan / revîn

Weşiyân/ weşîn

Xuriyan/ xurîn

Forma -andin

bezandin

çêjandin

firandin

gerandin

hejandin

kenandin

eqandin

lezandin

livandin

meşandin

nasandin

peqandin

revandin

weşandin

xurandin

Nîşe : Hinek mînak îstîsnane wek mînaka *birîn*. Ev mînak gerguhêz e.


2. Hinek lêker, bi formekî lêkerên din dibin gerguhêz :

Mînak :

²⁵ Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî Lehçesi)*, r. 98.

Bûn

Goşt sor bû.
Selete tirş bû.
Azad mezin bû.




Kirin

Min goşt sor kir.
Te selete tirş kir.
Te ew mezin kir.

Cûn

Zarok cûn malê.
Zarok diçin dibistanê
Zarok naçin dibistanê .




Birin

Min zarok birin malê.
Ez zarokan dibim dibistanê
Ez zarokan nabim dibistanê

Hatin

Mêvan hat mala we
Rustem tenê nayê.




Hanîn

Min mêvan hanî mala we
Ew hevalên xwe jî bi xwe re tîne

Mayîn

Zarok li malê man
Bila zarok li malê nemînin.
Ew dixwaze ez li vir bimînim.




Hîştin

Rûkenê zarokên xwe li malê. Hîştin.
Zarokan li malê mehêle.
Ew dixwaze min li vir bihêle.

Ketin/ Derketin

Rustem ket xwarê.
Gustilîk ji tiliya min derket.
Rizgar ji odayê dernakeve.



Xistin/ Derxistin

Te rustem xist xwarê.
Zozanê gustilîk ji tiliya derxist.
Wî ji odayê derxe.

1.2.4. Lêkerên Dançêker:

Dema ku mirov karekî bi yekî din bide kirin, divê mirov ‘*avaniya dançêker*’ bi kar bîne di avaniya dançêker de hêmaneke nû tev li hevokê dibe. Êdi li şûna kesê ku wî karî dike, kesê ku wî karî dike dike kirin dibe kirde.

Avaniya dançêker bi aînkariya lêkera ‘*dan*’ ê pêk tê. Dema ku yek bibêje , ‘*ez kincan dişom*’ ew vî karî bi xwe dike, lê dema ku kesekî din li şûna wî kincan bişo, wê deme dê bibêje ‘*ez kincan didim şûştin*’ ji bo pêkanîna avaniya dançêker , em lêkera ‘*dan*’ ê li gorî dem , kes û raweyan dikişînim û tînin ber lêkera bingehîn wekî rader bi lêv dikin.²⁶

Mînak:

Erenî

Ew ê wan bide girtin

Ew wan dide girtin

Wî ew da girtin

Neyînî

Ew ê wan nede girtin

Ew wan nade girtin

Wî ew neda girtin

Her wekî jî mînakan diyar e, avaniya dançêker jî bi lêkerên gerguhêz pêk tê. Ji ber ku divê di bûyerê de ‘*biker*’ û karê ku tê kirin ‘*bireser*’ ji hev cuda bin da ku bê zanîn ku ‘*biker*’ wî karî bi hinekên din dide kirin. dema ku biker û Têker heman kes bin , hingî avaniya dançêker pêk nayê . lewre jî ne pêkan e ku mirov hevoka ‘*bibeje* , ‘*hevalê min qesrek da avabûn*’ , divê mirov bibêje ‘*hevalê min qesrek da çêkirin* .’

Di zimanê gelerî de avaniya dançêker bi awayekî din jî tê çêkirin, ew jî dîsa bi alîkariya lêkera ‘*dan*’ ê pêk tê, li vir daçeka ‘*bi*’ jî pêwîst e.

Mînak:

Erenî

Wî ez bi girtin dam.

Wan em bi kûştan da

Ew kincên xwe bi şûştin dide

Neyînî

Wî ez bi girtin nedam

Wan em bi kûştan nedan

Ew kincên xwe bi şûştin nade.

Li aliyê din hin lêkerên gerguhêz bi paşgira ‘*-andin*’ ê dibin dançêker bo nimûne lêkera ‘*bihistin*’ lêkereke gerguhêz e û bi alîkariya paşgira ‘*-andin*’ ê dibe ‘*bihîstandin*’ û ji aliyê wateyê ve dibe dançêker . Her wiha lêkerên mîna ‘*axivandin*’ , ‘*lîstandin*’ , ‘*mijandin*’ ê bi heman awayî bûne dançêker, jixwe di

²⁶Tan, *Rêzimana Kurmancî* , r. 323.

zimanê Farisî de ji paşgira ‘‘ andin ‘‘ lêkerên negerguhêz dike gerguhêz, lêkerên gerguhêz jî dike dançêker. Lê di kurdî de hemû lêkerên gerguhêz nake dançêker. Dîsa jî hinek lêkerên gerguhêz bi alîkariya ‘‘ *andin* ‘‘ ê dibin dançêker.²⁷

Mînak:

Min ew da axaftin

Min ew axivand

Min ew da lîstin

Min ew lîstand.

Min tişteke da bihîstin

Min tişteke bihîst



²⁷Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 324.

BEŞA DUYEM

2. Ji Nêrînekê Gerdûnî ve Avanî û Avaniya Tebatî

2.1. Ji Nêrînekê Gerdûnî ve Avanî

Zimannasan, xwe ji pênaseyan têgeha avaniyê dûr xistine. Tenê cih dane pênaseyên ku li ser pirtûkên rêzimanî. Zimannasan bi gelemperî bi awayekî zanistî avaniyê wekî *‘‘ê ku beşdarî lêkerê dibe/ ew ê dide kirin/bandor lê dike/bandorê dide kirin û ew têkîlîya di navbera pêveberê de’’* têşeyê didin hevokê nîşan didin. Di eslê xwe de ew pênasiyên jorê di zimannasiyê de têgehên *‘‘ew ê dike/ew ê bandorê lê dide û ew ê dide kirin’’* pênaseya wan heye. Zimannasan ji bo ku pênaseya van têgehên bike hêmanên dizî yên wek *‘‘Ew ê dike, ew ê bandor lê dibe, ê ku dide kirin bikar anînin’’*. Ev jî di eslê xwe de tê wê wateyê ku bi kurahî ew ê li ser mijara fonksiyona avaniyê bisekinin û bêtir giraniyê bidine wê.

Ev nêzikhatiya zimannasan yekser pirsra hevoksaziyek taybet a avaniyê yan jî hin cureyên avaniyê heye yan tune ye aniye hişê meriv. Zimannasan erê ku li ser sedem û armancên guhertina avaniya li ser lêkeran sekinîne lê bêtir girîngî danin ew guhertinên mekanî yên hevoksaziya ku di hundirê hêmanên hevokê de. Li gorî zimannasan em dikarin hevoksaziya hêmanan li gorî axaftina xwe rêz bikin û rêza wê li gorî axaftina xwe biguherînin. Yekemîn rêya bingehîn ya şixulandina (F) vê armancê jî ev e ku listina bi saziya avaniyan hevokan e. Rehendek din jî ji aliyê nêrîneke gerdûnî ya avaniya ev e ku guhertinên semantîk ên ku di encama guhertinên avaniyan de derdikeve holê ye. Gava ku ji aliyê zimannasiyê ve avanî tê vekolîn ji saziyek kûr, saziyek rûxsar derdikeve û ji vê saziya avaniyêk jî armancek mantiqî û semantiyek diyarkirî pêk tê.²⁸

Zimannasan, li ser avaniya tebatî çiqas li gorî rêzikan tiştên cûda bibêjin jî lê li gorî semantîk ve lêker her dem di bin bandoriyêkê de dibîne. Her malbata zimên li gorî xwe avaniyêk ava kiriye lê di malbata zimên de lêker her dem bê xweserî û bê hişmendîya xwe dûr ketiye ango di bin bandoriya lêkera kirinê de bêçar maye.

2.2. Ji Nêrîneke Gerdûnî ve Avaniya Tebatî

Di vê beşê de ji zimannasiyê sûd hatiyê wergirtin û ew ê li ser bikaranîna fonksiyona hevokên tebatî û vegeerîna avaniya tebatî derfetên çawa li ser ziman temîn

²⁸ Mehmet Özgür Duru, *Türk Dilinde Edilgen Çatı*, (Ondukuz Mayıs Üniv. Sosyal Bilimler Üniversitesi Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi), Samsun, 2009, r. 9.

dikin bê sekinandin. Lewra gava ku pirtûkên li ser zimannasiyê tê vekolîn em dibînin ku ne li ser mijara avaniya tebatî li ser kêrhatina avaniya tebatî sekînin. Zimannas, gava ku lêkolînê li ser fonksiyona avaniya tebatî dikin bêtir serî li stratejiya “*hilberîner-zimannasiya veguherînî*” didin. Di bin siya vê stratejiyê de gava ku ji avaniya lebatî derbasî avaniya tebatîyê dibin li ser vebûnên hevoksazî û semantîk ew ê bê sekinandin. Ji bo ku em mijarê baştir fam bikin pêşî ew ê pênaseyek kurt a metoda hilberîner-zimannasiya veguherînî bê kirin û piştî jî ew ê derbasî mijara fonksiyona saziyên tebatî û ji aliyê teşeyê ve tebatî û pê re jî guherîna avaniyê bibînin.

2.2.1. Di Gerdûnî de Ji Aliyê Semantîk ve Fonksiyona Avaniya Tebatî

Lêkolînerên ku bi mijara avaniya tebatîyê mijûl dibin bala xwe danin pîrsa di saziya tebatî de fonksiyona têkiliya wateyê di nava hevoksaziyê de çî ye. Bi îfadeyekê din axêver gava pêdiviyeka wî bi gotareka din çêbû ew ê çawa saziya tebatî û hevokên wê ji saziyek kûr veguhezîne saziyek rûxsar. Saziyên tebatî bêtir bi zimanê xebirdanê yan bi zimanê nivîsê derdikeve hemberî me. Cihê bikaranîna esil ya saziyên tebatî zimanê nivîsê ye.²⁹

Di zimanê xebirdanê (zimanê devkî) de saziyên tebatî kêmîr têne pêrgî me. Ji ber vê yekê fonksiyona saziyên tebatî ji aliyê wateyê ve nivîsên ku tê bikaranîn bi kîjan armancê ve tê nivîsandin nîşanî me dide. Gava em li metnên ku saziyên tebatî tê de hene dinêrin; em dibînin ku saziyên tebatî di hin metnan de bêtir tê tercîh kirin.

Lîsteya cureyên van metnan li jêrê hatiyê rêzkirin:

1. Meqaleyên zanistî
2. Tezên zanistî
3. Pirtûkên pêşlegerîn û vekolîn ên zanistî
4. Qadên teknolojîk û metnên li ser teknolojîyê
5. Pirtûkên dersê
6. Dîwanên nûjen
7. Roman û çîrok³⁰

Meriv dikare lîsteya jorê bêtir dirêj bike; lê ji lîsteya jorîn jê tê fam kirin ku saziyên tebatî bêtir gelemperî di nivîsên zanistî û teknolojîyên de tê bikaranîn. Sedema vê yekê jî ev e ku ew kesên ku metnên zanistî pêk tînin xwe ji metnê razber

²⁹ Duru, *Türk Dilinde Edilgen Çatı*, r. 10.

³⁰ H.b.r, r. 11.

dikin û xwe ji metnê dûr dixin. Di saziyên tebatî de ji bo ku di metnên zanistî de naverokeke wateyî pêk bînin kirdeyê ji hevokê derdixin yan jî şixulandina kirdeyê di nava hevok û metnê de kêr bikin saziyên tebatî tê tercîh kirin. Ji ber ku metnên zanistî dikarin werin rexnekirin, şîrove kirin jî bikaranîna saziyên tebatî bêtir tê tercîh kirin.

2.2.2. Di Gerdûnî de Di Aliyê Tîprêzika Peyvê de Fonksiyona Avaniya Tebatî

Ji aliyê zimannasan tîprêzika peyvê, di sedsala bîst hezaran de pir li ser hatiye sekinandin. Di tîprêzika peyvê de peyv çawa li ser hev tên zêdekirin û bi vî avahiyê hevok çawa ava dibin li serê disekine. Tîprêzika peyvê li ser peyv çawa li gor mantik û rêzikê de tê girêdan li ser lêkolîner dike, di beşa tîprêzika peyvê de xebatkaran herî girîng Chomsky e. Avahiya tebatî guherandina avaniyê ye, di vî guherandina avaniyê de bingeha herî girîng di hevokê de li ser tîprêzika peyvê bilîzin û di hevokê de li ser hêmanan bilîzin hevokê nû derxin holê. Di tîprêzika peyvê de di hevokê de taybetiya krakteristîka herî girîng cihê kirdê û pêveber were guherandin wan qîmeta hêmanan gava ku were guherandin avaniya hevokê tê guherandin û derbasê avaniya tebatî dibe³¹

2.2.3. Di Gerdûnî de Di Aliyê Nêzikhatiya Teşeyî de Fonksiyona Avaniya Tebatî

Di nezikhatiya teşeyî de xebatê ku li ser avahiya tebatî hatine çêkirin, fonksiyona ragihana tebatiyê paşçav kirine. Hem di dema tebatiyê hevoka zimanê de û hem jî diyarkirina cureyên tebatî û regezên gerdûnî ve diyarkirana wan dijwar dibe.³²

Di nav xebatên ku li ser nêzikhatiya teşeyî de hatine çêkirin, herî xebata girîng “ *Nêzikhatiya Gerdûniya Rêzimanê ye (NGR)* ” bi kurtasî di Rêzimana Gerdûnî de hevokên tebatî bi kîjan pîvana tîpîk bi dest xistin ê diyar be. Teqez di nêzikhatiya rêzimana gerdûnî de endamên herî girîng Chomsky e.³³

Chomsky sala 1993 de tebatî yê di dobendekî “ *Kurama Kargerî û Giredanê* ” pêşkeşî me dike. Di vî teoriya Chomsky’de du teoriyên jêrîn hene, ev her du

³¹ Duru, *Türk Dilinde Edilgen Çatı*, r. 10.

³² Turgay Sebzecioğlu, *Türkçede Edilgenlik*, (Dokuz Eylül Üniv. Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yayınlanmamış Doktora Tezi, İzmir), 2008, r. 5.

³³ H.b.r, r. 6.

teoriyên Chomsky bi teoriyên ‘ ‘ *Rol û Rewşê* ê ‘ ‘ pêk tê. Ev her du teorî ji bo rêzikên analîza raveka hevokên tebatî gelek girîng in.

Li gor teoriya Rolê, her komnavek xwediyê rolekî be û bi tenê di her komnavekî de rolek tenikê çê dibe, ancax ji ber ku rolek were bar kirin pêwîste rêgezêkî jî heye ‘ ‘ *Rêgeza Vebeyandinê* ê ‘ ‘Li gor Rêgeza Vebeyandinê hevok, taybetiya xwe di ferhengê de (di peyvê) distîne ji ber vê peyvek ku rolek bistîne, hewceye agahiyên peyvê ye.³⁴

Bi kurtasî Chomsky (1993) bi tenê li ser tebatiyê astekî devtîprêzikî dinerêne. Fonksiyona hevok û bilêvkerinê mêze nake. Li gor Chomsky hevokê lebatî ji ber dagerekî hevokê tebatî, di be ku teoriya rewş û rolê di heman rêzika de were zêfanî kirin. Ji ber Chomsky, nêzikhatiyekî teşeyî jî heye. Pollard ve Sag (1987) navê teoriya wan ‘ *Rêzimana Koma Ser-Derketî* ‘ ye. (RKSD)

Di vê nêzikhatiyê de (RKSD) avahiyên dirêj tebatiyê pêş kişandinê, di endama kiryarê tebatî de endama duyem, cih diguhere

Mînak:

Lebatî:

a) *Solîn (1) nan (2) xwar.*

Tebatî:

b) *Nan (bi hêla Solîn) hatiye xwarin.*

(1.a) de kiryara *xwar-* , du endama kiryarê (Solîn (1)), (Nan) 2) heye.

(1.b) de li gor rêzika guherandinê de, di kiryara gêrguhezde endama (2) bûye endama yekemîn. Endama yekemîn jî(Solîn) bûye endama duyem. Kiryara kirde di kategoriya rex de bûye hêmana dawî.

2.2.3.1. Di Aliyê Nêzikhatiya Teşeyî de Teoriya Girêdana (RKSD)

Rêgeza A: Pêwîste ku ferman kirin, bi paşinartin ve hatibe girêdan.

Rêgeza B: Kes (şaxs) pêwîst e ku azad be.

Rêgeza C: Ê ku ne nav be, ev jî pêwîst e ku azad be.

³⁴ Sebzecioğlu, *Türkçede Edilgenlik*, r. 7.

Mannig û Sag (1997) bi vê teşeyê ev teorî ji bo zimanê Hînd-Ewropî (Îngilîzî) ehîl e. Lê belê ku em zimana hevberî bikin pîranî pêdiviya guherînera derdikeve holê. Di çend zimanan de, avahiya veguherandina komnavê nagirêde bi tenê bi kirdeyê ve tê sînor kirin. Veguherandin listeya endamê avahiyê de bi hêla hêmanê ve tê girêdan. Mannig and Sag rêzikan rave kiriye:³⁵

a) Kirde carîna di listeya avahiya endamê de hebûna yekemîn e.

b) Kirdeyên araste pêwîst e ku bi kirde ve were hinartin.

Kiryara Lebatî:

Avahiya Endam. (1,2..)

Naverok: (3)

Kiryara Tebatî

Avahiya Endam (2..... +)

Naverok: 3

Mînak:

Kiryara Lebatî:

a) Hivron (1) ji bo Bahoz pirtûk (2) kirî.

Naverok: Kirîna pirtûk

Kiryara Tebatî:

b) Ji Bahoz re pirtûk hat kirîn.

Naverok: Kirîna pirtûkê

Di pêşaniya jor de veguherandina arasteya kirde bi tenê muhtemala benda kirdeyê ye.

Li ser teşeya avaniya tebatî xebate ku hatine çê kirin yek jî ‘ Perlmutter û Pastal e. Perlmutter û Pastal taybetmendîya tebatîya gerdûnî diyar dîke li ser ‘ Tekiliya Rêzînanî ‘ li gor P.û P. diyarbûna taybetîya tebatîya gerdûnîyê bi hêla ‘ Rêz bûna Bêje,, Zanistina Teşeya Kiryar û Rewşê(ZTKR) ‘ kêmbûnê dibînin. Di aliyê rêzbûna bêjeyê ve kêmbûna sedema temel; ziman bi cuda bi cuda hatine rêzîkirin.³⁶

Mînak:

³⁵ Sebzecioğlu, *Türkçede Edilgenlik*, r. 13.

³⁶ H.b.r, r. 15.

	<i>Nav + Pêveber+ Nav</i>	<i>Nav+Nav+Pêveber</i>	<i>Nav+Nav+Pêveber</i>	
<i>Zimanê Îngilîzi</i>	<i>John was slepped Nav+Pêveber+N av</i>	–	–	
<i>Zimanê Tirkî</i>	–	<i>Kule (Askerler tarafından) yıkıldı Nav+Nav+Pêveber</i>	–	
<i>Zimanê Kurdî</i>	–	–	<i>Ehmet (bi hêla Hasan) hat kûştin Nav+nav+pêveber</i>	

Tablo:4 Ev tablo, di zimanan de pêveber di hevokê de çava tê rêz kirin şanî me dide.

- Di mînaka jor de, di zimanê Îngilîzî de rêzbûna hevokê nevezelokî ye. Li gor rêzika çê dibe.
 - Di zimanê Tirkî de û Kurdî de rêzbûna hevokê serbest e.
- Ango em dikarin vê encamê derxin holê;
- a) Çiqas em bêjin taybetmendiyekî tebatîya gerdûnê heye ev mînaka ku me jor de da nîşana me xelet derxist.
 - b) Çiqas em bêjin di her malbata zimande avaniya tebatî diguhere, em di vê xalê de jî şaş bibin mîna Zimanê Tirkî – Kurdî.
- Perlmeutter û Pascal di têkiliya rêzimanî de sê xalê gerdûnî pêşkeşî me dika:
1. Biresera hevoka lebatî di kirdeya xwedîgiravî ve ahengdar be.
 2. Di hevoka lebatî de, kirde ; ne bi kirdeya hevoka tebatî de û ne bi bireserê re ahengdar be.
 3. Bi piranî di hevoka gerguhêz de çê dibin³⁷.

Mînak:

Lebatî:

- a) *Leşkeran ji bo serkeftinê bircê xedimand.*

Tebatî:

³⁷ Sebzecioğlu, *Türkçede Edilgenlik*, r. 15.

b) *Birc (ji bo serkeftinê) hatiye xedimandin.*

Di rêzika (1a) mînaka lêbatî de bireser, di (1.b) de hatiya pozîsyona kirde yê.(2.b) di hevoka lebatî de kirde ne bi kirdeya xwedîgiraviya hevoka tebatî de û ne jî bireser re ahengdar dibe. di mînaka (a) de di hevoka lebatî de kirde (leşker) ne bi kirdeya (b) de û ne jî bireser re ahengdar e, di rêzika 3 de minaka ku me da jî gerguhêz in.

Perlmutter û Pascal (1977) rêzikê ku me jor de diyar kiribû ,

1. Biresera hevoka lebatî di kirdeya xwedîgiravî ve ahengdar be.
2. Di hevoka lebatî de, kirde ; ne bi kirdeya hevoka tebatî de û ne bi bireserê re ahengdar be. di jêr de bi du qedemekî xêz ve hatiye nîşandin.



Mînak:

Lebatî:

a) *Leşkeran ji bo serkeftinê bircê xedimand.*

Tebatî:

b) *Birc (ji bo serkeftinê) hatiye xedimandin*



Avahiya mînaka (a) de wek 4 tîra hatiye xuya. Di vê nexşê de du têkilî heye:

- a) Yekemîn ê ku endama derva xuya dibe leşker e (têkiliya 1). Ê ku pêvek e jî serkeftin e

- b) Duyemîn jî endama navî şanî me dide Birc e (t êkiliya 2). Hevoka lebatî bi guherandina teşeya tebatî çava tê xuya kirin, em ê bi nexşê bidin diyar kirin.

Di vê nexşê de tebeqeyek hatiye zêde kirin. Di vê nexşê de endama navî (t êkiliya 2) tebeqeyek pêşve çû ye û bû ye t êkiliya yekem. Di nexşeya jor de hevoka tebatî de di tebeqaya yekem Leşker ve di tebeqeya duyem de bê fonksiyonî ma ye.

Çend nêzikhatiyê teşeyê, bi armanca l ênêrina t êbatiyê bi kurtasî hat rave kirin. Wek ku me kurtasî ravek kir, bi taybetî avahiyên tebatî bi tenê teşe û devrêzbûnê we hat çareser kirin. Piştî ku em nêzikhatiya avaniyê tebatî dan em ê paşî nêzikhatiya (Fonksiyonî an jî Karganî) bidin bi vî awayî em ê cudaya nêzikhatiya teşeyê û fonksiyonî derxin holê.

2.2.4. Di Gerdûnî de Di Aliyê Nêzikhatiya Karganî de Avaniya Tebatî

Bi temela modela rêzimana karganî ve, xebatên li ser vê nêzikhatiyê hatiye çê kirin, bi çarçovî ve bi xebatê re ahengdar be. Çiqas em bêjin ev xebat di rêbaza hevdem re çê dibe. (Teoriya Dîk) ji bilî vê di vê beşê de li ser avaniya tebatiyên xebatên fonksiyonî jî ê diyar berhem ji bo rêzimana karganî bidin nasîn û hem jî teoriyekî çerçove amade be.³⁸

Di avaniya tebatî de hêmana ji bilî kirde bi taybetî bireser, gava ku hilkişe pozîsyona kirde yê, hevok dîsa jî ê gerguhêz be. li gor Gîvon: ‘Hevoka tebatî di taybetmendiya avahiya devtîprêzî de em dikarin çend rêzik pêşkeş bikin:

1. Di paşveçûnê de rewşa hiyeraşiyê wisa ye:

Kirde > Bireser >..... Pêveber.

Wek rêzika jor de tê xuya kirin di paşveçûnê de yekema rêzimanî *kirde* ye. Piştî *bireser* 'e û paşî jî hêmanên din in.

2. Hêmana nebandorkirî gava ku em bi pêşve bibin carekê di hiyeraşiyê de wek kirde ê xûya bibe. Di zimanê Hînd-Ewropî de zimanê Îngilîzî de pozîsyona kirde, piranî hevoka tebatiyên bêkesanî de çê dibin.

Mînak:

Ji hêla wan, di sîlekan de hat dîtin.

³⁸ Sebzecioğlu, *Türkçede Edilgenlik*, r. 20.

Nêzikhatiya fonksiyonî de xebatên herî girîng, Gîvon kirî ye. Gîvon, vê nêzikhatiyê bi hêla paşvekirin û nepaşvekirin ve diyar dike. Givon, taybetiyên paşvekirinê bi çend maddeya ravek dike:

1.) Xuyakirina tebatîya kirinê de wek e bi avahiyekî bijartî ye.

2.) Kodkirina tebatî, piranî di gerguhêz de çê dibe.

Taybetmendîya nepaşvekirina tebatî jî wek rêzikê ku me jêr de daye bi vê awayê xuya dibe:

A) Tebatîya Temel

B) Tebatîya Avahiya Kirdeya Bê

Mînak:

a) **Paşveçûna tebatîya temel:**

The body was found on the beach (by John)

Cesed (bi hêla John) di sîlekan de hat dîtîn

b) **Nepaşveçûna tebatîyên bêkesî:**

They found the body on the beach

Cesed di sîlekan de hat dîtîn.

Di mînaka jor hem li ser hevoka kiryarê de hatiye kod kirin û hem jî ê ku kirî ye di hevoka devtîprêzikê de tê xuya kirin. Di mînaka (b) de koma kiryarê de ê dike di aliyê devtîprêzikê de ne çûye paş bi tenê aliyê wateyê ve rolekî bêkesî hilgirtî ye.

Bi kurtasî Givon, di tebatîya temel de sê fonksiyon şanî me dide:

1. Ê kirinê (aktîf) , “ *Veşartin / Malaştin / Tepisandin* ” bi sê pêyvira pêk tê.

Ev bîwarên fonksiyonê em dikarin di Zimanê Kurdî de jî mînak bidin.

Mînak:

a) *Birc hat xemidandin. (bi hêla kî hatiye xedimandin ?)*

b) *Xanî hat ava kirin. (bi saya kî we hatiye ava kirin)*

c) *Pol hat paqij kirin. (bi hêla kê we hatiye paqij kirin ?) ne diyar e.*

Rêzika ku me jor de diyarkiribû, bîwara veşartinê diyarê me dike.

2. Ê ku ne kiriye (pasif) pêş ve bînin, ev fonksîyon di zimanê Kurdî de jî heye

Mînak:

- a) *Paqijkeran kolanan paqij kirin.*
- b) *Kolan (bi hêla paqijkeran) hat paqij kirin.*

Di mînaka jor de, di mînaka (a) yê de ê ku bandorî dibîne *kolan* e. Lê gava ku em hevokê veguherînin tebatî di (b) yê de ê ku dike (aktif) pêşve tê û dibe kirde.

Gava ku em li ser zimanan lêkolîner bikin em ê bibînin ku cureyên avaniya tebatî zêde ne, em nikarin gelemperî behsa avaniya tebatî bikin lê hinek lêkolîneran hinek giştîyan derxistine holê, mînak wek ku me jor de behsa Gîvon kir. Ji bilî Givon ,Keenan li ser taybetmendiya zimanên gerdûnî xebat kirine.³⁹

Mînak:

- a) *Mary slapped John*
(*Mary sîleyek li John xist*)
- b) *John was slapped*
(*John hat sîlekirin*)
- c) *John was slapped by Mary*
(*John (bi hêla Mary) hat sîlekirin*)

Li gor lêkolîneran Keenan, di mînakên jor de (a-b) tebatîyekî temel dibîne. Di mînaka (b) ‘ yê jî mînakên din cudatir dibîne û tebatîya temel di tebatîyên din ve cudahiyatiyê bi sê xalên girîng ve pêşkeşî me dike:

- 1) Di mînaka (c) ‘yê de ê kirin ango (by Mary) tune ye.
- 2) Hevokê tebatî ye.
- 3) Kiryara temel (Slap) bi tenê çalakiyeke ê kirin û bandorî digre ye.

Piştî van xalên girîng Keenan, du xalên giştîyanî derdixê holê:

- A) Di hinek zimanan de tebatî tune ye.

³⁹ Sebzecioğlu, *Türkçede Edilgenlik*, r. 23.

B) Eger di zimanekê xwedî de tebatî hebe ,wek mînaka jor de (b) bi tenê tebatîya temeले.⁴⁰

Keenan, di taybetmendiya zimanan de carîna avaniya lebatî wek avaniya tebatî ,wek avaniya tebatî hemnirx dibîne. Givon, vê taybetmendiye bi navekî ‘ *Tebatiya bêkes*’ kar tîne.

Mînak:

Lebatî

a) *Ew, xanî ava kir.*

Tebatî:

b) *Xanî hat ava kirin*

Di mînaka jor de (b) di hevokê de peyvira hemana pirjimariya sêyem ji ber ku ji komê û şexsê re nahirtîne wek hemnirxekê avahiya tebatîye tê xuya kirin. taybetmendiye tebatîya temel ku em bi avahiyekê giştî ravek bikin em ê kitekit bikin.⁴¹

a) *Eger di zimanekê de tebatî xwedî koma (obeka) ê kirinê be jî ev xwedî kirina (Aktîf) obekê vê rewşê carîna bê dil qebûl dike.*

Mînak:

Lebatî

a) *Leşkeran, paqîjiya bexçe kir.*

Tebatî:

b) *Bexçe, (bi hêla leşkeran) hat paqij kirin.*

Paqijkirina bexçe ne bi dilê leşkeran ve çê buye.

b). *Di zimanekî de avaniya tebatî bi tenê ne bi hêla hevokên gerguhêz de çê dibin di hinek zimanan de jî di hevokên negerguhêzî de jî çê dibin. Mînak di zimanê Tirkî de bi avahiyekî hevoka negerguhêz de jî çê dibe, lê di zimanê Kurdî de bi tenê di hevokên gerguhêz de çê dibin.*

Keenan, piştî ku qala giştîya gerdûnîya tebatî dike tebatîya bi avahiyekî devtîprêzî ve dixê du pola:

⁴⁰ Sebzecioğlu, *Türkçede Edilgenlik*, r. 24.

⁴¹ H.b.r, r. 24.

1. Tebatiyên Neyekser
2. Tebatiyên Zanista – Teşeyî ê Sext

2.2.4.1. Di Aliyê Nêzikhatiya Karganî de Avaniya Tebatiyên Neyekser

Bi kurtasî, bi saya kiryarên alîkarî ve çê dibin. Zimanê Îngilizî bi hêla alîkariya kiryanan ve çê dibin em dikarin zimanê Kurdî jî bixin nav vê polê. Keenan bi piranî ev rêzîkê di çend maddeya de bi rêz kiriye:⁴²

a) Di zimanê Îngilizî de tebatî bi hêla kiryara alîkariya (**-be**) çê nabe. zimanê Kurdî jî bi saya peyva (**-hat**) çê dibe.

Mînak:

a) *Ehmed was killed.*

b) *Ehmed hat – kuştin.*

b. Di avaniya tebatî de kiryarên alîkarî wek bi avahiyekî tevgerî tê xuya kirin. Di zimanê Hîndu de kiryara alîkarî (*gayee*) avaniya tebatî de peyvira kiryarê alîkarî digre .

Mînak:

a) *Murgî, marî gayee*

b) *Mirîşk, hat kûştin*

Wek mînaka jor de tê xuya kirin wateya peyvên van çiqas cuda be jî çend kiryarên alîkarî di nav pola ' *Neyeksera Tebatî* ' de tê bi karanin.

2.2.4.2. Di Aliyê Nêzikhatiya Karganî de Avaniya Tebatiyên Zanista – Teşeyî ê Sext

Di vê avaniya tebatî de tebatî bi saya pêvekîrî çê dibe mînaka herî xweş zimanê Tirkî ye bi tenê ev pê ve kirin di zimanê Erebbî û İbrânî de jî dertê pêşya me. Djurkovic, pênasiya avaniya tebatiyê wek mîna zimanê Îngilizî de avaniya tebatiyê de kirde bêgavî ye. Lê di zimanên din de (mnk; Hollandî Tirkî Almanî û Latînî) kirde nebêgavî ye. Ji ber ku kirde nebêgaviye an jî kirde yê bijêrîne, tebatiyên bingeh

⁴² Sebzecioğlu, *Türkçede Edilgenlik* r. 29.

wek tebatiyên bê kirde hesabandiyê. Ji ber vê yekê tiştên ku Keenan Givon, li ser avaniya tebatiyê gotine jî piranî tebatiyê Djurkoviç bişexsî ne.⁴³

Tebatiyên bişexsî, çiqas naveroka wateya zanistî tunebe jî ê kirinê (aktif) ê ku bandorî dibîne bi peyvira devtîprêzikê de bi cih digre. Djurkovic, ev pênasiyê ku li ser tebatî kiriye, avaniya lebatî bînîşan û avaniya tebatî jî binîşan dibîne. Bi kurtasi Djurkovic, wek zimanê Îngilizî de tebatiyên ku wek **“Prototip”** tê hesabandin. Bi rastî avaniya tebatî **“Avaniya Tebatîya Şexsî”** dibîne. Ev avahî, di zimanên din de cuda tê bi rêkûpêk kirin. Danberhevkirina di nêzikhatiya teşeyî de xebatên rêzimana fonksiyona hevdem di pênasiya avaniya tebatî de ê bes be. Sedema vê ya herî girîng nêzikhatiya fonksiyonî, diyardeya ziman bi avahiyekî taybetmendîya teşeyî ve bi nêzikhatiyekî berfireh ve tê nirxandin. Nêzikhatiya teşeyî wek diyardeyên zimanên din de jî di avaniya tebatî de bi tenê teqala devtîprêzikê de nêzik dibe ji bilî devtîprêzikê di pênasiya teqala zanista-wateyê jî ê gelek sûd bide me.⁴⁴

Cudahiya hevoka, di devtîprêzik û zanista- wateyê de têkiliya endamên hevokê de ê bi hêsanî xuya bibe.

Mînak:

Lebatî :

a) *Leşkeran, bircê xedimand.*

Tebatî:

b) *Birc, (bi hêla leşkeran) hat xedimandin.*

Di mînaka jor de bi tenê pênasiya teqala devtîprêzikê de kirde û bireser di hevoka lebatî û tebatî de kirde (leşker û birc) cudahiya van têrker nake. Ji ber ku her du kirde jî di pozîsyonekî alav dane. Di mînaka (a) ‘yê de birc, di pozîsyona bireserê de ye. Di mînaka (b) ‘yê de hilkişiyaye pozîsyona kirde yê. Ji ber ku pozîsyona kirde’yê nayê vala kirin. Em çiqas bêjin ev ravek pêvajoya devtîprêzikî bide ziman jî pevajoya tebatî bi kî ja sedemê derketiye holê şanî me nade.

Ji bo çî zimanê Kurdî û zimanên din hewcê hevokên tebatî dibin? An jî ji bo çê di mînaka jor de (a) ‘yê de ê ku kiryar kiriyê diyar ê ,lê di mînaka (b)’yê de

⁴³ Sebzecioğlu, *Türkçede Edilgenlik*, r. 30.

⁴⁴ H.b.r., r. 31.

hatiye jê birin. Mînaka peyva *Bircê* çima di hevoka lebatî de nahilkişe pozisyona kirde yê ?

Ev pirsên jorîn bi hêla nêzikhatiya fonksiyonî ve bi hêsanî tên diyar kirin. Li gor fikr û ramanên mina vekirina hevoka tebatî bi sedema ê ku wî/ wê karî dike dixwaze were veşartin, ji ber vê di rêzimana fonksiyonî de endamên teqala zanista wateyê ê ku dike (aktîf) girîng e ji ber ku girîng didin rolên zanista wateyê û ev rolên ku tê arestekirinê rolên zanista wateyê de encamên hevokê (*Kirde – Bireser*) di devtîprêzikê de cuda tê hesibandin û teqala bilîşsel de çawa tê kod kirin tê xuya. Di vê nîşaneyê de ji ber çê em jê dibin bi vî awayî ye tê xuya.

Yek girîngbûna teqala zanista wateyê jî ,temîn kirina pêwendiya teqala zanista-kirinê ye . Ji ber ku mirov, li ser hevok û peyvan pêwendiyek dihilberîne. Bi tenê gava ku em bi avahiyekî devtîprêzikî û zanista wateyî pênasina tebatî bikin ê ev pênase kêr bibîne ji ber vê gerek em bi teqala zanista-kirinê de jî lekolîner bikin. Gava ku bi çavekî zanista-kirinê de em li ser tebatî binerîn hemanek kirde an jî ê ku nake (Pasîf) dihilkişe pozisyona kirde an jî tê pozisyona mijar kirinê. Ancax mijarkirina zimanan bi tenê avahiya tebatî de çê nabe, bi tebatî re “ *pêşî kirin û paşî kirin* ” jî mijarkirinê çê dike.⁴⁵

Keenan, di tebatî de karê pêşî kirin û paşî kirinê dide berhev û ev mînaka jêr pêşkeşî me dike:

Mînak:

a) *Mary slapped John*

Mary çerband John an jî Mary , John sîle kir.

b) *John was slapped*

John hat sîle kirin.

c) *John was slapped by Mary*

*John (bi hêla Mary) hat sîle kirin.*⁴⁶

Di mînakên jor de, bi taybetî (b – c)’ yê de avahiyê pêşî kirinê bi fikrin û bidin berhev. John, di hevoka lebatî de ne mijar e di pêvajoya tebatî de hatiye mijar kirin.

Di mînaka jêr de hevoka (b) ‘yê de hevok bi aliyê çepê tê xijikandin û ev her du mînak jî bi navê pêşî kirin di zimanê cihanê de cih digre.

⁴⁵ Sebzecioğlu, *Türkçede Edilgenlik*, r. 31.

⁴⁶ H.b.r, r. 33.

Mînak:

a) *I like beans*

Ji fasuliyê hez dikim.

b) *Beans I like*

Ez ji fasuliyê hez dikim

Di zimanê Îngilizî de, di ev mînakên jor de ku rêyek em bistinîn tebatî , di aliyê fonksiyonî ve di wa hevoka de bi du şeklê cuda tê xuya kirin ; a yekemîn kirdeya lebatî ê were tunebû kirin , an jî ê were pozisyona alava-der ya duyemîn jî tebatî bi tenê di hevokê de di avahiya rûxar de tê xuya kirin bi vê metodê em ê dikaribin bi hêsanî bêjin ev hevok tebatî ye an jî ne tebatî ye .Mijarkirin û xijikandin di kiryarê de nayê diyar kirin di obeka kiryarê de tê kod kirin. Teşeya tebatî , kiryara tebatî dihilbirîne .⁴⁷

Lekolîneran Keenan, di encama va xebatan de tebatiyê di mijarkirinê de cûda dibîne û fonksiyonekî rêzimanî dibîne. Givon, di zimanan de tebatiyê bi avaniyekî berfireh bi armanca zanista-kirinê de hatiye bikaranîn. Givon, berya ku dîtina li ser avaniya tebatî bisekne pêşî danê metnên berdewamiya mijarê û mayindena mijarê bi saya pîvana “ *Mayîndena Mijar (M-M) û Hinartina Dûringê (H-D)* çareser dike. Pîvana dûrînga hinartinê, hinartek berdewama mijarê di pozîsyona berî pêşdetir de. hevok li gor kodekî rêzimanî ve tê nirxandin bi vî awayî valahî bi rexê çepê ve bi hejmarên hevokê ve tê diyar kirin. Nirxa herî piçûk hevoka yekemîn e , ev pîvan belleka –kut an jî bi dosya kirin ve bi hêla derûnasî ve valahî , hetta bêdawî diçe.⁴⁸

Givon, (1983) de di xebata xwe de vê nirxê di nav bîst hevoka de diyar dike. i ber vê nirxa ku di rexê çepê de tespît dike û ê ku vê nirxê jî derbas dike bi navekî “ *Mijara – Bêdawî* ” lê dike.Piştî ku me pênasiya (M, M) û (H, D) kir ê dî em dikarin pênasiya ku Gîvon li ser ‘ *Mijarkirin û Mijara-Berdewamî* ’ bikin. Givon di avaniya lebatî de ê dike (*Kirin , Aktîf*) di cih girtina rêzimanî de hêmana herî girîng e.⁴⁹

Lebatî:

⁴⁷ Sebzecioğlu, *Türkçede Edilgenlik* , 36.

⁴⁸ H.b.r, r. 36.

⁴⁹ H.b.r, r. 36.

<i>Ê dike an jî ê Aktif</i>	<i>Ê kêrdar bûn</i>	<i>Ê bandorî dibîne</i>	<i>Ê din</i>
-----------------------------	---------------------	-------------------------	--------------

Tablo: 5 Ev tablo, di lêkera lêbatî de rêzika hemana hiyerşiya hevokê çava tê nîşan şanî me dide.

Di tebatî de ê ku ne aktîf e (ê ku nake) di hevokê de pozisyona herî bilind e û pozisyona kirde digre. Di hiyerşiya tebatî de jî aynî berdewam dike.

Tebatî:

<i>Ê kêrdar bûn</i>	<i>Ê bandorî dibîne</i>	<i>Ê din</i>
---------------------	-------------------------	--------------

Tablo: 6 Ev tablo, di lêkera tebatî de rêzika hemana hiyerşiya hevokê çava tê nîşan şanî me dide.

Givon, gava ku taybetmendiya zanista-kirinê dike avaniyên tebatî û lebatî di metnan de, belavkirina fonksiyonê jî bal dikşîne.

Li gor vebîniyên Gîvon; di hevoka lebatî û tebatî de belavbûna –fonksiyonî bi gurahî cuda ne, ev cudabûn hinek encamên zanista-kirinê derxe holê , Givon tebatîyan di metnên zanistinê de zêde gurahî dibîne , bi gelemperî ku em bifikrin avaniyên tebatî li gor avaniyên lêbatî kêmtir karanîn sedema vê jî, ji ber ku normên mirovên gerdûnî û çandî bi hev re paraleltî dibîne ango zêde karanîbûna avaniya lebatî biyolojîk û bilişsela mirovatiya gerdûnî dertê holê .⁵⁰

Li gor Givon; normên gerdûnî wek ku me jêr de şanî da ye mîna hiyerşiya mijarê ve paraleltî ye.

<i>Ê dike anjî ê aktîf</i>	<i>Ê kêrdar bûn</i>	<i>Ê bandorî dibîne</i>	<i>Ê din</i>
----------------------------	---------------------	-------------------------	--------------

Tablo:7 Ev tablo, Li gor Gîvon hiyerşiya mijarê di hevokê de çava tê nîşan kirin şanî me dide.

Ku em ev nîşaneyên jor de şîrove bikin; bi piranî ziman (mirov) ê dike daha zêde mijartin dikin û vê mijartinê girîng dibîne.

Mînak:

⁵⁰ Sebzecioğlu, *Türkçe'de Edilgenlik*, r. 37.

Lebatî:

a) *Leşkeran, birc'ê xedimand.*

Tebatî:

b) *Birc, (bi hêla leşkeran) hat xedimandin.*

Di mînaka jor de, di avaniya lebatî de (a) 'yê mijartin (li ser mirovê) hatiyê çê kirin lê gava ku em tên li ser avaniya tebatî bi hêla kêrdar bûnê em ê ku ne mirove (birc) mijarte dikin.

Xebatên ku li ser fonksiyona zanistina-kirina tebatî de hatiyê çê kirin yek jî lêkolînervan 'Myhill' e. Myhill di xebata ' *Voice Alternations* ' (Guherandina Avaniya) de li hemberê lêbatiyê, tebatî û li hemberî hevfonksiyonî jî fonksiyona zanista-kirinê dijtebatî mêze dike.⁵¹

Myhill guherandina avaniyê kiryarên aynî, hêmanên heyina aynî bi du an zêdetir de cuda tê xuya.

Mînak:

Lebatî:

a) *Joe wrote that book*

Joe wê pirtûkê nivîsand.

Tebatî:

b) *That book was written by Joe*

Ev pirtûk (bi hêla Joe) hat nivîsand

Mercên rastî, di hevokê de wekhev in ancax di fonksiyona bilêvkirina qozî de teqez bi hev re nayê guherandin. Bi kurtasî Myhill, bijartina lebatî û tebatî ê dîke (A) di nav bandoriyekî de dibîne û mijartinê (A) di nav bandoriyekî de dibîne. Givon wek Myhill, (A) yan di avaniyên tebatî de mijartinekî piçûk dibîne û wisa

⁵¹ Sebzecioğlu, *Türkçede Edilgenlik*, r. 39.

berdewam dike bi piranî gava ku em avahiya tebatî mêze dikin (A) bi aşkerî nayê xuya, hetta nayê zanîn û pir ne girîng e .⁵²

Myhill, mînaka pêvajoya bê mijartinkirinê wisa dide:

Mînak:

The windows was broken

Cam hat şikandin

Di mînaka jor de di hevoka tebatî de ê dike ango (A) hatiye jê birin an jî negirîngî buye mijar pozisyona xwe hunda dike û tê nemijartin kirin di vê hevokê de ya herî girîng cam e û hatibe şikandin.

Myhill, di hinek zimanen de di tebatî de (A) tune ye û hinek zimanan de jî bi avahiyekî di zimanên din de zêdetir dibîne.

Mînak:

a.) Bexçe hat paqij kirin

b.) Nan hat xwarin

Myhill, di avaniya tebatî de çiqas aşkere (A) hebe jî vê A yê mijarteyekî piçûk dibîne. Avaniya tebatîyê di mijartina D (ê ku bandorî dibîne zêdetir dibîne Myhill, tespît kirina Keenan, *Kirdeyên Prototîp* de di aliyê mijartinkirinê de zêde dibîne. bi vî awayî de tebatî avaniya kirde de ê ku mijara van nezêde ye bi dirêxbûnekî stratejîkî bilêvkirin dibîne. Myhill, wa mînaka pêşkeşî me dike:⁵³

Mînak:

Joe was in the hospital because he had been hit by a car

a) *John di nexweşxanê ye , bi hêla wesayetek ve hat çelaxwarî.*

b) *John di nexweşxanê ye ji ber ku wesayetek lê xir.*

Di mînaka jor de di hevoka duyemîn de (A wesayet) e ne însan e û ne diyare û mijara vî jî kême. (D) ê ku bandorî dibîne însan e û diyare mijara vî jî zêde ye. Bi kurtasî teqala zanista-kirinê, avaniya tebatîyê bi tenê bi hevokekê re sinor kirina di teqala devtîprêzikê û zanista- wateyê de daha ber fireh dibîne ango ya gotinê an jî metnê lê zêde dike û bîwarekî nû derdixe holê bi vî awayî ye tiştên tîn gotin bi

⁵²Sebzecioğlu, *Türkçede Edilgenlik* ,r. 39.

⁵³H.b.r. ,r. 39.

sedema xizmet tê xuya kirin , ji bilî vê di teqala zanista-kirinê de di kî ja cureyên bilêvkirinê de hem ji bo gotarbêjan û hem jî ji bo guhdervanan de jî gelek girîng e .⁵⁴

Di vê beşê de xebatên ku li ser avaniya tebatî de (bi avahiya teşeyî, fonksiyonî û zanista-kirinê hat ravek kirin bi kurtasî, di vê xebatê de gava ku me avaniya tebatîyê diyar kir xalên ku hatin paşçavkirin û tiştên ku bi serkeftî derketiye holê jî me da ber çav. Bi kurtasî wek yeke zimanên din jî di avaniya tebatî de nêzikhatiyên teşeyî, fonksiyonî û zanista-kirinê bi çarçoveyekî demazirakî û bi çareserkirinekî tevahî ve derketiye holê ⁵⁵

2.3. Di Gerdûnê de Guherandina Avaniya Tebatî

Erkman-Akerson, di mijara guherandina avaniya de bi van pirsên nêzik dibe; di rêzimanê de kiryar, avaniyê bi saya pêvekên cuda teşeyê diguherîne.

1. Ji bo çî em avaniya diguherînin?
2. Armanca guherandina avaniyê çî ye?
3. Gava avaniyê diguherînin em nirxê didin hemanan an fonksiyona hemanan diguherînin?

Di zimanê me de çar hêman hene

1. Pêveber
2. Kirde
3. Bireser
4. Hoker

Di hevokê de rêzbûna hemanê ku em biguherînin em dikarin axaftinê li gor armanca bal kişandinê û girînga rêzbûnê biguherînin, lê di her ziman de du hêmanên bingeh hene; *kirde* û *pêveber* e. Ji ber vê li ser guherandina kirdê û pêveberê , axaftin li gor armancê bi avahiyekî fonksiyonî ê bi hêsanî were guherandin.⁵⁶

Erkman –Akerson li ser wê mijarê bi awahiyekê zanistî nêzik dibe û wisa dibêje : Di nav hevokê de her heman hem bi fonksiyonî û hem jî bi armanca axaftinê di nav hevokê de xwedî nirxe ye, nirxa hêmanê bi armancekî fonksiyonî we di navbera hemanan de tê biguhestîn û xijikirin.

Di zimanan bi giştî de bi du rêya we çê dibe:

⁵⁴ Sebzecioğlu, *Türkçede Edilgenlik* ,r. 41.

⁵⁶ Duru, *Türk Dilinde Edilgen Çatı* , r. 13.

1. Guherandina avaniyê
2. Guherandina rêzbûna hemanê

Mînak

Pêpelûka 1.

a) Solîn nan xwar.

Xwar: *Pêveber, Avaniya lebatî , (Girînga hemana yekemîn e)*

Solîn: *Kirde , (Girînga hemana duyemîn e)*

Nan : *Bireser e , (Girînga hemana sêyemin e)*

Di hevoka jor de bireser çiqas nêzî pêveberê be jî di vê hevokê de kirde bi girîngiya rêzbûnê de berya bireserê hatiye .

Pêpelûka 2.

b) Hineka nan xwar.

Xwar : *Avaniya lebatî , (Girînga hemana yekemîn e)*

Hineka: *Kirde (Girînga hemana duyemîn e)*

Nan : *Bireser e , (Girînga hemana sêyemin e)*

Di mînaka hevoka jor de kirde çiqas girînga duyemîn de be jî girînbûna wî ya rêzê hinekê kêmbûye. Ji ber ku di vê hevokê de ê ku nan xwariyê di aliyê zanistê we pir ne girîng e, ‘‘ hineka ‘‘ nan xwariye û ev hinek ê di pir ne girîng e , rêzbûna girîngê û vurgu hêdî hêdî tê li ser bireserê , ê di di vê hevokê de nan bi saya kî we hatiye xwarin ne girîng e ya herî girîng nan hatiye xwarin.

Pêpelûka 3.

c) Nan xwarin

Xwar: *Avaniya lebatî , (Girînga hemana yekemîn e)*

Nan: *Bireser e , (Girînga hemana sêyemin e)*

Wan: *Kirdeya veşartî*

Di vê mînaka jor de kirde, hem bi aliyê wate yê û hem jî ji aliyê gramatîkal ve girîngbûna xwe wenda dike, bi tenê di dawiya hevokê de li ser pêveberê pêveka pirjimariyê hatiye ser (*-in*) ji ber wê pirjimariyekê bêdiyar li ser kirdeyê tê hinartin bi vê şiklê ê ku nan xwariyê ji bo gotarbêja ne balkeş e û ne girîng e .

Pêpelûka 4.

d) Nan, hat xwarin .

Hat xwarin: *Avaniya lebatî , (Girînga hemana yekemîn e)*

Nan: *Kirdeya xwedîgiravî (Girînga hemana duyemîn e)*

Di wê hevoka dawî de, bi guherandina avaniyê re avahiya rêziman hat guherandin , ê dî nan di pozisyona bireserê we hilkişiya ye pozîsyona kirdeyê. Nan , di aliyê rêzimanê de kirde ye lê kiryar jî hêla hinekan we hatiye çê kirin , ji ber wê ji aliyê zanistina zimên de em dikarin wê şîrovê bikin ; kiryarê ku pêk nehatibe jî , sîr ji ber ku girîngbûn dibîne hinek hêman ji aliyê rêzimanê we hilkişin kirdeyê û hinek hêman jî dikarin werin jê birin wek tê xuya kirin, ji avaniya lebatî derbasê avaniya tebatîyê karê guherandina avaniyê ye mînaka jor de di pêpelûka yekemîn de bireser, di pêpelûka çaremîn de hatiye pozîsyona kirde yê.

Di hevokê de hêmanên girîng hene ev jî di hevokê de xala balkeşî ye ,xala balkeşî şanî me dide ku em çawa mêze dikin û şîrove dikin. Armanc ev e ku nirxandina ku em didin hevokê nîşan bidin.

Di gotinekê de an jî metnekê de ne ê ku kiryarê pêk tîne ê ku pêk tîne ku em derxin holê . Avaniya tebatî bi devtîprêzikî bi aliyê fonksiyonî wê dertê peşya me ango di hevokê de ku em buyer an jî kiryar pêş bixwin em ê mecbûr bibin ku avaniya tebatî kar bînin.

2.4.Di Zimanê Ingilîzî de Avaniyan Tebatî:

Di zimanê Ingilîzî de ku em lêkerên lebatî (active) veguherînin tebatî (passive) yê dibe ku ev lêker gerguhêz be , ango dibe bersiva *kî / çî* bide , em hinekê berfireh bikin ; *open- vekin ,close-asê bikin, give-bidin, buy-bikrin, invite – vexwendin ..* wek wan mînaka gerek bireser bistîne ev nîşe di zimanê Kurdî de jî heye.

Di zimanê Ingilîzî de, *happen- çêbûn ,come- hatin , go – çûnin, seem – xuya kirin, cry- girîn* di wan mînakan de eger ku hevok bireser nestîne , tebatî nikare were çêkirin ango di zimanê Ingilîzî de hevok bireser we tê destpêkirin û li gor dema tê kişandin.

Mînak

A) Avaniya Lebatî (Active Sentence):

Jack washes the car every Saturday

Jack, her roja şemî ye maşina xwe dişo.

B) Avaniya Tebatî (Passive Sentence) :

The car is washed by Jack every Saturday.

Maşin her roja Şemî yê bi hêla Jack tê şuştin.

Di mînaka jor de, bi taybetî di hevoka lebatî de jiber ku bireser heye bi hêsanî em dikarin veguherînin tebatî ye. Di zimanê Ingilîzî de kiryar eger ku ji aliye *kî / kê* we hatibe çêkirin bi şeklê ‘ ‘ *by + kirde* ‘ ‘ tê dawî ye . wateya *by* ji hêla bi saya ... (whd)⁵⁷ ne

Mînak

Lêkerên Lêbatî (Active Sentence) :

An accident happens at this crossroads nearly ever day.

Di vê xaçerê de hema hema her roj qeza çêdibe.

Di mînaka jor de jiber ku bireser tuneye em vê hevokê nikarin veguherînin avaniya tebatî ye.

Lêkerên Gerguhêz (Transitive Verbs)	Wate (Meaning)	Lêkerên Negerguhêz (Intransitive Verbs)	Wate (Meaning)
Give	Dan	Go	Çûn
Play	Listîn	Happen	Bûn
Refuse	Red kirin	Ocur	Pêk hatin
Show	Şanî dan	Die	Mirin
Read	Xwendin	Depend	Bawerî
Send	Şandin	Swim	Avjêni kirin
Write	Nivîsandin	Wait	Seknandin

⁵⁷ <http://www.ekremuzbay.com/gramer/passive-voice.html>, (Erişim: 15.11.2018).

Buy	Kirin	Exist	Hebûn
-----	-------	-------	-------

Tablo: 8 Ev tablo, Zimanê Kurdî û Ingilîsî de avaniya tebatî carîna ku bireser bistîne jî tebatî nayê karanîn.

Di zimanê Îngilîzî de hinek lêkerên rewşê (stative verbs) carîna çiqas bireser bistînin jî avaniya têbatiye naye karanîn , lê hînek minakê awarte jî hene.

Mînak

Have – bûn xwedî

Resemble – dişibandin

Suît – guncan bûn.

2.4.1. Di Zimanê Îngilîzî de di Avaniya Tebatî de Sazkirina Hevokê

Di Zimanê Ingilîzî de di hevokan de bireser tê serî û hevok li gor karanîna demê bi alikariya lêkera “ *to be* ” bi formekî guncan û bi lêkera mader “ *past participle* ” bi lêkera halê seyemîn ve tê çêkirin.

Past participle halê lêkera seyemîn e. lêker li gor dema gava ku tê kişandin rêkûpêk (regular) û nerêkûpêk (irregular) di dikevin du beşa. Dawiya lêkerên rêkûpêk (*-d, -ed, -ied*) pêveka guncan tê çêkirin lê lêkerên nerêkûpêk de rêzikekê wisa tune ye hevok li gor taybetmendiya xwe xweser e .⁵⁸

2.4.2. Di Zimanê Ingilîzî de li gor Dema Kişandina Avaniyên Tebatî

2.4.2.1. Dema Niha (Present Progressive)

Mînak:

Lêkerên Lebatî (Active)

He is wasing the car.

Ew maşîne dişo.

Lêkerên Tebatî (Passive)

The car is being washed by him.

⁵⁸ Nesibe Sevgi Öndeş, *ELS-English Language Studies English Grammar Inside Out - (The Part of The Passive)*,

Maşin ji hêla wî hat şuştin.

2.4.2.2. Dema Fireh (Simple Present)

Mînak

Lêkerên Lebatî (Active)

I pay the bill every month.

Ez her meh faturayê razînim.

Lêkerên Tebatî (Passive)

The car is being washed by him

Fature her meh ji hêla min tê razandin.

2.4.2.3. Dema Borî (Simple Past)

Mînak:

Lêkerên Lebatî (Active)

Einstein developed the theory of relativity.

Einstein teoriya îzafetê bi pêşve bir.

Lêkerên Tebatî (Passive)

The theory of relativity was developed by Einstein.

Teoriya îzafetê bi hêla Einstein bi peşve çû.

2.4.2.4. Dema Bê (Future Tense)

Mînak:

Lêkerên Lebatî (Active)

They will buy the house next year.

Ev sala bê ê xaniyek bistînin.

Lêkerên Tebatî (Passive)

Their house will be bought next year

Xanî bi sala bê, ê bê standin.⁵⁹



⁵⁹ Nesibe Sevgi Öndeş, ELS-English Language Studies English Grammar Inside Out - (The Part of The Passive)

BEŞA SÊYEM

3. Di Zimanê Kurdî de Avani û Avaniya Tebatî.

3.1. Di Zimanê Kurdî de Avani:

Avani, ev kategoriya ye ku avasaziya lêkeran nîşan dide. Ji avaniyê tê zanin ku lêker tîkuz e , yan jî kême . Heke lêker tîkuz be, bûyer li kirde vedigere , heke kême be , li tiştêkî / kesêkî din vedigere .bi vî awayî tê zanin ka lêker gerguhêz e , yan ne gerguhêz e. Her wiha ji avaniyê te fehm kirin ka biker wekî kirde di hevokê de berbiçav e , yan jî biker nuxamtin , li şûna bikerê qewam anku bireser derketiye pêş . bi vî awayî jî lebatî û tebatîya lêkerê diyar dibe.Ji bilî van her du rewşan , avani wî tiştî jî diyar dibe ka kirde kar bi xwe dibe yan bi yekî /e din dide kirin.

Her wekî ji pênasikirina li jorê jî tê fehmkirin , di zaraveya kurmancî de ji aliyê avaniyê ve lêker dibin sê bir: “*Gerguhêz / negerguhêz*” , “*lebatî / tebatî û dançêker*” .di avaniyê de mijara gerguhêz û negerguhêz pir girîng e , ji ber ku di zimanê Kurdî de avaniya tebatî bi tenê di hevokên gerguhêz de çê dibin.⁶⁰

Avaniya lêkeran li gorî kirde û bireserê tê diyarkirin. Di lêkerên lebatî de kirde diyar e di lêkerên tebatî de kirde ne diyar e .Li gorî bireserê jî lêkerên gerguhêz û negerguhêz û dançêker derdikevin holê. Lêker li gorî avaniya xwe di bin du beş:⁶¹

1.Li gorî bireserê avani ev jî di nav xwe de dibin sê beş : *Gerguhêz negerguhêz û dançêker* . Me di beşa yekem de bi sereka lêkerê de me kurtasî qala wan kiribû.

2. Li gorî kirdeyê ve avani di nav xwe de dibin du beş: Tebatî û lebatî.

3.2. Di Zimanê Kurdî de Pênasiyên Avaniya Tebatî

Lêkerên ku kirdeya wan a bera ne diyar be ji wan re tê gotin lêkerên tebatî. An jî, ji ber çalakiya ku tê kirin eger bandor li kirdeyê bibe ji van çeşîdên lêkeran re lêkerên tebatî tê gotin. Di lêkerên tebatî de kar ji aliyê kê ve tê kirin ne diyar e .Ev rewş bi alîkariya lêkera “*hatin*” ê çê dibe. Lêkera bingehîn tevî raderê tê bikarabîn. Qertafên demê û cinavkên kesîn tîkuz ser “*hatin*” e.⁶²Lêkerên tebatî de kirde ne diyar e gava ku em li bireserê pirs bipirsîn û bersiv hilnegrin ev lêker tebatî ye.

⁶⁰ Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 318.

⁶¹ Baran, *Rêzimana Kurmancî*, r. 185.

⁶² H.b.r, r. 185.

Li gor zimannas mamoste Samî Tan , di hevokên tebatî de ‘‘bireser’’ pêş e . Di hevokan de tiştê ku tê çêkirin na , ê ku bandorî dibîne pêş dikeve. Di avaniya tebatî de ji bo diyarkirina kes û dem û raweyê lêkera alîkar ‘‘hatin’’ tê kişandin. Lêkera bingehîn a hevokê di forma raderî de dimîne.

Li gor zimannas, Prof. Kadrî Yıldırım, di hevokê de kirde bi aliyê çar sedema nayê diyarkirin :

a: Kirde ne diyar e . (*Bavê Zozanê hatiye kuştin.*)

b: Bi piranî giştî kirde nasdikin û kirde diyar e . (*Cihan hatiye afirandin*)

c: Ji kirdeyê ditirsin : (*Pirtûka min hatiye dizîn*)

d: Ji bo kirdê tê tirsin: (*Pirtûka qedexe tê xwendin*)

Ji bilî ev çar xalên ku me diyar kiribû bi sedema ‘‘ji hêla , ji aliyê ,’’ ku em kirde diyarbikin ji aliyê retorîk we ne guncan e. ⁶³

Mînak:

- Zozan pirtûk dixwîne. (*ji aliyê retorîk we guncan e*)
- Pirtûk tê xwendin . (*ji aliyê retorîk we guncan e*)
- Pirtûk ji aliyê Zozanê ve tên xwendin. (*ji aliyê retorîk we ne guncan e*)

Lêkerên tebatî , di hevokê de peyvekê alîkarî bikarbîne ango tumleç ‘‘bi hêla ji aliyê bi destê’’ whd din nav hevokê de daçek û lêkerê biwejt dixe. ⁶⁴

Mînak:

Soro, ji ber hikûmetê hatiye hesip kirin.

Bi piranî , taybeti di zimanê niha de gava ku me erenî an jî nêrenî karbînin , wateya derfetî û bêderfetî dixe hole.

Mînak:

- Xani **hate** hilweşandin
- Dibistan **hatîye** avakirin
- Goşt **tê** sorkirin
- Mal **hatibû** xemilandin
- Mizgeft **hat** şûştin
- Pirtûk **dê bê** xwendin
- Pol **hatiyê** paqijkirin

⁶³ Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbigisi* , r. 105.

⁶⁴ Emir Djeladet Bedirhan, et Roger Lescot,(Grammaire Kurde)Institut Kurde de Paris Dépôt Légal, Avril 2001, r. 198.

- Sol **tê** paqijkirin.
- Ehmed **hatiye** kûştin
- Ezmûn **hatiyê** çê kirin

Nîşe: Ji bilî vê taybetiyê jî her wekî me di destpêkê de jî diyar kiribû ,lêkerên negerguhêz çênabe, bi tenê tebatiya lêkerên gerguhêz çêdibe. Ji ber ku lêkerên bêyî bireser nikarin bibin tebatî , lewre di vê avaniyê de rista biresaran li pêş e . Tiştê ku tê serê yekî yan tiştêkî , derdikeve pêş. Dema ku mirov dibêje “ *Dar hate avdan*” tiştê ku tê sere darê girîng e û dar jî bireser e. Lewre mirov nikare bibêje , “ *Çûk hate firîn*” “divê mirov pêşî lekerê bike gerguhêz , piştê bike tebatî. Awayê gerguhêz ê “*firîn*” ê “*firandin*” e ⁶⁵

Gava ku em bi aliyê nêzikhatiyê kirde û bireserê mêze bikin , di avaniya tebatî de , kirde di bin bandora pêveberê dibîne. ne ku kirdeya ku tèn xuyakirin kirdeya ku tê xuyakirin e. Ji ber vê di avaniya tebatî de , kirdeya ku nayê xuyakirin, pêvebera ku di nav bandorekî ve tê pênasandin û bi saya vê pênasandin û bi saya vê pênasiyê kirde “ *ne kirdeya xwedîgiravî ye* ”. ⁶⁶

3.2.1. Danberhevkirina Ereniya û Neyîniya Avaniya Tebatî

Di serî de me behsa ereniya tebatî çava tê ava kirin got. Ereniya lêkera têbatî ji lêkera “ **hatin û tê**” ê diyar dibe. Neyîniya tebatî jî , tê ser lêkera “ **hatin**” ê , ango bi saya qertafên “ **ne-**” û “ **na-**” werdigire.

3.2.1.1. Danberhevkirina Mînakên Erenî

- Xanî **hat** şûştin
- Rojname **hate** xwendin
- Ew ê **bên** birin
- Zebeş **dihat** jimartin.
- Stran **dihat** gotin.
- Çêlek **hatiye** mezinkirin
- Keda wan **tê** dizîn.
- Name **hatin** nivîsandin

⁶⁵ Tan, *Rêzimana Kurmancî*, Enstîtuya, r. 320.

⁶⁶ Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri*, Şekil Bilgisi , Türk Dil Kurumu Yayınları , Ankara , 2007, r. 548.

- Dep **hatibû** xêz kirin
- Agir **hat** tefandin.
- Mesut **hat** qutandin.
- Pace **hat** şikandin
- Piyar **hatiye** paqijkirin
- Pêlava min **hatiye** dizîkirin
- Nan **hatiye** amadekirin
- Gog **hatiye** teqandin
- Kevoka min **hatiye** birîndarkirin
- Karê min **hatibû** ditîn.
- Bazar **hat** qedandin.
- Baxçê min **hat** kolandin
- Derî **tê** asêkirin
- Ezmûn **tên** xwendin
- Ew **tên** birin
- Nan **hat** pejirandin
- Erd **hatiye** cotkirin

3.2.1.2. Danberhevkirina Mînakên Neyînî

- Xanî **nehat** şuştin
- Rojname **nehate** xwendin
- Ew ê **neyên** birin
- Zebeş **nahatin** jimartin.
- Stran **nehat** gotin.
- Çêlek **nehat** mezinkirin
- Keda wan **nehat** dizîn.
- Name **nehat** nivîsandin
- Dep **nehatibû** xêz kirin
- Agir **nehat** tefandin.
- Mesut **nehat** qutandin.

- Pace **nehat** şikandin
- Piyan **nehatiye** paqijkirin
- Pêlava min **nehat** dizîkirin
- Nan **nehatiye** amadekirin
- Gog **nehatiye** teqandin
- Kevoka min **nehatiye** birîndarkirin
- Karê min **nehatibû** ditîn.
- Bazar **nehat** qedandin.
- Baxçê min **nehat** kolandin
- Derî **nayê** asêkirin
- Ezmûn **nayê** xwendin
- Nan **nehat** pejirandin
- Erd **nehatiye** cotkirin

3.3. Di Zimanê Kurdî de Karanîna Avaniya Tebatî:

1) Eger ku ê ku kiryar çêkiriye nediyar be , ne girîng be an jî ne kifş be avaniya tebatî tê karanîn.

Mînak:

Pembû, li Çukurovayê tê gihîştin.

Zêr, li wir tê tamîr kirin.

Gog, li kolanan nayê listin.

2.) Karê ku girîng be , avaniya tebatî tê karanîn

Mînak:

Taşê , seat 10' de tê servîs kirin

3) Eger ku îfadeyekê rêsmî bê karanîn avaniya tebatî tê karanîn.

Mînak:

Rapor, duh ji serekeyê giştî re hat şandin.

4.) Eger ku kiryarê ji şexsî derxe û giştîyanî bikeve avaniya tebatî tê karanîn.

Mînak:

Cixare nayê kişandin

5.) Eger ku kirde were kirpandin avaniya tebatî tê karanîn.

Mînak:

Pîramît ,(bi saya Misiriyana) hatiye ava kirin.

6.) Di rojname kovar û makaleyan de bi piranî nûçeyên zanistî an jî gava ku bixwazin awayekî objektîfî fikr û ramanên xwe binivîsinin avaniya tebatî kartînin.

Mînak:

Îhracat, tê gotin kî isal zehftir zêde be.

7.) Carînan kîpa fermanê nayê karanîn lê peyama fermanê tê xuya kirin di bûyerên wisa de avaniya tebatî tê karanîn.

Mînak:

Di ezmûnê de di çarîka dawî de nayê derketin..

8.) Di hevokê de ê ku kiryar dike negirîng e , ê giring fonksiyona taybetiya kiryarê ye di rewşên wisa de avaniya tebatî tê karanîn

Mînak:

Xanî li gor dilê min hatiye paqîjkirin

9.) Kirde ne diyar be avaniya tebatî tê karanîn

Mînak:

Bavê Zozanê hatiye kuştin.

10.) Bi piranî giştî kirde nasdikin û kirde diyar e di rewşên wisa de avaniya tebatî tê karanîn.

Mînak:

Cîhan hatiye afirandin

11.) Ji kirdeyê ditirsin ji ber wê naxwazin bidin ziman ku kiryar çî ye di bûyerên wisa de avaniya tebatî tê karanîn.

Mînak:

Pirtûka min hatiye dizîn

12.) Ji bo kirdê tê tirsin jiber wê kirde nayê gotin di rewşê wisa de avaniya tebatî tê karanîn.⁶⁷

Mînak:

Pirtûka qedexe tê xwendin

⁶⁷ Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi*, (Kurmancî Lehçesi), r.105.

13.) Avaniya tebatî , carînan bêkesî dixê holê⁶⁸

Mînak:

Hate seh kirin ko.....

Nîşe: Piranî ev mînakên ku me di jor de diyarkiribû , Facebookê de, di koma Tûrkçe zûmresî de pîrsa ‘ ‘ ji ber çê mirov hewcê dibîne ku avaniya tebatî karbîne ‘ ‘ li gor wan pîrsan, bersiv, min daberhev û wisa diyar kir.

3.4. Di Zimanê Kurdî de ji Aliyê Semantîk we Avaniya Tebatî:

Di vê beşê de zimannasan bi awayekî giştî berhemên klasîk te nêzikhatiya semantîk pir karanîne ji ber ku ji aliyê teşeyî ve ev pêveka ‘ ‘ hatin ‘ ‘ ê di dema klasîk te nehatiye karanîn. Ji ber wê gava ku em li ser berhemên klasîk biseknin em ê bibînin ku di ve serdemê de bi tenê nezikhatiya semantîk we lêkolîner çê bibe, bi taybeti di dema klasîk te bi berhemên nivîsî de piranî derkevin peşya me ji ber ku me jor de diyar kiribû pêveka ‘ ‘ hatin ‘ ‘ ê nehatiye karanîn û em jî mecbûr dimînin ku fikr û bi hêla şiroveyan beytên tebatî bibînin.

Di nêzikhatiya semantîk di dema klasîk te di berhemên nivîskî de piranî dertên peşya me lê em di dema modern de nikaribin tiştêkî wisa bibejîn ê dî , di dema modern de nivîs di aliyê teşeyî we pêveka tebatî zahf tê karanîn lê di axaftinê de ango di zimanê (devkî) de peyva tebatî carna nayê karanîn hevokên lebatî kar tînin û peyama wateya tebatî dixwaze bide gotin.

Lêkolînerên ku li ser nêzikhatiya semantîk diseknin bala xwe didin pîrsa di saziya tebatî de fonksiyona têkiliya wateyê di nava hevoksaziyê de çi ye ? Bi şîrovkirin fikr û ramanên xwe em ê biryar bidin ku hevok tebatîye gava ku min li ser sedema klasîk lêkolîner kir bi taybetî di dîwana Ehmedê Xanî û Melayê Cizirî de bi fikr û şîrovekirinê de min dît ku hevok tebatîne.

3.4.1. Di Dîwana Maleyê Cizirî de ji aliyê Semantîk ve Avaniya Tebatî

Îsmê te ye mektûb-i di diwanê qîdem da

Herfek qelemê ‘ilmê bi teqwîme reqem da.

Ey Muhhemed navê te ye ku di dîwana kevnare (lewh el – mehfûzê) de hatiye nivîsandin xameya zanyariya wî pak bi reqaftin û rêzkirina herî delal û qenc

⁶⁸ Bedirkhan, û Lescot,(Grammaire Kurde), r. 198.

yek herfek nivîsandiye ku ew jî ev nav e ; jixwe piştî wî gerdûn hemû ji nûra wî navî hatiye afirandin.

Eşkal û xetên daîreyê nuqtayê ‘ ilm in ‘

Ev neqş û mîsalên di xeyalatê edem da.

Ev nexş û nimûş û xetên k udi xeyalên nebûnê de hene û ji wan hebûn.yen gerdûnî yên alema jorî û jêrî pêk hatine ev tew ji şekl û xetên wê dorxêza xala zanyariya Xwedayî ya kevnare peyda bûne. Lewra ev li gor zanîna Xwedê ya ezeli ku berê pê dizanibû hatine çêkirin.⁶⁹

Miskê reşandî ez dibêm wan nuqtayan hin bûne kêr

Lê xettê reyhanî li dêm katib ji nû î'rab-i da

Ez bawer im û texmîn dikim ku ev nuqte û şanikên reş ên ser rûyê gilover ê dildarê misk ê lê hatiye reşandin û ev deqandiye. Hinek cih û nuqte ji rûyê evîndarê (bê misk) mane lê ev xeta rihanî yanî ev xala reş î dirêj ya di rû de , katîb ew zêr û ziber kiriye û piştî wê reşandinê ji nû ve xêten delal lê kişandine da ku piçek jî ji rûyê yarê çî ji reşandina miskê û çî jî ji ser û berkirina nivîskarê şîyan û qudretê be , vale û ne lihevhatî nemîne.⁷⁰

Mey hate fîncana sedef , kes dê vexwit îro bi xef

Saqî bi çeng û nay û def ferfûriya mehtab-i da.

Piyaleya sedef ji bo badevexwiran ji şerebê hat dagirtin û badegêr jî bi dengê çeng ney û defê re îskana ferfûrî ku wek tavehîvê rohnî dida gihîştand ber wan. Vêce ma di vê rewşê de êdî kes dikare vê badeyê nihênî vexwe ? na herê , di vê xirecirê û di nav van dengên bilind de tu kes jî nikare.⁷¹

Min dî seba dayê seher madarê bedrê kir du ker

Qews û qezeh jê hate der dîsa bi zulfan re teba

Dema dildarê gulang berdan ser rû û bayê seba jî lê xist, çawa ku di malika pêş de jî lê bihûrî hingê min dît ku bi berbangê re ew bayê hênîk dayê û bîsk li ser rûyê dildarê ku mîna bû hîva çardeh şevî kirin du şeq ,yek li aliyê rastê û yek li yê

⁶⁹ Mela Ehmedê Zivingî, *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizirî*, Weşanxaneya Avesta, Çapa Yekem 2013, Stenbol, r. 98.

⁷⁰ H.b.r, r.106.

⁷¹ H.b.r, r. 108.

çepê . Vêra jî renekî weke yê keskesorê di sehera sibê de xwiya bû bi libt û libabûna gulangan ya ji ber bayê sebayê re çirisand û rohnî da⁷².

Nîşe : Mela Ehmedê ZIVINGÎ, Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizir de ev mînaka jor de peyva 'dîsa ' ji peyva hatiye , kin kirin , di aliyê teşeyê û semantîk de çiqas wateyekê tebatî tûnebe jî lê li gor peyva dîsa ispat kirinekê wateya tebatî dibînin.

Îro mecal lê hat û wext dîsa ciwan bû min dirext

Ew lamî'a dayî ji text ma kane berqen xulleba.

Îro keys û fesal lê hat ku daxwaziya me hat cih û ji me re bû dema kêf û şadiyê . Dara hebûna min ,piştî çilmisandin û pîriyê careke din jî nû ve şîn bû û terh da . Ev rohnîya ku ji aliyê textê dildara şahbanû ve veda û hêviya ku ji bo pêkanîna sozê xwe da me eşkere kir ku ne birûskeke xapînok e ; ango ne sozeke mîna birûska ewrê bêbaran bi derew û xapînok e , belkî sozeke rast î durust û bêguman e .⁷³

Birûska batinî da dil di pêtî sînê wê wer bû

Ku dê bêtin tebîta dil di nav wê nar û pêtê da.

Birûska nihênî yanî ya manewî ku agirê evînê ye li dil da û ew şewitand; di nav wê pêtiya agir de dil kete lerz û cersekê . Vêca di nav wî agirî û wê pêtiyê de wê li kû û çawa hedana dilê reben bê û bitebite.⁷⁴

Dilo mizgîn e min şa be ku sultanê me dê bêtin

Ji min bawer ke peyxamê seher mizgîn bi min pê da.

Ey dil mizgîniya xêrê ji te re be û şad bibe ku dildara me ya xwendkarane dê were civatê û me bi dîtina xwe dilxweş bike . Tu ji min bawer be ku ev mizgînî rast e bêguman e , jiber ku berbangê bi xwe ev nûçe da min. Mebest bi seher ê dema xewlenişîniyê ye ku ev her sibê tê de dikeve hizûra Xwedê û difikire yanî êy dil ez di dema xewlenişîniya ku bûyerên xwe dahî tê de diyar û rohnî dibin de bi vê yekê hisiyam û mizgînî ji min re hat ku tu şik û guman tê de nîne ev li ser maneya ku gotin

⁷² Zivingî, *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizirî*, r. 114.

⁷³ H.b.r, r. 118.

⁷⁴ H.b.r, r. 125.

‘ *pê da* ’ be lê ku *pêyda* be hingê ango ev mizgînî rast e çunkî di dema seherê de di wextê xewlenişînî ponijandinê de ev ji min re diyar û rohnî bû.⁷⁵

Şerbeta şîrînleban Zehra helahil bû di nav

Lew bi narê firqetê axir li min dil kir kebab.

Ew jariya cankuj tevlî şereba ku ji avê lêvên şêrîn dihat bûbû , ji wê bonê jî dilê min bi agirê cudayiyê hat birajtin. Ev şereba ku dildarê bi wan lêvên şêrin dida min jariya kujer tê de bû û ji wê bonê jî dilê min mîna goştê birajtî ji ber dûrî û cudahiya wê bû kebab⁷⁶

Qewsê du hîlalan ku li ser bircê esed bit

Bû şehre di ‘amê ‘ emel enguştê numa girt.

Çi dema ew kevanên wek hîva yekşevî ku birû ne, hatin raserî birca şêr ku çav in , nav û dengê wan di nav xelkê de belav bû û bi tiliyan hatin nîşandan.⁷⁷

Tu hudûsê weh mebîn qenc-i nezer dê carekê

Li esasê qidemê daniye dîwarê hudûs

Tu hebûn û peydabûnê weha kêmbûnê û carekê qenc bala xwe bidê , çunkî dîwarê cihan û bûyînê di binî de li ser hîmê herbûyîn û qedîmiyê hatiyê danîn.⁷⁸

Sikkeyê şî’ra me bi navê te hat

Lew bi ‘iyarê di cehan da rewac.

Ji ber ku sikkeyên (nexşanên) ser diravên şî’ra min bi navê te hatibûn kolan (nexşkirin) ew di cihanê de belav bûn û di kêşan û eyarê xwe de rewa bûn⁷⁹

Can û cesedan ku ittihad in

We l-ma’u lehu l-mizacu bi r-rah

Can û laş tam weke ku av û şerab hatibe têkel kirin, bûne yek. Ev sedem e ji bo gotînên malika pêşî ku pêwistiya ahengiya rûh û şexs dide pêş. Heçî rûh û şexs yanî laş ku hertim yek in û ji hev venaqetin, armanca wan jî ne dijî hev e û kes nikare

⁷⁵Zivingî, *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizirî*, r. 130.

⁷⁶H.b.r, r. 177.

⁷⁷H.b.r, r. 218.

⁷⁸H.b.r, r. 267.

⁷⁹H.b.r., r. 287.

wan ji hev cuda bike . Herweke ku şerab jî tevî avê bûye û bi hêsanî ji hev nayê veqetandin , divê ew jî tam li hev bin heya ku hogirî hev bibin.⁸⁰

Yexma ji me can kir ku tecellayê li dil da

Min rûhê di qalib tu yî tenha qefes im ez

Ey dildara min dema tu li dil eşkere bûyî hingê canê me hat talankirin, di aliyê wateyê de hevokekê tebatî ye.

Subhat bi sazan hat saz pê mewwicî deryayê raz

Da dil ji nû bayê mecaz wê keştiyê sukkan e reqs.

Bi alavên muzîkê yên sazîn civat û suhbet hat saz kirin û pê re jî deryaya razan rabû û kete ber pêlan bayê evîna mecazî jî li dil da lengerê keştiya dil jî ji cihê xwe lebitî û rabû reqsê.

Gulçiçek û neqşên xerîb nesrîn û reyhanê ecîb

Lê rast û çep bûyîn selîb cedwelkeşên zunnarê xet.

Ew çixêzên xeta wê nameya zunnarî ya dirêj ku bi rastkêşê hatiye kişandin, çixêzên weke xaçê rast û çep û nexş û nimûşên nedîtî û gulçiçek û wênayên nesrîn û rihanê yên ecêbmayî jî tê de ne.

Ahûya min ne ku rencek te bi xatir bigehît

Bi xwedê kî lew ku ew sek bi xwedê hate mesek

Ey xezala min nebî nebî tadeyiyek bigihê dilê te û tu pê biêşî , lewra tu bi xwedêkî bizane ku ez bi navê xwedê sond dixwim ku ew se hatiye girtin.

Nazika min ku bi mestî di çemen hatî xeram

Ji hesed çûne xusûfê meh û mihre di felek .⁸¹

Dema evîndara min ya nazik hat û di mêrga hêşin î kesk de bi mestî û kubarî xwe hejand û meşiya hingê heyv û roj hemî ji zikreşî û daxizî hatin girtin û di çerxa felekê de winda bûn. Gava ku evîndara min ya nazik hat, bi mestî û kubarî xwe hejand û meşiya hingê heyv û roj hemî ji zikreşî û daxwazî hatin girtin.

Xettê –ye qewsê dû nûn mektub zi muşkê ezferand

Ya hilal ul’-îdî’ ya ebruyê bêhemta-‘stî î

⁸⁰ Zivingî, *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizirî*, r. 311.

⁸¹ H.b.r , r. 311-607.

Ev xetên kevankî ku ez li ser van çavên weke herfa sad Erebi dibînim gelo du nûnên kevankî yên berevajî ne ku bi miska bêhnxeş î hatine nivîsin.⁸²

Nûnên te hilalê bi qeran yek ji sura ‘ Heq

Bê ‘ eyb-i li dêmê qelemê xeybê kişandin.

Ey dildar ew birûyên te yên mîna herfa nûn serbejêr û mîna heyva nûavetî zirav û beramber spehitî û cazîbeya payeberz hatine afirandin.⁸³

Kuştiyan xewn dî lîqayê lew bi wê dê xweş bibin

Hêviyan qet nabirim meqsûd me dîdara te ye .

Ew evîndarên ku bi wan tîran hatine kuştin di xewna xwe de dîtin ku dê ew bi gihîştina cem te bextxeş bibin û tabîra xewna wan jî ev e ku dê piştî kuştina pêşî careke din sax bibin û bîna hizûra te. Herweke wan ez bi xwe jî tu carî hêviya xwe ji wê jiyana duyemîn ya piştî mirinê nabirrim û jixwe armanç û mebesta min jî hew dîtina şepaliya te û dîdara çehreya te ya geş e ku ew jî li vê cihanê bi dest nakeve û hew piştî rabûna pey mirinê û vegeştina li cihanê pêk te.

Şerhê halê xemê ‘işqa te ji kû tete nivîsin

Medhê ewsafê cemala te kuca tê reqemê.⁸⁴

Ey dildar ma qey şiroveya rewşa derd û xemên ku di rîya evîna te de bi ser me ve tînin û pesn û saloxên kul û keserên dildariya te di çî kitêban de tînin nivîsin û di defter û dîwanan de bi hejmaran tînin tomar kirin û qet tînin jimartin jî ? na nayên , çunkî ew nakevin tewên kitêban û ji hedê nivîsîn û hejmarê der in.

Ma ji diwarê se’adet seh kirî şubhe Melayî

Tu bi navê mi gedayî bikişîne qelemê .⁸⁵

Ey dildar ma qey te tu evîndarekî weke Mela ku bi evîna te re rastî dirust û dilsoz be û navê wî di deftera kamiranî û bexteweriyê de hatîbe tomarkin bihîstiye.

Tuxrayê humayûn ku dîkin turreyê emr

Zulfa te ya anîn ji xeta tehrîrê

⁸² Zivingî, *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizirî*, r. 607.

⁸³ Mela Ehmedê Zivingî, *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizirî ii*, Weşanxaneya Avesta , Çapa yekem, 2013, Stenbol, r. 49.

⁸⁴ H.b.r., r. 270.

⁸⁶ H.b.r, r. 277.

⁸⁷ H.b.r, r. 343.

Ew mora padişahiyê ku pê belge û ferman tên mohr kirin sûretê kagula te ya lefiyayî û biska te ya xwer î honayî ye ku nivîskaran ew bi şaşî anîne û li ser belge û fermanan xistine, lê ji ber ku nikaribû eslê wê derxin rabûne hinek jê qopî kirine û ew bi wê beşê temsîl kirine.⁸⁶

3.4.2. Di Dîwana Ehmedê Xanî de ji aliyê Semantîk ve Avaniya Tebatî

Mi dî neqşek ji neqşê neqşîbendan

Vebû bendê di min yek yek ji zendan

Di nakşê nakşîbendan de min naqîşek dît, gava ku min vê neqşê dît qeytanê destê min yek bi yek di zendikê min de hat bişkivîn.⁸⁷

Ey wahidê penhan ku ji zatê te ne peyda

Ev kewn û mekan, erd û sema, kunbedêxedra.

Ey xwedanê nexûya! bi saya zatê te ev gerdûn asîman û cih hertişt pêk hatiye.⁸⁸

Neqqaşê ezêl roja serlewheê rengîn da

Pergar di destan bû sersefhe ku teyzîn da.⁸⁹

Naqqaşê ezêl , gava ku vê gerdûniyê ava kir levhaya serî wek rûpela herî sereke di destê vê de pergel heye wisa vê xemiland. Bi angorî tesewwûfa îslamê, bi taybetî felsefa wehdeûl wûcûdê, tecelliya Xweda ya ewwel , teccellî ya zatê wî jî zatê wira ye.⁹⁰

Tezhîbê zerefşan kir serlewhê kîteba ‘ işq

Resma ezêlî kêşa , neqşê xwe newalîn da

Levhaya pirtûka evîniyê, ava zêr pê da û xemiland, wêneya edebî kişand û naqşa xwe da vê.

Me nezanî ku melek yane beşer (ya perî) bû!

Yadê beyda weku Mûsayî li qetlê vedimişt⁹¹

Ez nizamim kî melek bû beşer bû an jî perî bû , wek destê spî ê mûsa bû gava ku destê xwe da me em hatin qetilkirin.

⁸⁷ Kadri Yıldırım, *Ehmedê Xanî Külliyyatı 4, Dîwan*, Weşanxaneya Avesta, 2014, Stenbol, r. 118.

⁸⁸ Yıldırım, *Ehmedê Xanî Külliyyatı 4, Dîwan*, r.136.

⁸⁹H.b.r, r. 140.

⁸⁵H.b.r, r. 146.

⁹⁰ Abdurahman Durre, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jiyana Keskesor Yayınları*, 2002, r.150.

3.4.3. Di Dîwana Baba Tahîrê Uryan de ji aliyê Semantîk ve Avaniya

Tebatî:

Xwoşa anûn ke ez pa ser nedûnend

Mîyanî şu'le xişk û ter nedûnend

Kenişt û Ke'be û buxtanê û dêr

Serayî xalî ez dilber nedûnend.⁹²

Çiqas bextewarim ê ku ser ji bedenê re veneqatandine, wek şule şilî û hişkî veneqatîne, dêr, kabê, putxane ê ku zanibe ku bê evînî birc (saray) bawer neke. di beyta jor de çiqas ez êvindar bibim jî ê ku serê min ji bedena min rake ne diyar be jî wisa bextewar im , şilî hişkî çiqas ber çav be jî ê ku cudahî nexe navberan wan û çiqas bi birc be jî bê evindarî çê nabe. Di vê beytê de serjê kirin ji aliye kî/ kê we hatibe veqetandinê jî bê evîndarî jîyan nadidome..

“Elîf “ kej “kaf” û “ nûn “ eş ser be wer kerd

Hemeş haman gehan o lacewer kerd

A keş ed afirî gerdûnî gerdan

Aneş edsat û men endace werkerd.⁹³

Peyva elîf û kaf ji roja ku ji nûn derketine, hemû cihan kirmişîye rengê şînehiyê, xwedayê şev û roja gava ku cihana geştîyarî afirand min jî, pivan dikir. Peyva nûn em dikarin wek însanekî bi fikrin, gava ku mirov di zikê diya xwe de vek mîna tîpa nûn ê , di zikê diya xwe de ye bi wê awayê tîpa elîf û kaf jî tîpa nûn ji xwe re çavkanî dibîne o hemû dinya jî bi rengê şînahiyê tê kirmaşandin. Di beyta jor de em dikarin vê beytê bixin pola avaniyê xweser.

Bijîn ev kesên ku rih ji bedenê naqetînin

Can ji dilberê, dilberê ji can venaqetînin

Bi mehan û salan hînî derdkişandinê dibin

Ji bo derdên xwe tu dermanekî nabînin.⁹⁴

Bijîn ev ê ku beden û rih bi awahiyekê wek hevdû dibînin û wan naqetînin , evîn û evindariya ji hev naqetînin bi meha sala hînî dert û elem bibe , û paşî ji bo êşa

⁹² Kadri Yıldırım, *Espîsadebazê Hemedanî: Baba Tahîrê Uryan* , Weşanxaneya Avesta, 2013 Stenbol, r. 41.

⁹³ H.b.r, r. 45.

⁹⁴ H.b.r, r.117.

xwe derman nebîne. di beyta jor de rih û beden ji aliyê kê we hatiye veqetandin ne diyar e bi rastî ev beyt jî wek beyta jor de kum e behs kiribû avaniyekê xweser e .

**Her kesê ku ev li ba te nêziktir e
Dilê wî jî durketina te şewitîtir e
Eger carekê mûjganên te bibînin
Dikeve canê min sed hezar neşter e⁹⁵**

Eger bi nêzî te be dilê wê bi dûranî zehftir diêşe, eger ez carekê mijganên te bibîm hezar neşter bi dilê min dikevin , di beyta jor de çiqas nêzî evîniyê bibe jî wisa jî dûr dikeve gava ku bi tenê carek mijganên wî bibîne hezar neşter li canê wî dikeve , ango gava ku evîndar evîna xwe dibîne hezar tîr an jî neştêr tên canê wî dikevin.

3.4.4. Di Berhemên Feqiyê Teyran de Ji aliyê Semantîk ve Avaniya Tebatî

**Sebr û aram û sukun e
Baziyê nav lê ‘uyûn e
Dil ji pancan kirbû xûne
Ay dilê min ay dilo⁹⁶**

Feqiyê Teyran, di beyta jor de, eşandina dilê mirov û sebr û aramê sebaba ku ji penca ku dilê wî ketiye şanî me dide.Lê em gava ku berfirehê li ser wê beytê biseknin , pancan ji aliyê kê / kê we li dil ketiye em nizanin ji ber wê em dikarin bibêjin ku ev beyta jorî di aliyê semantîk we tebatî ye.

**Bê hesab şîş lê kişande
Hûr kir û şîşk lê reşande
Nezera zer şevê şand e
Ay dilê min ay dilo⁹⁷**

Ev beyta jor jî em dikarin bixin nav pola avaniya tebatî ye , di beyta jor de bê hesab şîş lê kişandine ev şîş jî , nêrinekê çave gava ku mirov li yekê mêze dike wek

⁹⁵ Yıldırım, *Espîsadebazê Hemedanî: Baba Tahirê Uryan* , r. 381.

⁹⁶ Rênas Jiyan, *Feqiyê Teyran, Hemû Berhemên Wî* , *Weşanxaneya Belkî* , Stenbol, 2008. r 25.

⁹⁷H.b.r, r. 27.

şîşek li dilê wî dikeve ji ber wê şîşê jî tê reşandin. Em nikarinin ev şîş ji hêla kê/ kî hatiye ne diyar e.

Ê bîn rojek rojê amindar
Ê hişyar bin sêfil û jar,
Ê qal kin pêşiya mîrê xedar
Ê textê wan bikin wêran⁹⁸

Di beyta jor de , ê ku qal bikim û ê ku wêran bikin ne diyare li aliyê kî/kê we em bûyer ê çê bibe ne diyar e. Ji ber wê em dikarin ev beytê jî bixin nav pola tebatîyê ji aliyê semantîk ve.

3.5. Di Zimanê Kurdî de ji Aliyê Teşeyî de Avaniya Tebatî

Di zimanê Kurdî de di nezîkhatîyê teşeyî de xebatê ku li ser avaniya tebatî hatine çê kirin, fonksiyona ragihana tebatîyê paşçav kirine ev taybetmendî wek di zimanê çiqas hebe jî di zimanê Kurdî de jî heye. Di zimanê kurdî de diyarkirina cûreyên hevokê û cûreyên tebatî û regezên diyarbûna mixabin dijwar bûye.

Berya ku em destpêbikin, zimanê Kurdî ji aliyê teşeyî de di dema nivîsîde bi sedsala modern destpêdike, ji ber ku pêveka ‘*hatin*’ ê di hevokan de di metnan de cih girtiye.⁹⁹ Di serdema klasîkte ji aliyê semantîk we çiqas zahf hatibe bikaranîn jî, lê di dema modern de ji aliyê teşeyî we em dikarin fikrên rêsen derxin holê. di nêzikhatîya teşeyî de rêgezên herî girîng, ji wateyên razber dûr dikeve û sînor dixê navbera wan hevokên razber wek ku me di jor de jî diyarkiribû, di nêzikhatîya teşeyî de rêgezên herî girîng, gerek di hevokê de pêveka ‘*hatin*’ ê bi aliyê kiryar were karanîn. di zimanê Kurdî de çiqas nivîskar an jî lêkolînervan di metnên xwe de xwe razber bikin jî, rolek û rewşek didin hevokê .

Di nêzikhatîya teşeyî de endama kiryarê, avaniya tebatî de cih diguherîne, ango di hemanen de rêzîkbûna heman cih diguherîne ku em li ser mînakekî vêbejîn ê baştir bibe.

⁹⁸ Jiyan, *Feqiyê Teyran, Hemû Berhemên Wî* , r. 34.

⁹⁹ Badilli, *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramerî*, r. 105.

Mînak:

Ehmed nan xwar.

Nan (bi hêla Ehmed) hatiye xwarin

Li gor rêzika hemanên de , di mînaka jor de Ehmed (endamê yekemîn , nan jî hemanên duyemîn e lê gava ku em vê mînakê ji aliyê nêzikhatiya teşeyî we biguherînin tebatî em ê bibînin ku endamên hevokê cih guherandine wek jor de tê xuya kirin jî nan di mînaka jor de endamên yekemîn bû lê guherandinê de bu endamên duyemîn.

Di nêzikhatiya teşeyî de gerek şexs azad bibe û ji ber wê jî pêvîste ku ferman kirin , bi paşinartin ve hatibe girêdan ev teorî çiqas di zimanê Ingilîzî de ehîl be jî di zimanê Kurdî de piranî makaleyên zanistî û di romanên , kovaran de dertê pêşya me tiştêkî wisa ji heye , di zimanê Kurdî de ji aliyê devkî de mînakên herî xweş , dengbêjên me ne . Dengbêj gava ku satrana disitirînin xwe razber dikin,

3.5.1. Di Romana Şivanê Kurmanca de Avaniya Tebatî :

Ji aliyê nêzikhatiya teşeyî de di zimanê Kurdî de di destpêkirina roman û kovara de bi aliyê teşeyî we pir hatiye karanîn. Di sedsala nûjen de avaniya tebatî bi hêla nivîskar an jî leheng xwe bi roman dûr dixê û di dixwaze ku tebatiyê gelemperî bike.

*-Wextê tarî kete erdê, zar hê digirîyan ,kerr nedibûn mecala min **hate** birîne.¹⁰⁰*

*-Ev mereka em têda diman , ne tendûr kiribîyeda hema tendûra me zivistana gelle cara **nedihat** dadanê.¹⁰¹*

*-Wê axriyê guhdîrêj **hate kirinê**.*

*- Aleksandrovska bi navê bavê padşê **hatibû avakirinê** em gundê teze ev gund ji şehêrê Qersê hevt kilometre dûr bû lê çî cîki zaf kaw hatibû avakirinê¹⁰²*

*-Herçî ekinê wanî mayîn hebû herkê genim bûya , ceh bûya yan tiştêd mayîn bûya ew jî tev bi maşînîya **dihate çandinê**¹⁰³*

*-Melegane du paye wanî dewletî bû , kesîbê wane hindik bûn lê kesîbê wan jî notla me ji teref kûlaka **dihatne** êksploatasîkirinê.¹⁰⁴*

¹⁰⁰ Eren Şemo, *Şivanê Kurmanca*, Weşanxaneya Lîs, Berfenbar 2015, Diyarbekir, r. 12.

¹⁰¹ H.b.r, r. 14.

¹⁰² H.b.r, r. 20.

¹⁰³ H.b.r, r. 21.

¹⁰⁴ H.b.r, r. 22.

- Gava ku genimê zeviya zer dibû, idî simlê nê hîşk dibû me ji genim xwera qelînok digeland û pir hindikî emê disa têr bûn . lê waxta genimê çolê **dihate dirûnê** , halê me dîsa xirab dibû.¹⁰⁵
- Wextê warê bega , axalera û kûlaka **hat çê kirinê** tundirist bû
- Diya min minra kin kir bi van kincava ez îdî waqa ji wan zara **nedihatime** kivşe , çimkî ew kincê minê berê pînekirî –cûre cûre pîne lê dirûbûn.¹⁰⁶
- Zozan zozanê wan bûn ,war jî ser navê wan **dihate** navkirinê.¹⁰⁷
- Wexte warê bega, axalera û kûleka **hate çêkirinê** tundirsit bû,temam kirin.¹⁰⁸
- Wê rojê gelle xwarin , -êmek tê çêkirinê , pêz **tê şerjêkirinê** rojekê pey beran –berdanêra me heqê xwe stand.¹⁰⁹
- Qers **hatiye** avakirinê ber çiyakî mezin , serê çiyê keleke mezin ji zinara **hatiye** çêkirinê. Qers ketîye bin bandûra Ûrisête pey şerê 1877-1878 salê . Çawa ku mezin salixa didin , wextê Qers **hat** standinê , seresekeriyê eskerî şêr , Lorîs Mêlikov , dikir. çarniqalî Qersê çiyane serê wan çiya **hatne** avakirin.¹¹⁰
- Gundê sarî –bilaxe berêda ciyê ekser bû pošta eskerê prangit têda dima têda **hatibû** avakirinê¹¹¹
- Min lê niherî çika xwarin bona zabita **tê aninê** : şekir , koniyak , şerab araqa xas goşt, û gelle xwarîna dinê.¹¹²
- Evana dinêrin ku ev gulle rindê nîşandar ev jin davêjin hinekê ji wan **bêne kuştinê** û qerewil jî wê wan bihese direvin , têne çadira xwe¹¹³.
- A bi van delka ez destê wan derketim , lê ez **têr kutam**¹¹⁴
- Gelle merî **dihatne kuştinê**, gelle jî xirabî – dizî dibû¹¹⁵
- Lê ez çawa bikim , min dê û bavê xwe belengaz , kal – extiyar hiştîme ez **hatme girtinê**, niha hatme vira, hûn jî wa dibêjne min ez çawa bikim ? kuda herim ?¹¹⁶
- Hevt mêrê me derbekêra hatne kuştinê min kûçekê dinda pişt jê stand , dar be gulla.

¹⁰⁵ Şemo, Şivanê Kurmanca, r. 25.

¹⁰⁶ H.b.r, r .45.

¹⁰⁷ H.b.r, r.55.

¹⁰⁸ H.b.r, r.59.

¹⁰⁹ H.b.r, r.67.

¹¹⁰ H.b.r, r. 75.

¹¹¹ H.b.r, r.83.

¹¹² H.b.r, r.90.

¹¹³ H.b.r, r.91.

¹¹⁴ H.b.r, r.108.

¹¹⁵ H.b.r, r.119.

¹¹⁶ H.b.r, r.123.

-Dengê têtêfonê **hate birînê** , min trûbke danî.

- Wî şerîda ez **hatme birîndarkirinê**.

- Me şerekî gumreh ser Stavropolê kir. hevalê miyî ezîzî rind, hevalê Şpak , li gundê Tatarkê ser Stavropolê **hate kuştinê**.¹¹⁷

-Bizinê min jî stwer bûn ,risqê zarê min **hatne birînê** . ez bê îlac mam , idarê zarê min nedibûn . xelqê kesîb ,yê **hatibûnê talankirinê**, malê wan bega û daşnaka jê stendin , diçûnê kaxetê nava Gurcîstanê , idare xwe dikirin.¹¹⁸

-Eva gilîyan **dihate kirînê** wextê ez dihatme nava kurmanca; min xebat dikir , agîtasi dikir, derheqa gilîgotinêd firqê û dîwana şêwrê¹¹⁹

3.5.2. Di Dengbêjî de ji Aliyê Teşeyî we Avaniyên Tebatî:

EMÊ GOZÊ-1

Way lê wa yê, way lê wa yê, de wa lê way yê.

Bişarê Çeto bankir, Emo lawo were rê ye,

Eskerê Romî û nefîr ama qaymeqamê Zoqê

Û nefîr ama bîst û çar eşîra giran e,

hatin kuştinê dawî neyê.

Emo ban kir;

Bişaro lawo, şehîdê bavê Şemso gelek hene,

Bi êrîşa ewilî min gelek zabit û onbaşî û çawiş **hat kuştin**

Meyitê wan avêtin, benda reza

Serê wan kirin loda ka yê.

De lê dê!...

Talî Emo de lê dê, poz berano de lê dê;

Emo bankir, Bişaro lawo, lingê min di

qeydê da, mifta qeydê, miftê li cem

Şemso Xanimê, li asraxa banê qesrê da.

Şemso bankir;

Dilê min dilê kî dîn e

¹¹⁷ Şemo, Şivanê Kurmanca, r.143.

¹¹⁸ H.b.r, r.148.

¹¹⁹ H.b.r, r.150.

. Keke Cemîlê mêzeke, birek malê goçera
, Li Zîwkanê Saço, li sadeka bavê Melko,
Li kevirê bûk û zava,
Li tenîsta malê me danîne.
Ez bala xwe didem sibê ye, pênc sîwar tên û dilezînine,
sîwarê pêşî Mehemedê Devrêş e,
Yek jî Elîkê Elîkawî ye, yek jî Mecîdê Segmanê,
Yek Xalîdê Xwedê da ye
, Yê dawiyê Eliyê Matkî ye.

Bi texmîn vê bi ser koza lawê gazê da dica
Dînin tirsê min tê ji wê tirsê,
Wê koza lawê gazîkê karanê, wê bikin qitîtîk û xwîn e

Şemso bankir;

Hesenê Osman bavê mino, eger tu mêr be,
Devê can fidayê li şîbak û li banê qesrê xîn e
. Bike tu wan her pênc sîwara,
Ji ser koza Emê Gazê vegeirîne.

Şamso bankir;

Cemîlê sibê bû, bira înzallah şerek çêneba,
Li keleşanê Koçera, li pozê bîra,
Min dî ji êvara Xwedê tê dengê top û
Tekelîkê Bişarê Çeto, Qaymeqamê Zoqê,
Ji êvara Xwedê da, li ser serê Emê Gazê,
Nala nala çûçîkê li ser hêlîna wîlê wîlê.

Şemso bankir;

Hesenê Osman, kurê xalê, îro derba bavê Cemîlê,
Lawo sibê bû dil min dilêkî dîn e.
Bişarê Çeto ban kir,
Mememedê Devrêş bavê min tu çi awa ye,
Îro bi ser koza Emê Gazê da bi kudîne,
Tu mifta mohrê ji destê wî derxîne.
Mehemedê Devrêş bankir,

*Bişaro lawo, mademkî te ez xwastim,
sekna min tu nîne*

Henê bankir;

*Cewê, cewê bankir, seyrê, seyrê bankir,
Mehemedo lawo tu îşê te bi îşê Emê Gazê
û Bişarê Çeto nîne,
Emê Gazê wê te bikuje, heyfa dijminiya kîna
kevin wê bi ser te derxîne.*

Mehemedê Dewrêş bankir;

*Seyrê lê dayê, eger ez najom ser koza Emê Gazê,
Bişarê Çeto û Mecîdê Segman û Emerê Perîxanê,
Wê li koza xanimê xwe rûnin,
Wê xwe li cem jinên xwe xwe bipesînin,
Bişarê Çeto wê bibêje:
Min Mehmedê Dewrêş li Emê Gazê elimand,
Nikarîbû Emo bi kuştâ
Û mifta rimê ji ber hilne.
Ezê vê sibê ser koza Emê Gazê da,
Ezê bikudînim,
Xwedê çi nivîsandiye ya be serê min,
ew qedera min.*

Şamsî bankir;

*Cemîlê eger ku sibê bira şerek çêneba li
Zewkanê, saço li sedaka,
Bavê Melko li çardaxa bavê şebûkê li kevirê bûkan û zava,
sibê bû dengê top û tekelikê
Bişarê Çeto û Qaymeqamê
Zoqê ji êvara Xwedê da,
li ser serê Emê Gazê tê;
Nala girê gira ewran û topane...
Xwedê agir berde mala qaymeqamê Zoqê,
Bişarê Çeto û Mehemedê Dewrêş,*

*Lawê te Malik ne awa bû,
Dibê hatiye kuştinê Emê Gazê, Birîna Emê Gazê
li navbera herdu çavan.*

Baxems bişewite keko bi naval e.

Şamsî bankir;

*Cemilê ez bala xwe didemê,
Vê sê şerê aliyê Emê Gazê kozika karanê şer sehabê
Ji nîvro bi şûnda
Şer qulibî ser banê û qesrê kela,
Ba Xemsê ser milê Hesênê Osman
Kurê xalê kewê bi kar e.*

Şamsî bankir;

*Dilê min dilêkî dîn e;
Hesênê Osman mêzeke Mehemedê
Dewrêş Xalidê Xwedê da yî,
Eliyê Elîkawî,
Emê Gazê **hat kuştin** dikin mifta rîmê ji dest derxînin.
Bavê min tu mêr be,
Devê ku çûk çepiliyê li şibka jorîn xîne
Bike tu qapaxa serê Mehmedê Dewrêş bi firîne.
Heyfa Emê Gazê, heyfa kela Xemsê jê hilîne.
Hesen bankir Şemsî;
Xwerzî miftê di destê kurê xalê te da germ bûye,
Ez kêr digirim zêde dixîne,
Tu balçîka dev zirav bi destê kurê xalê xwe gihîne,
Gava Şemsê dike û dilezîne paniya qunderê hildikşîne
Balçîka dev zirav li cem Hesênê Osmen datîne.
Hesênê Osmen bankir Şemsî;
Tu icarê derbê li kurê xalê xwe
, Bi çavê serê xwe bibîne
, Gava ku Hesênê Osmen,
Dest li balçîk dev zirav dixîne,*

*Li bejna Mehmedê Dewrêş dide,
Qapaxa serê Mehmedê Dewrêş difirîne,
Doxîna şalwarê Elîyê Elîkawî diqusune.
Heyfa Emê Gazê, bavê Şemso, jê distîne.*

“... Gozê dibê:

*bila tirsra te tune be ji eskern dewletê kurê Xelkê ye
Gava ku xwîn bikeve erdê, terqîn bikeve tivingê,
bira li bira nabe xweyî ye;*

Bila tirsra te tune be ji eskerên

Eliyê Ûnis wekî kewê çiyê ye,

Bila tirsra te tune be ji her sê zarê Çeto

yek Bişar e, yek jê Cemîl , yek jî Gêncî ye,

Yek jî jê re dibêjin Mihemedê Derwêş

babê Şemsetîn peyayê keşkaniyê Kekê Meysê ye

Bila tirsra te tune be ji Emînê Ehmed lawê lawê Perîxanê

Çavê wî li talan e,

ku were lihef û dewşeke ji xwe re bibe û birevîne

Bila tirsra te hebe ji Simê Ozman malik şewitî,

pismamê xayîn e, bi kozikê deverê me dizane....”

-EMÊ GOZÊ 2

Bişarê Çeto gazî dike Dibê:

Emê Gozê, Hesenê Şêxo, Mihê Emer

Lawo malê ticaran bidin werin rayê

Heger hûn nayên rayê

Ezê îro Qesra Baxemsê bidim bayê

Aliyekî bikim sekla tewla canîkê hespa ye

Alyekî ezê bikim kadina kayê

Ezê berê çilûx û çocixê we bidime Baxdayê

Emê Gozê, bi sê denga lê dike

Dibê: Bişarê bi serê bavê te kim

Heçî hûn Mala Fero ne, malekî malmezin in,

parsûhişk in

*Xeber bi serê we de naçin
Ezê îro malê ticaran bidim werim rayê
Hetanî sax bim li heyata dinyayê
Le serê min li ber êl û eşîrên giran hîlnayê
Piyê min li qeydê ye, mifta qeyde li jor e
li ba Hesênê Ozman e
Min sozek bi mala Hesênê Ozman re daye
Îro di kozika kolanê de kuştina me hey,
carek nayê me rayê
Gozê bang li kurê xwe dike
De lêxe Emê Gozê de lêxe
enîgiçiyoy, pozberano de lêxe
Le bavê min o şer giran e,
Îro hûn bi hev re lêxin
Le navê nam namûsê lawo bi dinê xin
Navê revê pîs e giran e
Li pey malbata mala bavê min û xwe nêxin*

Dibê:

*De lêxe Emê Gozê de lêxe
Mihê Emer, Hesênê Şêxo,
Mihê Emer çend peyayê kozika bavê min bûno
Şer giran e bi hev re lêxin
Îro qûndaxa sistemê li erdê xin
Nam û navê namûsê bi dinê xin
Navê revê pîs e giran e
Li pey malbata mala bavê min û xwe nêxin
Sîlsilê bi sê denga li palê Qesrê dike gazî
Dibê: Dora qesrê kekê min bi gilgil e
Dora avayê top û tivingê hikûmatê beşateşê Mala Fero
Ji siba Xwedê ve li ser qesra kekê min rebenê bi xura-sxur ne
Dibê: Qesra kekê min di kortê de
Avayê kekê min di kortê de*

*Tim û baran û payizan çiqas xweş e ji herbê re
Îro çiqas Bişarê Çeto ji mala xwe rabe
Qol û benda li kekê min girêde
Dibê: Bi hela hela navê te danê
Berê sustêma dane Kozikê Kolanê
Destê xwe avêtine ser mîratê tetika bi hev re tilî danê
Heyfa min nayê li wê heyfê
Cenazê Emê Gozê Hesenê Şêxo, Mihê Emer
Maye li hedîsê Zêwikê li Kozikê Kolanê
Seyrê dibê: Mihemedo lo bira
Havînê ji kula dilê min bira ji te re xweş havîn e
Le xelkê der û bênderên xwe hılanîne
Li kozik û muderîsê Mala Remo Necedîne
Le Mala Remo maleke ber û mêrî ne
Tu mêrê me Mala Remo li ser hev du tunî ne
Ji berê de ji mala bavê min û te re maleke
mêrî mêşînî ne*

Mihemedo dibê:

*Lê Seyrê diya min bûye
Xwiha minê, ez zanim havîn e
ji kula min û te re xweş havîn e
Lê xelkê der û bênderê xwe hılanîne
Ez zanim Mala Remo maleke ber û mêrî ne
Lê tu mêrê me Mala Remo li ser hev du tunî ne
Ji berê de ji mala bavê min û te re maleke mêşînî ne
De bala xwe bide Bişarê Çeto ,
Bi zabit û qumandan re li palê qesrê rûniştine
Le çawa tan li ser tanê îro li kekê te dixîn e
Li ser kozika kolanê li ser Emê Gozê de dayê hicûmçî ne
Lê ji îro pê ve golikê gundan jî kekê te
nahewînê, xweha rebenê hahîhîîî*

De heyla lê dayê heyla lê dayê
 heyla lê dayê Lê dayê lê dayê, lê dayê lê dayê
 Sîlsilê bi sê denga li li palê qesrê dikir gazî
 Dibê: Emîne de lê lê dayê
 Bi qîr û qetrana Helebê, bi zaca Misêrbînê, bi teniya Besrayê
 Şareka reş Hemûdê li dora serê xwe û te pêşaye
 Tu bala xwe bide bi Qaymaqamê Zoqê ve
 Bi Qaymeqamê Kopê ve
 Bi Qaymeqamê Elmadîna ve
 Li Bişarê Çeto bi heft bavê Pencîran ve
 Bi çend kesê Çerkez û Bêzarê Deştê Mûşê ve
 Bi Rema jorî ve, bi Rema jêrîn ve
 Bi Sîmê Ozmen pismamê xayîn ve
 Ji sibê Xwedê ver bi ser qesra kekê min rebenê
 lawo ji xwe re hicûmçî ne
 Le Gozê bi sê denga dikir gazî:
 Emo lo lawo de lêxe
 Bila tirsê te tunebe ji ekerê dewletê kurê xelkê ye
 Gava ku tarqîn bikeve tivingê
 Xwîn bikeve erdê bira li bira nabe xweyî ye
 Le bila tirsê we tunebe ji eskerê Eliyê Ênis kewê çiyê ye
 Le weka kewê ji xwe re bi keve deştê ye
 La bila tirsê we tunebe ji Emînê Ehmed lawê Perîxanê
 Tê li hihêf û dewşeka nazbalgîva talana ji,
 xwe re dibe û direvîne
 ,La bila ji Cemîl e, yek ji Bişar e, yek jê Gêncî ye
 Bila tirsê we tunebe ji Mihemedê Derwêş
 bavê Semsedîn
 Kekê Meysê ye
 Hefad û xweşmêr **hatiye kuştîyê** di ber xelkê de
 Emê Gozê bi sê denga dikir gazî:
 Gozê lê dayê

Tirsas min tunene ji eskerê dewletê kurê xelkê ye
Lê tirsas min tunene ji eskerê Eliyê Ênis kewe çiyêye
Lê tirsas min tune ji Emînê Ehmed lawê Perîxanê
Tê terş û talana ji xwe re direvîne,
Lê tirsas min tunene ji eskerê Bişarê Çeto babê Şebo
Lê tirsas min heye ji wê tirsê Sîmê Ozman malikşwî
Pismamê xayîn e îro bi kozik û deverê me dizane
Elê hey la lê dayê
*Bi hela hela nav **tê** danê, berê xulam dişeyine*
Hedîsê Zewîkê
Li ser Kozika Kolanê, berê sustema danê kozika kolanê
Devên bi hev re tilî danê
Lê heyfa min tê li wê heyfê
Cinazê Emê Gozê, Hesênê Şêxo, Mihê Emer
Îro mane li Hedîsê Zewîkê dayê ji xwe re li kozikê kolanê
Hahîhîhîhî¹²⁰

3.5.3. Di Kovara Hawarê 'de Avaniya Tebatî:

3.5.3.1. Di Kovara Hawarê' de Hejmara Yekem

- Di heqê zmanê me de heta niho gelek tişt **hatine** gotin.
- Ji bona pêşveçûna zmên, divêt em bendên xwe bi tevayîya van pirsan binivîsîn û li paşîya her hejmarê ferhengokekê danin û tê de mana pirsên ko di zaran de kêmbûne û yen ko ji nuh ve **hatine** hevedudanîn.
- Pêkve digotin ko kurdancî bi her fên latînî gelek qenc **tête** nivîsandin.
- Her tiştê ku ji bona avêtina **tê** daçikandin.
- Bi van herfan pirsinên din jî **bên** çêkirin.
- Paşî vê gotinê, qesda me, awayê edebî yata me ji xwe **têt** seh kirin.¹²¹

¹²⁰ Ev peyvên Dengbêjiyê, ji Salihê Qubînê hatiye hilgirtin bi saya Mamoste Necat Gümüş, 2018, Agirî

3.5.3.2. Di Kovara Hawarê'de Hejmara Duyemîn

- Bi vê civatê ji kêmasiyên me en bêhejmar yek ji nav **hâte** hilanîn. Devê kortaleke kûr ko her rûj jiyîna me dikot, rayên me dicût, pê **hatiye** girtin.
- Bi qirûşên we dibistan **tên** çêkirin, malek pê ava dibe, dermanên çend nexweşan pê **tên** kirin,
- Di her bajar û gundên mezin en Cizîrê de malikên wê **hatine** vekirin
- Divê cihanê de her tişt her mezinahî bi tifaq û yekbûnê, bi dayîna hev ber barên hev, bi hevgihana mirov û bi hevgihandina xebatên wan **hatine** pê.
- Kurd ji hev cuda dilopên baranê ne, cihê cihê **tên** daqurtandin.
- Ev şikl perîcar di zarowan de **têt** dîtin.
- Bi vê civatê ji kemasiyên me ên bêhejmar yek ji nav **hate** hilanîn.
- Devê kortaleke kûr ko her rûj jiyîna me dikot rayên me dicût, pê **hatiye** girtin.
- Sernîveka civatê di Hesîçê de ye. Di her bajar û gundên mezin en Cizîrê de malikên wê **hatine** vekirin
- Divê cihanê de her tişt her mezinahî bi tifaq û yekbûnê, bi dayîna hev ber barên hev, bi hevgihana mirov û bi hevgihandina xebatên wan **hatine** pê
- Ji bona wê jî ,divêt avên sekini **bêne** herikandin, çiravan **bêne** ziwa kirin, di dorê de herçî zil stirih û giya hene **bêne** jêkirin.
- Her wekî di gelek tiştan de **têt** dîtin.
- Ev benda ha ji bona berhevdana wê **hatiye** nivîsandin. Le, berî destpêkirina berhevdanê divêt herçî esas û bingeh hene ko ji me re bûne hîm û elfabê li ser wan **hatiye** danîn .
- Armanca elfabê sekinandina dangan li ser kaxezê bi şiklan e, şikl bi herfan **tên** nîşan kirin.

¹²¹ Kovara Hawara Kurdî, Çapxana Tereqî, Şam 1932 , B.n.r, Hejmara 1, r.1-10.

- Sêhîtiya ko di her sê zarên kurdî de **hatine** çêkirin.
- Seh dikirin ko Kurdistan winda bûye ,eskerên Kurdan şikestine, revîne û serekên wan **hatine** girtin.¹²²

3.5.3.3. Di Kovara Hawarê'de Hejmara Sêyem

- Qanon du texlît in. A pêşîn, ew e ko ji mêj ve, ji berî ve, ji ber xwedê ve **hatiye** danîn.
- **Hatina** berfê, hemî bi qanonên xwedê diqewimin.
- Dîroka dinê ji me re dide zanîn ko heta niho gelek zmanên dinê **hatine** kuştin.
- Di şerê zmanan de, rihê zmanan tên standin, xurtîya dil û canên wan **tên** şkenandin ûpêta heyîna wan **tên** vekuştin
- Heçî nexweş dikevin bi destên tebîbê kurdmancî **têne** derman
- Le her du jî bi derbkê, bi liveke qelemê **tên** nivîsandin.
- Ev herfa ha di nav pirsên kurdî de gelek hindik **têt** dîtin.
- Yek bûn, yek bûn jî wek yekîfî ye. Le di yekbûnê de ew tiştên an kesên ko **hatine** lihevanîn an dayîn hev, dibe ko ne ji yek rayî bibin û rûjkê ji hev vebin û veqetin.
- Keça mîr. Di rêzika Kurdistanê de her çî torin û maqul gora rêzên xwe **dihatî** bi nav kirin.
- Nûjen, herçî ko ji nû ve **hatiye** çêkirin,çaxa çêkirin.¹²³

3.5.3.4. Di Kovara Hawarê'de Hejmara Çarem

- Ji lewra gelek ne ajot ji her duwan re xebat **hâte** dîtin.
- Ev serhoste jî ji kurdan **tête** bijartin.
- Wê gavê ev zmanê ko em pê daxêvin û ji me re şîrîn e di her derê de **bê** gotin û bihîstin.
- îrû em di zîvarîyê de ne, malên me ji destê me **hatine** standin.
- Welatê me xweyîyê zarowên xwenda bûwa heta niho, bi serê xwe dibû û bav û brayên me **nedihatî** kuştin

¹²² Kovara Hawara Kurdî, Çapxana Tereqî, Hejmara 2, Şam, 1932, r. 11-21.

¹²³ Kovara Hawara Kurdî, Çapxana Tereqî , Şam 1932 , B.n.r, Hejmara 3, r. 23-32.

- Ev kurdancên ha dengêra (o) jî wek (û) wa adetî -ko di Fransizîyê de bi (ou) **têt** nîşan kirin
- Le, paşê bi bêbextî **hatine** şikestin¹²⁴

3.5.3.5. Di Kovara Hawarê'de Hejmara Pêncem

- Ew xortên bi navê bazan Bexçeyê bihnûn û kulîlkan, xemilandî û lêkdayî. Bi frensizî je re (park) **tê** gotin
- Divêt **bê** nîşan kirin.
- Bexçeyê bihnûn û kulîlkan, xemilandî û lêkdayî. Bi frensizî je re (park) **tête** gotin.¹²⁵

3.6. Di Zimanê Kurdî de Damezirandina Avaniyê de Kiryarên Tebatî (Aktîfî û Pasîfî)

Di pêvajoya lebatî û tebatî de têkiliyek nêzik heye. Kiryar, têgehekî li ser kontrol kirina lebatî û tebatî dike ango kiryar rasterast tê kontrol kirin an jî nayê kontrol kirin. Kiryarên bi hêla kirde werin kontrol kirin 'Aktîf' e (**A**), ku neyên kontrol kirin ev jî 'Pasîf' e. (**P**). Nêzikhatiya têgeha kontrolê bi rastî mijarekî felsefî û derûnnaşî ye ji ber vê ku em li ser kiryaran lêkolîner bikin kontrol kirina kiryanan mijarekî tevlihev e . Heyînen candara li ser kiryarê dikarin bi rolekî A ,bileyzin ji bilî heyînen candara bi awayekî rolekî (P) dileyze bi vê şeklê em dikarin bibêjin ku pêvajoya kontrol kirina kiryarê bi tenê li ser heyînen candara ye ,heyînen ne candar kiryarê nikare bike û pasîf dibîne.¹²⁶

Li gor nêzikhatiya jore we kiryarên lebatî û tebatî em dikarin wek jêr de bixin nav polekî giştî:¹²⁷

1. Kirde, eger kiryarekî candar be; ji ber ku rewş û bûyîn çê dike dikeve nav koma kiryarên nayên kontrol kirin ji ber wê ev kiryar pasîf e.

Mînak:

a) Rûn sor bû.

Di mînaka jor de rûn di nav pêvajoyekî de tê sor bûn û ji ber wê sor bûn kiryarekî (P) e.

¹²⁴ Kovara Hawara Kurdî, Çapxana Tereqî , Şam 1932 , B.n.r, Hejmara 4, r. 33-42.

¹²⁵ Kovara Hawara Kurdî, Çapxana Tereqî, Şam 1932 , B.n.r, Hejmara 5, r. 43-53.

¹²⁶ Duru, *Türk Dilinde Edilgen Çatı*, r.30.

¹²⁷H.b.r, r.31.

2. Kirde, ku candar be ev kiryar dikeve koma kiryarên tên kontrol kirinê , ji ber wê kirin kiryarekî (A) e.

Mînak:

b) Nan hat xwarin

Xwarin ji hêla candarekî we tê xwarin, ji ber wê kiryarekî (A) e .

3. Çiqas kirde candar be jî kiryarên ku nayê kontrol kirin pasîf e.

Mînak:

c) Ehmed gava ku baz da ket.

Di mînaka jor de kiryara *ket-* bi hêla candarekî we pêk hatiye lê ji ber ku nayê kontrol

Heyînên Candara	Heyînên Necandar
<p>1. Kiryarên ku tên kontrol kirin :</p> <p>Mînak: Axaftin, şikandin, bersiv kirin (whd)</p>	<p>1. Kiryarên ku nayên kontrol kirin</p> <p>Mînak: Razandin, xemgînî fikirandin (whd)</p> <p>2. Kiryarên ku nayên kontrol kirin ê ku rewşa çêbûnê ye .</p> <p>Mînak : Sor bûn helandin, zingarî bûn. kirin pasîf e.¹²⁸</p>

Tablo 9: Ev tablo , di heyînên candêr û necandêr de avaniya tebatî û aktîfî û pasîfî şanî me dide..

Di mînaka jor de wek tê xuya kirin ku têgehên (A , P) têgehên mantikî û psikolojî ye , çiqas ev nêzikhatiya giştî rast be jî hinek kiryara em dikarin aktîfî û pasîfî em dikarin bi wê şiklê bidin qazanç kirin:¹²⁹

1. Kiryarek di nav rihekî be, di kiryarê de kiryar kirin di aliyê têşeyî we tê fireh kirin.

Mînak:

a) Zarok raza

b) Zarokê razand

¹²⁸ Baasanjav, Terbish, *Türkiye Türkçesi ve Halha Moğolcasında Çatı*, Doktora Tezi, Ankara Üniversitesi, 2006, Ankara.

¹²⁹ Duru, *Türk Dilinde Edilgen Çatı*, r.13.

2. Hinek kiryar hem canderîn hem jî ne canderîn.

Mînak:

a) Hesen hilkişe ser darê

Di vê mînakê de kirde , ji ber ku kiryarekî kontrolî çê dike kiryarekî (A) e.

b) Ev kuçe dertê kolanê

Di vê mînakê de kirde , ne candere ji ber ku nayê kontrol kirin kiryarekî (P)

e.

Di wan daxuyanana de tê xuya kir , kiryarên pasîfî bi piranî bûyerên sirûşte , têgehên ku di cih û dem de pozîsyona rewşa wan fîzyolojîk û psîkolojîka wan we were pol kirin gengaz e .¹³⁰

Kiryarên pasîf ê ku hestê ragihînê	Xemgin kir – birçî bûn , dil şikestî
Kiryarên pasîf ê çavdêrî ye .	Lê hatin, pêketin
Kiryarên pasîf ê ku di nav endamên ravekî de dertên holê	Hişk kirin , bêhn , rizandin
Kiryarên pasîf ê ku encama kiryarên derdixê holê	Gihîştin , qedandin
Kiryarên pasîf ê ku pêvajoya kiryarên pêk hatî	Derengmayî , lêzginî, hêdî bûn , lêz bûn
Kiryarên pasîf ê bîyolojîk	Xwîn , kuxik
Kiryarên pasîf ê ku bi taklîda denga pêk tê	Gicirdî , xurunî , şiriltî, ¹³¹

Kiryarên (A) bi piranî ji kiryarên kirinê we çê dibin , destpêkirin û berdewamiya wa lêkera , bi daxwazî û îradeya kirdeyê we giredaye.

Mînak:

a) Ehmed pirtûk xwend.

b) Neynûka Ehmed dirêj bû.

¹³⁰Duru, *Türk Dilinde Edilgen Çatı*, r.34.

¹³¹Terbish, *Türkiye Türkçesi ve Halha Moğolcasında Çatı*, Ankara

Di mînaka (a) de, *xwendin* di kontrola kirdeyê we çê dibe lê di mînaka (b) yê ne bi kontrola Ehmed we çê dibe. Di zimanê Kurdî de jî bi giştî têşeya tebatî , ê ku rewşê û kirinê nake “ *pasîf* ” e.

Mînak:

- a) Xaniyê Ehmed tebiqî ye.
- b) Xaniyê Ehmed pelişî ye.

Di mînaka jor de kiryara tebiqî û pelişî çiqas rewşa xanî bide berçav jî, kiryara tebiqî bi tenê rewşa malê dide berçav , bi xwe ev bûyer çêbuye, lê mînaka (b) de kiryara pelişî , bi hêla hinekan we hatiye çêbûn. Di mînaka (b) de em dikarin wê hevokê bi hêla (karkeran , mirovan amûran .. whd) lê zêde bikin , lê mînaka (a) de em nikarin lê zêde bikin. Di mînakên jor de hinek peyv , ji aliyê teşeyî we avaniyê diguherîne û aliyê semantîk we jî tê guherandin. Di mînaka hatiye pelîşandin ji ber ku bi hêla kesan we hatiye çêbûn hevokekî tebatî ye ji ber wê ev hevok “ *Kiryarên Tebatî* ” ye.

Wek mînakên jor de zimanê Kurdî de bi giştî rêbazekî morfolojîk kiryarên teşeyî we pêk tê. Kategoriya avaniyê bi giştî tîkiliya navbera kirde û pêveberê wê çê dibe, di hevoka de agahiyên kirde li ser pêveberê hatiye tomar kir

3.7. Di Zimanê Kurdî de Cudahiya Cureyên Avaniya Tebatî:

Di avaniya tebatî de hevpariya hemû berheman di hevokê de , bi diyarkirina kirdeyê we çêbû ye . Di hevokê de ku em bixwazin qala avaniya tebatî bikin , di ser kiryanan de teşeya tebatî heye an tuneye ji bili vê jî di hevokê de *kirdeya rastî* heye an jî tune ye an jî bi çî şiqelê tê xuya kirin , gerek em li ser biseknin.

1. Avaniya tebatî de kiryarên ku şexsî diyarin
2. Avaniya tebatiyên ku kiryanan de ku şexs nediyarîn.

3.7.1. Di Avaniya Tebatî de ê ku Şexsê Wan Nediya:

Di avaniya tebatî de kiryarên di nediyar de , kirde bi tenê di bin bandora pêveberê de dibîne û di hevokê de kiryarên ku hatiye çê kirin ne diyar e. Avaniya tebatî de bi piranî di kiryarên gerguhêz de bi hêla peyveka “ *hat-* ,*hatin* .. ” çê dibe ev taybetmendî bi piranî di zimanê Kurdî de çê dibe lê gava ku em zimanê Tirkî

mêze bikin em taybetmendiyeke wisa nabînin. berya ku em mijarê baş fehm bikin em li ser kirdeya rêzimanî biseknin ê baş be .¹³²

Kirdeya Rêzimanî:

Di hevokê de ê ku ne kiryarê dike ê ku di bin bandora kiryarê de dibîne wek kirdeyek tê hesabandin. Kirdeya rêzimanî çiqas em hevokekê de wek hemanek bihesibînin jî ê ku kiryarê dike ne diyar e em ê bi alikariya nezikhatiyekê devtîprêzî û semantîk we derxin hole.

Bi giştî di avaniya tebatî de ê ku kiryarên wan ne diyarin bi wê şîqlê tê formîze kirin:

Kirdeya Rêzimanî + Hemanên din + Pêvebera Avaniya Tebatî.

Mînak:

a: Helbest hat xwendin.

Hat xwendin: Pêveber (gerguhêz , tebatî)

Helbest: Kirdeya rêzimanî.

b: Helbest duh şev bi kelecânî hat xwendin.

Hat xwendin: Pêveber (gerguhêz, tebatî)

Helbest: kirdeya rêzimanî.

Bi kelecânî: hemanên din .

3.7.2. Gerguhêz, û di Avaniya Tebatî de ê ku Şexsê Wan Nediya:

Gerguhêz û di avaniya tebatî de wek di beşên jor de jî me behsa tebatî kiribû , pêveka tebatî gava ku were ser hevokekê gerguhêzî û di wê hevokê de kiryar bi hêla ki we hatiye çêkirin ev hevok wek kirdeyekê rêzimanî derkeve pêşya me , ango di

¹³²Duru, *Türk Dilinde Edilgen Çatı*, r. 56.

hevokên gerguhêz de li ser kiryara ‘‘ hat- , hatin- whd. ‘‘ bê ev kirde di hevokê de kirde çiqas ne kirdeyek ne rastbe jî mîna kirdeyekî heman tê xuya kirin.¹³³

Mînak:

Pol duh hat boyax kirin.

Hat boyax kirin: Pêveber (gerguhêz , tebatî)

Pol: kirdeya rêzimanî.

Duh: hemanên din .

Ku em bixwazin di avaniya tebatî de kiryarên nediyar baş fehm bikin em çavek bavêjin ev polkirina jêr ê gelek başbibe.

3.7.3. Gerguhêz , û di Avaniya Tebatî de Cureyên ku Kirde Nediyar :

Di cûreya ku kirde nayê nîşandan de , digel ku mirov dikare kirdeyek wek kirdeya mantikî de tevlihevokê bike , di rewşên ku kirde nayê zanîn , girîng nayê dîtîn an jî tê veşartin de di hevoksaziya hevokê de mirov dikare kirdeyek nîşan nede.¹³⁴

Mînak:

- a) Wî dane beşeke din (ji aliyê rêvebir we)
- b) Duh bişev xanî û tirimpêl hatine şêlandin (ji aliyê kesên ne diyar ve)
- c) Dê birayê wî rêbikine devreyî welat (ji aliyê wezaretê perwerdehiyê ve)

¹³³Duru, *Türk Dilinde Edilgen Çatı*, r.54.

¹³⁴H.b.r, r.58.

3.7.4. Di Avaniya Tebatî de Kiryarên ku bi Xwe (Serê) Çê Dibin

Kiryarên ku bi xwe çê dibin, kiryarên pasîfin di bin bandoreyekê dimînin û bi xwe dertên holê :¹³⁵

a) Di bûyerên xwezayî de (baran ,birûsk , bablîsok whd.) de dertên peşya me.

Mînak:

Baran dibare.

Birûsk li darê xist.

Bablîsokek , li ser bajarê me çêbû.

Ev mînakên jor de ku me dabû , bi tenê serê xwe çê dibin , ji ber wê pasîfin an jî tê hesibandin.

b) Di endamên navekê an jî di endamên laşê mirov de bi bê îradeyekê (xwêdan , hêstir) jibilî wê derûnnasiya mirov de (tirs, wêrin whd.) di biyolojiya û fîzyolojiya mirov de rewşek wek bi awayekê refleksi pêk tê.

Mînak:

Roj bi roj , rûyê hevalê min zer dibe.

Di çavên Zelal de hêstir dibarîn

Ev mînakên jor de ku me nîşan dabû ev bûyerên ku tên ser mirov bê îradeya mirov çê dibin.

c) Di rewşên necandêr de bûyer bi serê xwe dikeve halekê din.

Mînak :

Hêsin roj bi roj, zingar dibe.

¹³⁵Duru, *Türk Dilinde Edilgen Çatı*, r. 59.

Şîrê di sarincê de xirabû bû.

Bi rastî hem di biyolojiya mirov de hem jî di derûnnasî û xwezayî de bûyer bi serê xwe çênabe . Candar û necandêr di bûnya xwe de gava ku diguhere elbet li gor sedemê tê guhertin lê ev sedem di hevoka de nayên diyar kirin.

Mînak :

Xanî xedimand.(ji ber ku kevn bû)

Mast xirabû: (ji germê mast xirabû)

3.7.5. Gerguhêz, û di Avaniya Tebatî de Rewşên Pêşniyarên Xweser

Ji nîqaşek nerazîbûn, kesek wek xwerû (rastînek nû) ava dibe lê semantîkên modela avahiyê ya pêdivî ye, ku semantîk bi heman yekê re ye ku kîjan carinan bêhtir germî ye, bi vî awayî tê çêkirin:

Subject(kirde) / tawanbar (kiryar) (yekîneya ku ji hêla çalakiyê ve tête bandor kirin ku bingeha çalakiyê tête kirin)	Bireserên(têrkerên) din	Lêkerên (kiryarên) Avaniya Tebatî
---	-------------------------	-----------------------------------

Di avahiyên wisa de, darizandina mijarê kirde û kiryar, ku ew e, lîstikvanê çalakiya bingehîn, bi gotinên di forma formê de bi peyva 'bi hêla, bi saya, ji aliyê' ve neyê diyar kirin. Di avahiyeke pêdawî ya ku 'li ser semanticayê', têgehek kirde yî mijarê mijara yekînek e ku ji pirs û neheqî bê dûr e, ji ber ku kirde mijara wê mijara ku mijara bandor dike, an jî di heman demê de, encamên ku di mijara mijarê de ye. Ji bo vê yekê kirde, ew hewce ne ji bo mijara ku weke 'bi hêla bi saya', ji hêla 'kesî ve di avahiyeke taybet de (rasteqîn) devereke pêdivî ye.

A) Serê mêvanên ku li ser kincê rûniştin wegerî muxtarên ku ser sedîrê rûnistiye.

Tevî ku ew ji vê çarçoveyê ve tê fêmkirin ku serekên A- Serê veguherînan zilaman, damezirandina cilê wek ku serê serê çolê hatin şandin, ne rast û logîk e. Pêdivî ye ku girîng bikin ku ev encam e ku serê serek xurt kirin. Di zelalek zelal de, xala vê focal e ev e ku 'serê xwe veguherandin'

B) Her cih bêdeng bû, derxistina dengan hat birîn.

C) Li rûyê vî dostanî dihat xwendin.

C) Laşê vî ji agirê dihedimî.

D) .

Hevoka B yê de pirs nabe ku, kî dengên wî kêma dike ,lê napirsin û lêkolîn nakin. Di wî hevokê de birrîna lêkerê dengên kirdeyê rewşa xilazbûnê yê de encamê dide.

Avahiyên derheqê ku rewşek rapor dikin, kirde nedihat pirskirin û tenê têgihîştina avahiyê ya rewşê yê hatiye armanckirin

3.8. Di Zaravayên Kurdî de Avaniya Tebatî

3.8.1. Di Zaravaya Kirmanca (Zazakî) de Lêkerên Tebatî :

Lêkerên tebatî, lêkerên kirdeya ve ne diyarbin. Di van lêkerên tebatî de peyvekên wek kirde xuya dibin lê ne kirdeyên rastîn vek kirdeyên xwedîgiravî tê hesibandin. ku kirdeya wan a bera ne diyar be ji wan re tê gotin lêkerên tebatî. An jî, ji ber çalakiya ku tê kirin eger bandor li kirdeyê bibe ji van çeşîdên lêkaran rê lêkerên tebatî tê gotin.

Di lêkerên tebatî de kar ji aliyê kê ve tê kirin ne diyar e .ev rewş bi alîkariya lêkera ‘‘ ameyene ‘‘ ê çê dibe. Lêkera bingehîn tevî raderê tê bikarabîn. Qertafên demê û cinavkên kesîn tînin ser ‘‘ ameyene’’ e. Lêkerên tebatî de , kirde ne diyar e ,

gava ku em li bireserê pirs bipirsin û bersiv hilnegrin ev lêker tebatî ye. û di hevokên gerguhêz de wate ya ‘‘ ameyene ‘‘ ê dide¹³⁶

Di hevokên gerguhêz de wate ya ‘‘ hatin ‘‘ ê dide , di zaravaya Zazakî de ‘‘ ameyene / ameyîş,’’ di kirmancî de bi saya pêveka ‘‘ hatin ‘‘ ê çê dibe.¹³⁷

Kirmanca (Zazaca)	Kurmancî
(<i>ameyene +lêker</i>)	(<i>hatin+ lêker</i>)
ameyene girewtene	hatin girtin
ameyene kerdene	hatin kirin
ameyene kiştene	hatin kuştin
ameyene kuştene	
ameyene şiknayene	hatin şikandin
ameyene şikitene	
ameyene şutene	hatin şuştin
ameyene wendene	hatin xwendin ¹³⁸

Mînak:

- Ber *ame girewtene* (Derî *hat* asê kirin)
- Karêdo nîyanên caran *nêameyo kerdene* (Karekî wisa *nehatiye* çê kirin)
- Lajê apê ey *ameyo kiştene*. (Kur apê wî *hatiye* kuştin)
- Zerriya may û pîyan nêna *şiknayene/şikitenene*. (Dilê dê û bav *nayê* şikandin)
- Ez ameya keye ke kincêqilêrinî pêro *ameyene şutene*. (Gava ku ez hatim malê kincên nepaqij *hatibû* paqijkirin)
- No senê destnuşte yo ? *nêno wendene*. (Ew nivîs *nayê* xw

¹³⁶ M.Malmîsanîj, *Kurmanca ile Karşılaştırılmalı Kirmanca (Zazaca) Dilbigisi*, Weşanxaneyê Vateyî, Stenbol 2015, r.276.

¹³⁷ H.b.r, r. 277.

¹³⁸H.b.r, r. 278.

3.8.1.1. Di Zaravaya Zazakî de Forma Lêkera Hatîn (Ameyene) ê.

Bireser nêr be

Dema niha	Do yo êno şîmitene
Hevpara forma Dema niha / Dema bê / Dema fireh.	Do êno şîmitene
Dema boriya diyar	Do ame şîmitene
Dema boriya nediyar	Do_amo şîmitene
Çîroka dema boriya nediyar	Do amebî şîmitene

Bireser mê be

Dema niha	Awe yo/ya êna şîmitene
Hevpara forma Dema niha / Dema bê / Dema fireh.	Awe êna şîmitene
Dema boriya diyar	Awê amê şîmitene
Dema boriya nediyar	Awê ama şîmitene
Çîroka dema boriya nediyar	Awê amebî şîmitene

Bireser pirjimar be

Dema niha	Sayê ênê werdene
Hevpara forma Dema niha / Dema bê / Dema fireh.	Sayî ênê werdene
Dema boriya diyar	Sayî ameyî werdene
Dema boriya nediyar	Sayî amê werdene
Çîroka dema boriya nediyar ¹³⁹	Sayî amebî werdene

¹³⁹ M.Malmîsanîj, *Kurmancca ile Karşılaştırılmalı Kirmancca (Zazaca) Dilbilgis*, r. 279.

3.8.1.2. Di Zaravaya Zazakî de Forma Lêkera Bê Hatîn (Bê Ameyene) ê.

Kirde nêr be

Dema niha	Do yo şimino
Hevpara forma Dema niha / Dema bê / Dema fireh.	Do şimîno
Dema boriya diyar	Do şimîya
Dema boriya nediyar	Do şimîyp
Çîroka dema boriya nediyar	Do şimiyabî

Kirde mê be

Dema niha	Awe yo şimîna
Hevpara forma Dema niha / Dema bê / Dema fireh	Awe şimîna
Dema boriya diyar	Awe şimîye
Dema boriya nediyar	Awe şimîya
Çîroka dema boriya nediyar	Awe şimîyabî

Kirde Pirjimar be

Dema niha	Sayê werînê
Hevpara forma Dema niha / Dema bê / Dema fireh	Sayî werînê
Dema boriya diyar	Sayî werîyayî
Dema boriya nediyar	Sayî weriyê

Çîroka dema boriya nediyar	Sayî werîyabî
----------------------------	---------------

Di hinek lêkerên tebatî de tebatî vek formekî din jî dikare çê bibe ev jî di zaravaya Zazakî de bi saya mastara ‘-îyayene’/ ‘-îyayîş’, di Kurmancî de bi saya peyva ‘- îyan’ an jî kurtasiya vê peyva îyan ê bi peyvaka dawî ‘-în’ ê çê dibe.¹⁴⁰

Mînak

Kırmancca (Zazaca)	Kurmancî
-îyayene/ - îyayîş)	-îyan/ -în
Anciyayene / kirişiyayene/ kirêşiyayene	Kişyan / kişîn hatin kişandin
Diriyayene	Diriyan / dirîn/ çiriyan / çirîn
Qefiliyayene	Qefilîyan / qefilîn / qufilîn/ qifilîn
Qesiyiyayene	Qusiyân / qusîn
Rijiyayayene/ rişiyayene	Rijiyân/ rijîn
Şidiyayene	Şidiyan/ şidîn
Şikiyayene	Şikiyan / şikîn

Mînak:

- Roja hîrêyine ekser Koyê Dêrsimî ra *anciyeno* we. (Di roja sêyem de leşker paş vekişîn)
- Hendayê çî – mî çitur *kirişiyeno* ? (Ewqas têkber were bar kirin)
- Şalvarê to çira her ca ra *dirîyayê* ? (Şalvarê te çima ewqas fitiqî ye)
- Şarî de pere çîn o, coka xeylê dukanî *qefilîyayî* . (deriyê firoşgehan hatiye asê kirin)
- Şîtê pêroj *qesîyayo*. (Şîrê çêlekê hatiye qusandin)

¹⁴⁰ Munzur Çem, *Türkçe Açıklamalı Kırmancca (Zazaca)*, Weşanxaneyê Deng, Stenbol, 2013, r. 140.

- Dêse qonaxê Hesên Axayî *rijîya* ame war. (Diwara konaxa Hesên Axa hatiye xira kirin)
- Domano sawî caran winda *şidiyeno* .
- No senê *heskerdîş* o ?
- Zerrî zaf lez *şikîyena*. (Dil zû tê şikandin)

3.8.1.3. .Di Zaravaya Zazakî de li gor Koka Forma Lêkerên Aktîf û Pasîf (Goreyê Koka Karî Formo Aktîf û Pasîf)

Koka Lêkeran	Aktîf	Pasîf
Lêkerên ku di dema borî de bi pêveka “ a ” diqedin	Dezayene Mosayene	Dezîyayene Mosîyayene
Lêkerên ku di dema borî de bi pêveka “ d ” diqedin	Vêrdene Wedardene	Vêrîyayene wedârîyayene
Lêkerê ku di dema borî de bi pêveka “ na ” diqedin	Deznayene Mosnayene nehêrînayene	Deznîyayene Mosnîyayene Hêrnîyayene Birnayene Birnîyayene
Lêkerên ku di dema borî de bi pêveka “ i ” diqedin	Bîyene Bîyayene Şiyene	Biyîyene Şiyîyene Doşiyayene ¹⁴¹
Lêkerên ku di dema borî de bi pêveka “ t ” diqedin	Ditene şimitine	¹⁴²

Di zimanê devkî de ev lêkerên kum e jor de qala wan kir , di formekî pasîf te ne diyarin , ev tenê wek kum e jor de diyar kir bi saya peyva “ *ameyene* ” tê tebatî kirin

3.8.2. Di Zaravaya Soranî de Lêkerên Tebatî :

¹⁴¹ Çem, *Türkçe Açıklamalı Kırmanca (Zazaca)*, r. 142.

¹⁴² H.b.r, r. 142.

Di Kurmanciya Başûr de bi taybetî bi zaravaya soranî bi pêveka dawî de xilas dibe û bi vê sedemê bi pêveka ‘-ran’ ê avaniya tebatî bi dest dikeve ku em li, ser tabloyekê nîşan bidin ê baştir bibe.¹⁴³

Kurmancî	Kurmanciya Başûr (Soranî) -îran / -ran
Hat birîn	Birra
Hat xuya kirin	Niwên ra / nwên ra
Hat nivîsandin	Nûsira / nûsra
Hat gotin	Witira / gur ra

Mînak:

Soranî

Xanî şordiran
 Rojname xwênran
 Ew debirdirên
 Şûtî dejmêdiran
 Goranî dewûtiran
 Zor gewre kirawe
 Renciyan dedizrêt
 Name nûsran
 Dep xet kêşrawin
 Agir kujra
 Mesûd lêdira
 Pencere şkêndira
 Piyan pak kirawe

Kurmancî

Xanî **hat** şuştin
 Rojname **hat** xwendin
 Ew ê **bên** birîn
 Zebeş **dihatî** jimartin
 Stran **dihatî** gotin
 Çêlek **hatiye** mezinkirin
 Keda wan **tê** dizîn
 Name **hatiye** nivîsandin
 Dep **hatibû** xêz kirin
 Agir **hat** tefandin
 Mesûd **hat** qutandin
 Pace **hat** şikandin
 Piyan **hatiye** paqijkiri

¹⁴³ M. Malmîsanîj, *Kurmancca ile Karşılaştırılmalı Kırmancca (Zazaca) Dilbigisi*, r. 281.

3.8.3 Di Zaravaya Goranî de Lêkerên Tebatî :

Kurmancî	Zaravaya Goranî (Hewramî) (- (î) yay
Hat birîn	Biryay / birîyay
Hat dan	Diryay/ dirîyay
Hat jêkirin	Diryay/ dirîyay
Hat kuştin	Kuşyay/ kuşîyay
Hat nivîsandin	Nûsyay/ niwîsîyay
Hat gotin	Waçyay/ waçîyay ¹⁴⁴
Hat xwendin	Wanîyay

Mînak:

Goranî

Yaneke şorya
 Ronameke winyawê
 Ane / Anê mebirryo
 Henyekê jimaryênê
 Goranyekê wîçyênê
 Gewekê gewrê biyênê
 Zahmetkeşa fewtyay
 Nameke niwîsyan
 Texteke rûş biyebê
 Awreke mirkyare
 Mesûd diryaşene¹⁴⁵

Kurmancî

Xanî **hat** şuştin
 Rojname **hat** xwendin
 Ew ê **bên** birîn
 Zebeş **dihatî** jimartin
 Stran **dihatî** gotin
 Çêlek **hatiye** mezinkirin
 Keda wan **tê** dizîn
 Name **hatiye** nivîsandin
 Dep **hatibû** xêz kirin
 Agir **hat** tefandin
 Mesûd **hat** qutandi

¹⁴⁴Malmîsanîj, *Kurmanca ile Karşılaştırılmalı Kırmanca (Zazaca) Dilbigisi*, r. 282.

¹⁴⁵ Ev mînakên jorî, Ji Ferîba Keremî hatiye hilgirtin, xwendekar e li Îranê bajarê Mêrîwanê dijî.

Kurmancî	Zaravaya Lurî (îyan)
Hat kuştin	Kujîya
Bavê min hat kuştin	Bawugim kujîya ¹⁴⁶

3.9. Di Deman de Kîşandina Avaniya Tebatî

3.9.1. Di Dema Boriya Diyar de Avaniya Tebatî (hat... / nehat...)

Di dema boriya diyar de pêvek bi serê xwe xwerû ye bi hêla ‘‘ hat / nehat’’ çê dibe.

Erenî (hat)	Neyinî (nehat)
Ew hat birin	Ew nehat birin
Tu hatî birin	Tu nehatî birin
Ew hatin birin	Ew nehatin birin
Kovar hat xwendin	Kovar nehat xwendin
Pirtûkek hat xwendin	Pirtûkek nehat xwendin
Lênûskan hatin nivîsandin.	Lênûskan nehatin nivîsandin. ¹⁴⁷

3.9.2. Di Dema Boriya Nediya de Avaniya Tebatî (hatiye... / ne hatiye)

Erenî (hatiye)	Neyinî (nehatiye)
Ew hatiye birin	Ew nehatiye birin
Ez hatime birin	Ez nehatime birin
Ew hatine birin	Ew nehatine birin
Kovar hatiye xwendin	Kovar nehatiye xwendin
Kovar hatine xwendin	Kovar nehatine xwendin
Kovar hat xwendin	Kovar nehatiye xwendin
Kovarin hatine xwendin	Kovar nehatine xwendin

¹⁴⁶ Malmîsanîj, *Kurmancca ile Karşılaştırılmalı Kırmancca (Zazaca) Dilbigisi*, r. 279.

¹⁴⁷ Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbigisi (Kurmancî Lehçesi)*, r.104.

3.9.3. Di Dema Niha de Avaniya Tebatî (tê ... / nayê...)

Erenî (tê)	Neyinî (nayê)
Ew tê birin	Ew nayê birin
Tu teyî birin	Tu nayê birin
Ew tên birin	Ew nayên birin
Kovar tê xwendin	Kovar nayê xwendin
Kovar tên xwendin	Kovar nayên xwendin ¹⁴⁸

3.9.4. Di Dema Boriya Domdar de Avaniya Tebatî (dihat... / nedihat)

Erenî (dihat)	Neyinî (nedihat)
Ew dihat birin	Ew nedihat birin
Tu dihatî birin	Tu nedihatî birin
Ew dihatîn birin	Ew nedihatîn birin
Kovar dihat xwendin	Kovar nedihat xwendin
Kovar dihatîn xwendin	Kovar nedihatîn xwendin
Kovarek dihat xwendin	Kovarek nedihat xwendin
Kovarin dihatîn xwendin	Kovarin nedihatîn xwendin ¹⁴⁹

3.9.5. Di Dema bê de Avaniya Tebatî (ê bê... / ê neyê...)

Erenî (ê bê)	Neyinî (ê neyê)
Ew ê bê birin	Ew ê neyê birin
Ez ê bêm birin	Ez ê neyêm birin
Ew ê bèn birin	Ew ê neyên birin
Kovar ê bê xwendin	Kovar ê neyê xwendin
Kovar ê bèn xwendin	Kovar ê neyên xwendin ¹⁵⁰

¹⁴⁸ Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbigisi (Kurmancî Lehçesi,)*, r. 41.

¹⁴⁹ H.b.r, r. 104.

3.10. Di Zimanê Kurdî 'de Guherandina Avaniya Tebatî.

Di beşa duyem de wek ku me behs kiribû jî , guherandina avaniya wek perqalekê çê dibe, zimannasên me berya ku avaniyê guherînê wan pirsên jêrin pirsin :

1. Ji bo çi em avaniya diguherînê?
2. Armanca guherandina avaniyê çi ye?
3. Gava avaniya diguherînê em nix didin hemanan an fonksiyona hemanan diguherînê? ¹⁵¹

Di zimanê me de çar hêman hene

1. Pêveber
2. Kirde
3. Bireser
4. Hoker

Di hevokekê de rêzbûna hemanê ku em biguherînê em dikarin axaftinê li gor armanca bal kişandinê û girînga rêzbûnê biguherînê, lê di her ziman de du hêmanên bingeh hene ; *kirde* û *pêveber e*. Ji ber vê li ser guherandina kirdê û pêveberê , axaftin li gor armancê bi avahiyeke fonksiyonê bi hêsantî were guherandin. ¹⁵²

Di zimanan bi giştî de bi du rêya we çê dibe :

- a) Guherandina avaniyê
- b) Guherandina rêzbûna hemanê

Mînak

Pêpelûka 1.

- a) **Bahar pirtûk xwend.**

Xwend : *Pêveber , Avaniya lebatî , (Girînga hemana yekemîn e)*

Bahar: *Kirde , (Girînga hemana duyemîn e)*

Pirtûk : *Bireser e , (Girînga hemana sêyemîn e)*

¹⁵⁰ Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî Lehçesi),* r. 105.

¹⁵¹ Duru, *Türk Dilinde Edilgen Çatı,* r.13.

¹⁵² H.b.r, r.15.

Di hevoka jor de bireser çiqas nêzî pêveberê be jî di vê hevokê de kirde bi girîngiya rêzbûnê de berya bireserê hatiyê .

Pêpelûka 2.

b) Hineka pirtûk xwend.

Xwend : , *Avaniya lebatî , (Girînga hemana yekemîn e)*

Hineka: *Kirde (Girînga hemana duyemîn e)*

Pirtûk : *Bireser e , (Girînga hemana sêyemîn e)*

Di mînaka hevoka jor de kirde çiqas girînga duyemîn de be jî girînbûna wî ya rêzê hinekê kêmbûye. Ji ber ku di vê hevokê de ê ku nan xwariyê di aliyê zanistê we pir ne girîng e, ' hineka ' nan xwariye û ev hinek ê dî pir ne girîng e , rêzbûna girîngê û vurgu hêdî hêdî tê li ser bireserê , ê dî di vê hevokê de nan bi saya kî we hatiye xwarin ne girîng e ya herî girîng nan hatiye xwarin.

Pêpelûka 3.

c) Pirtûk xwendin

Xwendin : , *Avaniya lebatî , (Girînga hemana yekemîn e)*

Pirtûk : *Bireser e , (Girînga hemana sêyemîn e)*

Wan : *Kirdeya veşartî*

Di vê mînaka jor de kirde, hem bi aliyê wate yê û hem jî ji aliyê gramatîkal we girîngbûna xwe wenda dike, bi tenê di dawîya hevokê de li ser pêveberê pêveka pirjimariyê hatiye ser (-in) ji ber wê pirjimariyekê bêdiyar li ser kirdeyê tê hinartin bi vê şiklê ê ku nan xwariyê ji bo gotarbêja ne balkeş e û ne girîng e .

Pêpelûka 4.

d) Pirtûk hat xwendin .

Hat xwendin : *Avaniya lebatî , (Girînga hemana yekemîn e)*

Pirtûk : *Kirdeya xwedîgiravî (Girînga hemana duyemîn e)*

Di wê hevoka dawî de ,bi guherandina avaniyê re avahiya rêziman hat guherandin , ê dî nan di pozisyona bireserê we hilkişiya ye pozîsyona kirdeyê. Nan , di aliyê rêzimanê de kirde ye lê kiryar jî hêla hinekan we hatiye çê kirin , ji ber wê ji aliyê zanistina zimên de em dikarin wê şîrovê bikin ; kiryarê ku pêk nehatibe jî , sîrpi ji ber ku girîngbûn dibîne hinek hêman ji aliyê rêzimanê we hilkişin kirdeyê û hinek

hêman jî dikarin werin jê birin wek tê xuya kirin, ji avaniya lebatî derbasê avaniya tebatîyê karê guherandina avaniyê ye mînakê jor de di pêpelûka yekemîn de bireser, di pêpelûka çaremîn de hatiye pozîsyona kirde yê.

Di hevokê de hêmanên girîng hene ev jî di hevokê de xala balkeşî ye ,xala balkeşî şanî me dide ku em çawa mêze dikin û şîrove dikin. Armanç ev e ku nîrxandina ku em didin hevokê nîşan bidin.

Di gotinekê de an jî metnekê de ne ê ku kiryarê pêk tîne ê ku pêk tîne ku em derxin holê . Avaniya tebatî bi devtîprêzîkî bi aliyê fonksiyonî wê dertê peşya me ango di hevokê de ku em buyer an jî kiryar pêş bixwin em ê mecbûr bibin ku avaniya tebatî kar bînin.

3.11. Li gor Herema Karanîna Avaniyên Tebatî

3.11.1. Di Herema Bedlîsê de Karanîna Avaniyên Tebatî

Emine KAPLAN

64 Salî ye , xwendina wê nîn e , di piçûkanî de hetta îro li Hîzanê dijî.

Erênî	Neyînî
Pencere hat temîrkirin	Mal nehatiye şuştin
Firaq hatîn şuştin	Stran nehatiye gotin
Mal hat paqijkirin	Mektup nehatiye nivîsandin
Kitep xwendin	Agir nehatiye tefandin
Ehmed hate kuştin	Ew nehatiye birin
Derî hate vekirin	Xwarin nehatiye çêkirin
Erebe hate firotin	Zarok nehatiye dîtin
Ders hatine çêkirin	Top nehatiye teqandin
Xwarin hatine çêkirin	Dê ew bête birin
Wê birin	Pêlavê min nehatiye dizîn.

Neslîhan KAPLAN

35 salî ye , niha li Tetwan ê mamostefî dike, Tetwan / Bedlîs

Erênî	Neyînî
Pencere hatibu tamirkirin	Xanî nehatiye bakışkırın
Fıraç hat şuştin	Helbest nehatiye gutin
Mal hatibû paqijkirin	Mektup nenivisandine
Kiteb hat xwendin	Agîr nehatiye wekuştin
Ehmed hat kuştin	Ew nehateye birin
Derî hat vekirin	Xarin nehateye çekirin
Erebe hatibu firotin	Zarok nehateye ditin
Ders hatine çekirin	Pelawamî nehateye dızın
Xwarin hate çêkirin	Gog nehateye tekan

Radife DURMUŞ

21 salî ye li Bedlîsê hatiye dinê , niha bi malbata xwe re li stanbolê dijî û li xwendingeha Amedê beşa wejeya Tirkî dixwîne

Erênî	Neyînî
Cam hat çêkirin	Mal nehate şuştin
Firakan hatin şuştin	Stran nehate gotin
Hanî hate paqijkirin	Zarf nehate nivîsin
Kitap hate xendin	Agir nehate temirandin
Ahmet hate kuştin	Ew nehateye birin
Der webû	Xwarin nehate çêkirin
Arabe hate firotin	Zarok nehateye dîtin
Ödev hate çekirin	Pêlawa min nedizîne
Xwarin hate çêkirin	Top neteqiye
Ew hate birin	Ew nehat birin

3.11.2. Di Herema Colemergê de Karanîna Avaniyên Tebatî

Zehferan Yılmaz

64 salî ye , xwendin û nivîsandina wê nîn e , li Geverê dijî.

Erênî	Neyînî
Pencere daye çêkirin	Ahî nehatire şuştin
Aman hatine şuştin	Laje natiye gotin
Ahi berhevkirin	Kaxez nehatiye nivîsin
Kitap xondiye yê	Agir nehatiye temirandin
Ehmed hatiye kuştin	Ev nebirene risq neçêkirine
Der vekirine	Piçuk neditine
Erebe firotine	Pelava min nedizîne
Ders hatiye kirin	Top nepikiye
Risq hatiye çêkirin	We nebirin
Ev birine	

Evin YILMAZ

26 salî ye , li Enqerê li ser Felsefeyê lîsansa bilind dike, niha li Geverê li cem malbata xwe dijî.

Erênî	Neyînî
Pencere dane çêkirin	Mal nehatiye şuştin
Aman hate şuştin	Laje nehatiye gotin
Mal hatiye temizkirin	Zerf nenivisine
Kitap hatiye xwendin	Agir neteminandine
Ehmed kuştine	Ev nebirene
Der vekiye	Îşq neçêkirine
Erebe firotine	Piçuk nehatiye dîtine
Ödevê çekirine	Pêlava min nedizine
Risqên çekiriyê	Top nepikandine
Ev ê birine	Ev nebirene

3.11.3. Di Herema Amedê de Karanîna Avaniyên Tebatî

Alî KÜÇÜKKAYA

28 salî ye , li navçenda Çêrmikê hatiye dinê niha li Farqînê mamostetî dike.

Erênî	Neyînî
Pace hat çêkirandin	Mali paqêj nekiriye
Fireh hat şuştin	Stran negotiye
Mal paqijkirin	Mektup neyazkiriye
Pirtûk hat xwendin	Ar wenesandiye
Ahmet kuştin	Ev nebirni
Derî vebû	Şiv çê nekiriye
Araba hat firotandin	Sebî neditiye
Ödev hat çêkirin	Sola min nerewandiye
Xwarin çêkirin	Top netekiyaye
Ew birin	Ew nebirin

Vasif YEŞİLYEL

43 salî ye , li Farqînê hatiye dinê, niha li Farqînê dergevanî dike.

Erênî	Neyînî
Pacê çekirin	Male neşuştine
Firaka şuştin	Klama negotin
Male paqijkirin	Mektup yaznekirin
Kitabê xwendin	Agir netemartin
Ehmed kuştin	Wi nebirin
Deri vebu	Nan neçekirin
Erebe firotin	Lastika nedizin
Ödev çekirin	Sebiya neditin
Nan hazirkirin	Topê netaqandin
Wi birin	Wi nebirin

Azad DİKER

27 salî ye , li Farqîne hatiye dinê , niha li farqînê karker e

Erênî	Neyînî
Pencere tamîrbû	Xanî nehatiye şuştin
Firaq hat şuştin	Stran negotiye
Mal paqijbû	Mektup nehatiye nivisandin
Kitab hatiye xwendin	Agir nehatiye temirandin
Ehmed hat kuştin	Nan çênebûye
Derî vebû	Sebî nehatiye dîtin
Erebe hat firotin	Ayakkabî nehatiye dizîn
Ders hat çêkirin	Top nehatiye teqandin
Nan hazirbû	Nan nehazire
Wi birin	Wî nebirine

Cenap CEMİLOĞLU

25 salî ye li navçenda Çinarê dijî , niha li ser ezmûna zaningehê dixebite , bi malbata xwe re li Çinarê dijîn.

Erênî	Neyînî
Pace tamîr kirin	Xanî nehatiye şuştin
Firak hatin şuştin	Klam nehatiye gotin
Xanî hat paqijkirin	Mektup yaznekiriye
Kîtap hat xwendin	Agir nehatiye wemirandin
Ahmed hat kuştin	Wî nebirin
Derî vebû	Şîv nehatiye çêkirin
Erebe hat firotin	Gede nedîtin
Ödev çêbûn	Sola min nehatiye dizîn
Şîv hazire	Top neteqiya ye
Wî birin	Wî nebirin

3.11.4. Di Herema Meletî de Karanîna Avaniyên Tebatî

Dilek APAK

29 salî ye li eslê xwe Muşî ye lê di piçûkaniya xwe de li Meletyayê dijî , niha bi malbata xwe re dijî , li wir mamostetî dike.

Erênî	Neyînî
Cam hat çekirine	Mal ne hatiye şuştine
Firax hat şuştine	Kılam nehatiye gotinê
Mal hat paxîşkandinê	Mektup nehatiye nivisandinê
Pirtuk hat xwendinê	Agir nehatiye reşkirinê
Ehmed hat kuştinê	Ew nehatiye birinê
Deri webû	Nan nehatiye çêkirine
Arabe hat firotandinê	Zarok nehatiye ditinê
Ödev hat çêkirinê	Potin nehatiye dizinê
Nan hat çêkirinê	Top nehatiye texandinê
Ev hat birine	Ev nehat birinê.

3.11.5. Di Herema Mêrdînî de Karanîna Avaniyên Tebatî

Şükran ALGÜL

29 salî ye , li navçenda Qoserê hatiye dinê , niha li wir mamostetî dike û li wir dijî

Erênî	Neyînî
Şibake çebû	Xanî nehatiye şuştin
Firax hatin şuştin	Helbest nehatiyi gotin
Xanî paqij bû	Name nehatiyi nivîsandin
Pirtük hat xwendin	Agir nehatiyi wemirandin
Ahmet hat kûştin	Wî nebirinî
Derî vebû	Xarin çênebûyî
Êrebe hat firotin	Sêlek neditînî
Ödev hat çêkirin	Solamin dizîne
Xarin hazirbûn	Top neteqandinî
Wî birin	Wî nebirin

Zehra ALGÜL

55 salî ye , li Qoserê dijî , bermalî ye , xwendin û nivîsandina wê heye lê ne çûye dibistanê.

Erênî	Neyînî
Şibake çêkirin	Xaniye xwe neşûştiye
Firax şuştin	Dirok negotiye
Mal paqijkir	Mektup yaznekiriye
Kitap xwend	Agir wenekitiye
Ahmet kuştin	Weya neaniye
Derî vekirin	Xarin çenekiriye
Arabe firotin	Zarok peyda nekirin
Ödev çêkirin	Solême nehatin dizin
Xwarin çêkirin	Top neteqiye
Ewiya bir	Weya nebirine

Hafzullah ÖZMEN

38 salî ye li navçenda Mêrdînê li Niseybînê dijî , karê firoşgehî dike .

Erênî	Neyînî
Pace tamîr kirin	Mal neşûştiye
Firaq şuştine	Stran nehatiye gotin
Mal paqijkirin	Name nehatiye nivîsandin
Pirtûk xwendin	Agir nehatiye tefandin
Ahmet kuştin	Ew nebirine
Derî vebû	Xwarin çênebuye
Arabe firotin	Zarok nehatiye dîtin
Xwarin amade ye	Zakol nedizine
Ödev çêkirin	Top neteqiya ye
Ew birin	Wi nebirin

3.11.6. Di Herema Qersê de Karanîna Avaniyên Tebatî

Baran ALKAN

28 salî ye li Qersê hatiye dîne niha li wir dijî , mamostetî dike .

Erênî	Neyînî
Pencere hate çêkirin	Mal nehatiye şuştin
Feraq hatin şuştin	Kilam nehatiye gotin
Mal hate temîz kirin	Mektup nehatiye nivîsandin
Kitaw hate xwendin	Agir nehatiye wemirandin
Ahmet hate kuştin	Ewa nehatiye birinê
Kitêw vebû	Nan hatiye çêkirinê
Erebe hate firotin	Zar nehatiye dîtinê
Ödev hate çêkirin	Sol nehatiye dizîn
Nan hatibû hazirkirin	Top nehatiye teqandin
Ewa hate birin	Ew naye birin

Ayşe ALKAN

15 salî ye , li Qersê hatiye dinê , niha dibistana amadehî dixwîne.

Erênî	Neyînî
Pencere temîr bû	Mal nehatiye şuştin
Feraq hat şuştin	Kilam nehatiye şuştin
Mal temîz bû	Mektub nehatiye nivîsandin
Kitew hate xwendin	Agir netemirandiye
Ehmet hat kuştin	Ew nebiriye
Derî vebû	Yemek nehatiye çêkirin
Erebe hat firotin	Gede nehatiye dîtin
Ödev çêbûn	Sola min nediziye
Nan hazîrbûn	Top neteqandiye
Ew hatin birin	Wi nebirin

3.11.7.Di Herema Rihayê de_Karanîna Avaniyên Tebatî

Hasret CAZ

28 Salî ye li Rihayê hatiye dinê , niha bi malbata xwe re li Bursayê dijî , li ser beşa dîrokê beşa bilind dike.

Erênî	Neyînî
Teqê çêkir	Mal nehatiye şuştin
Fera hatine şuştin	Klam nehatiye gotin
Mal hatiye damîştin	Mektup yazî nekiriye
Ehmed hatiye kuştin	Agir ne wemirendiye
Derî hatiye lexwestin	Waye ne birine
Arebe hatiye firotên	Şiv nehatiye çêkirin
Ders çêkiriye	Zare nediye
Şiv hatiye çêkirin	Sol nediziye
Kîtap xwendiyê	Top teqiyaye
Waya hatiye birin	Wi nebirin

Bahrî VAKAR

32 salî ye li navçenda Hîlvanê dijî, niha bi malbata xwe re dijî û mamostetî dike.

Erênî	Neyînî
Teka çêkirin	Mal neşuştine
Fera şuştin	Stran negotine
Mal paqij kirin	Mektup yazî nekirine
Kîtap xwendin	Agir nemrandine
Ehmet kuştin	Waya ne birine
Kapî vekirin	Şiv çênekirine
Erebe firotin	Zarok nedîne
Ders kirin	Solê min nedizîne
Şiv hazir kirin	Top neteqandine
Waye birin	Wî nebirin

3.11.8. Di Herema Dîlokê de Karanîna Avaniyên Tebatî

Selma KARACAN

28. salî ye . bi piçûkaniya xwe de li Dîlok ê dijî . niha li wir jî mamostetî dike.

Erênî	Neyînî
Pencere tamîr nebû	Xanî nehatî şûştinê
Fera nehatiye şûştin	Tirkî nehate gotinê
Xanî pajij nebû	Mektup nehatiye nivîsandinê
Kîtab nehatiye xwendin	Ar venemirî
Ahmet hatiye kuştin	Ew newirine
Derî vebû	Şiv çênebûye
Arebe hate fitortin	Zar nehatiyê dîtinê
Ödev hat çêkirin	Sol nehatiye dizînê
Şiv hazir bû	Top nehatiye teqandinê
Ew hate birin	Ew nebirin

3.11.9. Di Herema Muşê de Karanîna Avaniyên Tebatî

Cesur DİKİCİ

34 salî ye li navçenda Varto yê dijî , niha li Stenbolê karker e.

Erênî	Neyînî
Şibake çêkirin	Mal nehat şûştin
Firak şûştin	Klam nehatiye gotin
Mal paqijkirin	Peyam nehatiye nivîsandin
Pirtûk xwendin	Agir xewrane nekirine
Ahmet hatin kuştin	Nan çênekirine
Derî vebû	Lawik nehatiye ditîn
Wesaît firotin	Solê min nehate dizîn
Wazifağe kiriye	Top netaqiyaye
Xarin çêbûye	Ev nebirine
Wi birin	Wî nebirine

Bülent BİLGİN

25 salî ye , li Mûşê dijî niha li zaningehê xwendekar e .

Erênî	Neyînî
Pencere hat çêkirin	Mal nehatî şuştin
Firak hat şuştin	Klam nehatî gotin
Mal hat temîz kirin	Agir xewrane nekirine
Kitap hat xandin	Ew nebiriye
Ahmet hat kuştin	Nan çenekiriye
Derî vebû	Lawuk nehat dîtin
Erebe hat firotin	Eyekkabamin nehat dizîne
Vazîfe anî cih.	Klam negotiye
Nan hat çêkirin	Top netaqiyaye
Hat birin	Wî nebirin

3.11.10. Di Herema Sêrtê de Karanîna Avaniyên Tebatî

Zeynep KAYA

58 salî ye , li navenda Sêrtê dijî , û karê bermalî yê dike.

Erênî	Neyînî
Kulekê reqifandin	Malê neşuştinê
Firaqa şuştin	Helbesta negotine
Malê paqij kir	Mektup nenivîsandine
Xwendina xwe kirine	Agir netefandine
Ahmet kuştin	Wî nebirine
Derî vebû	Xwarin çenekirine
Erebê firotin	Zarok nedîtine
Dersê xwe çêkirin	Şekal nedizîne
Xwarin hazir e	Topê neteqandinê
Wî birin	Ewa nebirine

Haşim CENGİZ

18 salî ye , di navçenda Kurtalanê dijî û xwendekar e .

Erênî	Neyînî
Pace tamîr çêbî	Mal neşûşt
Firax hat şûştin	Şarkî negotin
Mal paqij bû	Mektup yaznekirin
Xwendina xwe kirine	Agir netefandine
Ahmet kuştin	Wî nebirine
Ders çêkirin	Şîv çenekirine
Şîv çêkirin	Zarok nedîtîne
Erebe firotin	Şikal nedîzîn
Xwarin çêbû	Topê neteqandinê
Wî birin	Ewa nebirine

3.11.11. Di Herema Şirnaxê de Karanîna Avaniyên Tebatî

Galip KENDAL

27 salî ye ,li navçenda Cizîrê hatiye dinê. niha bi hevîna xwe re navçenda Farqînê dijîn karker e .

Erênî	Neyînî
Camekan hat çêkirin	Mol nehatiye şîştin
Firağ hat şîştin	Sitrane nehatiye gotin
Mol hat pokijkirin	Mektup nehatiye yazkiran
Kitap hat xwendin	Agir nehatiye tapisandin
Ehmet hat kuştin	Ev nehat birin
Derî hat vekirin	Xorin nehatiye çêkirin
Erebe hat firotin	Zarok nehatiye dîtin
Ev ders hat çêkirin	Pêlavamin nehatiye dizîn
Ev xorin hat çêkirin	Ev top nehatiye tekandin
Ev hat birin	Ev nehat birin

Firdevs NAS

27, salî ye, eslê xwe Şirnaxî'ne , niha li Êlihê Mamostetî dike.

Erênî	Neyînî
Şivak tamîr kirin	Xanî neşûştina
Firağ şûştin	Dilok nehatiye gotin
Xanî paqijkirin	Agir nehatiye temirandin
Ahmed kuştin	Ev nebirina
Deri vebû	Xarin çenekirina
Erebe firot	Zarok neditina
Derseğa çêkir	Şekal dizina
Xwarin hazirbû	Top nepakiyaya
Kitap xwendin	Mektup nehatiye yazkirin
Ve birin	Ev nehat birin

3.11.12. Di Herema Semsûrê de Karanîna Avaniyên Tebatî

Semra ÖZÇELİK

32 salî ye , li navçenda Kahta yê hatiye dinê û demek dirêj li wir dijiya ye , niha li Farqînê mamostetî dike.

Erênî	Neyînî
Pencere hat çêkirin	Xanî nehatiye şûştin
Fere hatin şûştin	Kilam nehatiye gotin
Xanî hat temîz kirin	Mektup nehatiye nivîsandin
Kitab hatiye xwendin	Agir nehatiye temirandin
Ahmet hat kuştin	Şiv nehatiye çêkirin
Derî vebû	Kurik nehatiye dîtinê
Erebe hat firotin	Êmenî nehatiye dizînê
Ödev hatin çêkirin	Ew were jê kirin
Şiv hazir bû	Top nehatiye teqandinê
Ev birin	Ewa nebirine

3.11.13. Di Herema Wanê de Karanîna Avaniyên Tebatî

Teliha KARAHAN

42 salî ye , li navçenda Gevaşê hatiye dinê , niha bermaliyê û xwendin û nivîsandina wê jî heye.

Erênî	Neyînî
Pencere çêkirine	Xwarin neçêkiriye
Fere şuştin	Zarok peyda nebû
Mal gezikirine	Sola min nehatiye dizîn
Kitap hatiye xwendin	Top netekandiye
Derî vekir	Agir netimiriye
Erebe hatiye firotan	Mektup nenivîsiye
Ödevê xwe çêkirin	Stran negotiye
Xwarin hazir e	Xanî ne şuştiye
Ahmet hat kuştin	Ev bi birine
Ewa birin	Ewa nebirine

Mesut ÜRGÜN

28 salî ye , li navçenda Başkalê hatiye dinê, niha li bajarê Dîlokê mamostetî dike.

Erênî	Neyînî
Penceye hatiye çêkirin	Mal nehatiye şuştin
Aman hatiye şuştin	Stran nehatiye gotin
Male hatiye paqijkirin	Mektup nehatiye nivisandin
Kitap hatiye xandin	Agir nehatiye temandin
Ehmed hatiye quştin	Ev nehatiye biyin
De hatiye veqiyîn	Risq nehatiye çeqiyin
Vesayet hatiye fiyotin	Piçûk nehatiye dîtin
Ödev hatiye qiyin	ew te bete birin
Risq hatiye çiqiyin	Top mehatiye peqandin
Ev biyin	Ew nebiyin

3.11.14. Di Herema Êlihê de Karanîna Avaniyên Tebatî

Abdullah CENGİZ

40 salî ye li navçenda Gercosê hatiye dinê , niha li Amedê karmend e .

Erênî	Neyînî
Pacê çêkirin	Mal nehatiye şûştin
Firaq hat şûştin	Klam nehatiye gotin
Mal paqij bû	Mektup yaznekirine
Kitap hat xwendin	Agir netefandin
Ahmet hat kuştin	Wî nebirin
Derî vebû	Xwarin çênekirin
Arabe hat firotin	Zarok nedîtin
Ödev hat çêkirin	Ayakkabi nedizîne
Xwarin çêkirin	Top neteqandin
Wî birin	Ew nebirin

Hamza MENEKŞE

30 salî ye , li Êlihê dijî niha firoşgehî dike .

Erênî	Neyînî
Cam tamîrkirin	Hundir nehatiye şûştin
Firaq hat şûştin	Zarok nehatiye dîtin
Hundir pakijkirin	Stran nehatiye gotin
Defter hat xwendin	Mektup yaznekirin
Ahmet kuştin	Agir nehatiye temirandin
Derî vekirin	Wî nebirine
Erebe hat firotin	Xwarin nehatiye çêkirin
Ders hat yazkirin	Şikal nedizîne
Xwarin hate çêkirin	Top nehatiye teqandin
Wî birin	Wî nebirin

ENCAM

Ziman jibona mirovan pêdiviyek mezin e û taybetmendiyek mirovan ya grîng e. Ragihandina herî mezin bi saya ziman û axaftinê pêktê. Zimanên ku mirov li rûyê erdê bikartînin cûr bi cûr in. Ev cûdahî gelemperî li gor netewe û erdnîgariyê diguhere. Ziman çiqas amûrekê ragihandinê be jî , carînan di mijara ragihandinê de tiştê ku bixwaze vebêje û parve bike , aşkere nake û awayikê nerasterî dide ziman û nîşan dide.

Di her ziman de bingeha herî girîng lêkerên, bi alikariya lêkeran kar ,rewş , û tevger whd. çiqas em parve bikin jî , ji aliyê din de jî devoka heremê jî dide berçav. Zimannasan çiqas bibêjîn pergala avahiya avaniya lêkerên tebatî bi sistemekî çêdibin carîna li gor rewş , bûyer an jî derûnnasî de ev pergala avahî tê paşçav kirin û tiştên ku me jor de jî diyarkiribû li gorî sedema wan carîna avahiya avaniya tebatî nayê karanîn lê wateya tebatî dide me.

Avaniya Tebatî , di serdema Klasîk'te derbasbûna serdema Nujen de, bikaranîna avaniya tebatî di kîjan beşan de û li gor guherandina mercên gerdûnî de di kîjan mijara de hewcê karanîna avaniya tebatî dimînin me nîşan da û jibilî wê avahiya tebatî li gor devoka hereman çawa tê guhertin û bandora rewşên wê heremê li ser karanîna avaniya tebatî heye me nîşan da.

Em dikarin encama teza xwe bi vî awayî şîrove bikin:

Her çiqas rêzika avaniya tebatî di aliyê sistematîkte çiqas di pirtûkên rêzimanî de tê diyarkirin be jî di zimanê axaftinê de ev pergale paşçav dikin û piranî di zimanê nivîsêde serî lê dixin û karanîna avaniya tebatî di zimanê nivîsêde zêde tê karanîn.

Di zimanê Kurdî de avahiya lêkerên avaniya tebatî çiqas di lêkerên gerguhêz de tê çêkirin we jî di zimanê devokî de carîna lêkerên gerguhêz tê paşçav kirin û avaniya tebatî di lêkerên negerguhêz de jî tê karanîn.

Di serdema wejeya klasîk'te di behremên nivîskî de bi taybetî behremên manzum de jiber ku bi formekî manzum hatiye nivîsandin , nêzikhatiya avahiya têşeyî hatiye paşçav kirin û jiber vê sedemê em bêgav mane ku nêzikhatiya avahiya semantîk karbînin û di serdema klasîk'te di cûreyên mensûrde taybetî di çanda dengbêjiya de ev bûyerên ku di li ser wa wareyande hatiye çêbûn vebêjerî neçar hiştiye ku di wan bûyerade xwe razber kiriye.

Di serdema nûjen de jiber ku berhemên nivîskî zêde bûye û mijarên zanistî pêşkêtiye karanîna avaniyên tebatî di vê serdemê de zêde bûye hetta em dikarin wisa bibêjin jî nêzikhatiya teşeyî di vê serdema nûjen de di berhemên nivîskîde cara yekem destpêkiriye.

Di serdemên cuda de karanîna avahiyê avaniya tebatî li gor mercên vê serdema bi nêzikhatiya semantîk û teşeyî ve hatiye berçav û bi saya wa cûreyan em nirxandin bikin.

Gava ku me xebatên holê kir, bi saya hinek mînakên vê avaniya tebatî me dît ku i gor devokên herême , cuda tê karanîn û bi hêla nûçe , stran , rojname whd. me dît ku karanîna wê diguhere û me dît ku temenê mirov an jî rewşa civakî li ser avaniya tebatî bandorek dike û avaniyê bi mijarên cuda we pêş dixwe an jî paş dixwe.

ÇAVKANÎ

- Badıllı, Kemal: *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramerî (Kürmançça Lehçesi)*, Ankara Basımevî ve Ciltevi, Ankara, 1965.
- Baran, Bahoz: *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Belkî, Stenbol, 2012.
- Bedirxan, Celadet û Lesgot, Roger: *Kürtçe Dilbigisi*, Weşanên Doz, Stenbol, 1991.
- Bedirxan, Celadet; Lesgot, Roger: *Kürtçe Gramer*, Weşanên Avesta , Stenbol, 2004
- Bedirxan, Kamuran Ali: *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer* , Deng Yayınları, 1986
- Bedirxan, Kamuran Ali: *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer* , Özgürlük Yolu Yayınları, 1977
- Bedirxan, Kamuran Ali: *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer*, Özgürlükyolu Yayınları, 1977.
- Bedirxan, Kamuran Ali: *Xwendina Kurdî*, Çapxana Tereqî , Şam, 1938.
- Bedirxan, Kamuran Ali: *Zmanê Mader*, Parîs , 1964.
- Burkay, Kemal: *Dersên Zmanê Kurdî* , Weşanên Roja nû , 2008.
- Ciwan, Mûrad: *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbigisi (Kurmanc Lehçesi)*, Wêşanên Jiyana Nû, Stockholm,1992.
- Çapar, İbrahim: *Berawirdkirina Lêkeran Biwejî û Bi Daçek di Kurdî û İngilîzî de* (yüksek lisans tezi, basılmamış) Dicle Üniversitesi, Yaşayan Diller Enst. Amed, 2017.
- Çem, Munzur: *Türkçe Açıklamalı Kurmanca (Zazaca)*, Weşanxaneyê Deng, Stenbol, 2013.
- Demir, Emine ve Yılmaz, Nurettin : *Türk Dili El Kitabı*, Grafiker yayınları , Ankara 2012.
- Durre, Abdurahman: *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jiyana Wî* , Keskesor Yayınları, Stenbol , 2002.
- Duru ,Mehmet Özgür: *Türk Dilinde Edilgen Çatı*, (Ondukuz Mayıs Üniv. Sosyal Bilimler Üniversitesi ,yayınlanmamış yüksek lisans tezi), Samsun, 2009.
- Ereb, Şemo: *Şivanê Kurmanca*, Weşanxaneya Lîs, Diyarbekir, 2015.
- Eker, Süer: *Çağdaş Türk Dili*, Grafiker Yayınları, 9. baskı, Ankara , 2005.
- Emir Djeladet Bedirkhan, Et Roger Lescot: (*Grammaire Kurde*), Institut Kurde de Paris Dépôt Légal, Avril 2001.
- Jiyan, Rênas: *Feqiyê Teyran, Hemû Berhemên Wî* , Weşanxaneya Belkî , Stenbol, 2008.
- Karahan, Leyla: *Türkçe de Söz Dizimi* , 23.baskı ,Ankara 2016.

- Kerimoğlu, Caner: *Genel Dilbilimine Giriş*, Pegem Yayınları, Ankara, 2016.
- Korkmaz, Zeynep: *Türkiye Türkçesi Gramerî*, Şekil Bilgisi, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 2007.
- Kurdo, Qanat: *Gramera Zimanê Kurdî*, Weşanên Roja Nû, Stocholm, 1990.
- Kovara Hawara Kurdî, Çapxana Tereqî, Hejmar 1, Şam, 1932.
- Kovara Hawara Kurdî, Çapxana Tereqî, Hejmar 2, Şam, 1932.
- Kovara Hawara Kurdî, Çapxana Tereqî, Hejmar 3, Şam, 1932.
- Kovara Hawara Kurdî, Çapxana Tereqî, Hejmar 4, Şam, 1932.
- Kovara Hawara Kurdî, Çapxana Tereqî, Hejmar 5, Şam, 1932.
- M.Malmîsanîj: *Kurmanca ile Karşılaştırılmalı Kırmanca (Zazaca) Dilbigisi*, Weşanxaneyê Vateyî, Stenbol, 2015.
- Öndeş, Nesibe Sevgi: *ELS-English Language Studies English Grammar Inside Out - (The Part of The Passive)*, İstanbul, 2016.
- Sagnıç, Hüseyin: *Hêmanê Rêzimanê Kurdî*, Melsa Yayınları, Stenbol, 1991
- Sebzecioğlu, Turgay: *Türkçede Edilgenlik*, (doktora tezi, basılmamış). Dokuz Eylül Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, İzmir, 2008.
- Tan, Sami: *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê,(Çapa Berfirehkirî) Stenbol, 2011.
- Taş , Çetin: *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, Diwan Yayınları, Stenbol, 2014.
- Yıldırım, Kadri: *Ehmedê Xanî Külliyyatı 4. Dîwan*, Weşanxaneyê Avesta, Stenbol, 2014,
- Yıldırım, Kadri: *Espîsadebazê Hemedanî: Baba Tahîrê Uryan* , Weşanxaneyê Avesta , Stenbol, 2013.
- Yıldırım, Kadri: *Temel Alıştırma Ve Metinlerle Kürtçe Dilbigisi, (Kurmancî – Lehçesi)* Mardin Artuklu Üniversitesi, Mardin, 2012.
- Zivingî, Mela Ehmed: *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizirî*, Weşanxaneyê Avesta Çapa Yekem, Stenbol, 2013.
- <http://www.ekremuzbay.com/gramer/passive-voice.html>, (Erişim: 15.11.2018).